



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ

Kovara Dumehane
Sal: 6 Hejmar - 32
Gulan - Pûşper 2010

Xwedî û Berpirsiyariya Nivîsaran
Mehmet Aydın ALÖKMEN

Edîtoriya û Redaksiyon
Serwet DENİZ - Elîxan LORAN

Mîzanpaj û Berg:
Enstîtuya Kurdî ya Amedê

Wêneyê Berga Pêşîn
Ji Arşîva Arjen Arî

Şewirmendê Hîqûqê
M. Nuri DENİZ

Çapxane: Berdan Matbaası
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi
C Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 (212) 613 12 11

Navnîşan
Kalem Sk. No: 32 / 4 Huzurevleri
Kayapınar/DIYARBAKIR
Tel & Faks: 0 (412) 237 43 16

E-Mail
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB: www.kovaraw.com

ISSN: 1309-1476

Şertên Abonetiyê
Nava Welat, salek: 30 TL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Banqe & Nimroya Hesabê IBANê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakır

TL: TR190006400000183002114889

EURO: TR420006400000283000737070

USD: TR520006400000283000737084

Nimroya Hesabê PTT'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
590 24 36

- Ji edîtor / 2
- Hevpeyvîn bi Hêmin re - **Mehmed UZUN, Mehmûd Baksî** / 3
- Nîfşê bêji -II- - **Helîm YÛSIV** / 9
- Xêz - **Ahmet BÎLGE** / 16
- Stok - **Îsmail HACANÎ** / 17
- Jana kedî û helbesta kuştî - **Hecî NEHSAN** / 18
- Di helbestê de hestên azadiyê - **Kamran Simo HEDILÎ** / 19
- Sê helbest - **Guillaume APOLLÎNAÎRE** / 24
- Kakil - **Dilşêr BÊWAR** / 26
- Şîn - **Janbijan AR** / 26
- Bavê min tiştê nekiriye - **Kawa ŞÊXÊ** / 27
- Çîroka kurdî û çîroknûsekî kurd - **Îsmail DÎNDAR** / 31
- Dilopek jiyan - **Welat DILKEN** / 33
- Rewşa kirmanckîya ewroyêne - **Mehmud NÊŞITE** / 34
- Nîno vatişî - **Nesrîn NAVDAR** / 37
- Roje - **Daîmî BÎNGOL** / 37
- Kenê miriyan - **Qado ŞÊRÎN** / 38
- Xewna xwedawendî - **Evdê Koçer CANO** / 39
- Sema - **Şivan AR** / 40
- Tu ji bo çi nakelîmî - **Robîn ŞERNA** / 41
- Xewnerojkek - **Şengul OGUR** / 42
- Kêferata helbestdanê - **Hekîm EHMED** / 42
- Civak, kultur, biwêj û nivîskar - **Medenî FERHO** / 43
- Şahid kî ye? - **Bextiyar ELÎ** / 47
- Dosye - **Arjen ARÎ** / 55
- Ji devê Arjen Arî jînenîgariya wî / 57
- Hevpeyvîn bi Arjen Arî re - **Elîxan LORAN** / 59
- Derwêşê tekiyeya helbestê Arjen Arî - **Berken BEREH** / 67
- Wan rojan, risteyên me - **Kawa NEMIR** / 73
- Ji bo poetîkaya Arjen Arî çil deqdeqûsk - **Lal LALEŞ** / 74
- Di 'arî'ya peyvê de 'arjen'eke h-ar - **Omer DILSOZ** / 75
- Di helbestê de simbêlên Arjen - **Ferzan ŞÊR** / 76
- Arjenîka - **Mihemed RONAHÎ** / 78

*Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tên şandin, li xwediyên wan nayên vegerandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji edîtor

Kovarên wêjeyî yên zimanekî, tê heye ku peyveke giran e jî, *namûsa* wê wêjeyê ne. Ji ber ku kovar li ser tiştên di tûr de ne kaban diavêje û wêje jî hewl dide ku hûrê xwe yê filitî bêtir bifilitîne, bifelişîne û bi hûrê xwe yê ku dixwaze bi gorî dilê xwe dagire re kaban diavêje. Çawa ku xwendevan xwe li agirê kovaran digirin, kovar jî xwe li agirê wêjeyê digirin. Agirê ku kovar pêşkêşî xwendevanan dike dibe ku ev qasî hindik be jî, ku jehr be jî xwendevan pê nemirin lê divê ev yek were bîra me ku kovar jî agiran ji wêjeyê didoşe.

Me di pêşgotina hejmara 25'emîn a Kovara Wyê de jî qala "*romana me ya ku bûye jînenî-garî, çîroka me ya ku bûye bîranîn û helbesta me ya ku bûye helbeşq*" kiribûn. Îcar saet 12'ê şevê ye û em ji hev re rast bibêjin, ji bo ku di romanên me de serleheng axkolog –*arkeolog!*– be –*jînenîgarî û jiyangeriya niha!*– ma divê em li hêviya Godot bimînin? Ji bo ku em çîroka xwe bi devê pisîkekê bibêjin ma divê em li albûmên jiyana xwe ya bihurî –*bîranîn!*– binihêrin û li wêneyê pisîkiyê binihêrin? Ji bo ku em helbestan binivîsin divê eşqeke ciwaniyê –*helbeşq!*– hebe? Heke mebesta me ji helbestê tenê eşqa jin û mêran a takekesî be, nexwe ya me ne helbest e, hebe hebe mewlûda wî kesî yan jî wê kesê ye!

Ji ber vê yekê jî hejmara rûpelên kovaran, hejmara belavbûn û kirîna kovaran, hejmara muptelayên kovaran, hejmara aboneyên kovaran û hejmara kesên ku kovaran bi tişteki nahesibînin, ev hemû *grafîkên testa eforê* ya wê wêjeyê ne.

Û li ser rewşa polîtîk em dikarin vê bibêjin; Kurd û serdest di vê hevokê de yek in, hûn me bigirin jî em bi gir in!

Hûn me bigirin jî lê em xwe ji azadiyê venagirin!

Hûn me bixwin jî lê em ji ber we danaxwin!

Wekî her hejmar me xwest em di vê hejmarê de jî dosyeyekê pêşkêşî we xwendevanan bikin. Mijara vê dosyeya me **Arjen Arî** bû. Berken Bereh, Kawa Nemir, Lal Laleş, Omer Dilsoz, Ferzan Şêr û Mihemed Ronahî bi nivîsên xwe beşdarî dosyeyê bûn. Dîsa di dosyeyê de hevpeyvîneke bi Arjen Arî û ji devê wî jînenîgariya wî heye. Em dîsa dibêjin ku, dosye nikarin hemû aliyan vebêjin lê dikarin mijara/kesa/kesê qesta wê/wî hatiye kirin, binimîne.

Him ji bo balkişandinê, him ji bo handanê û him jî ji bo platformeke derbirandinê di hejmara bê de em ê lingên girtiyên azadiyê di ser yên li derve ne bigirin. Ango hejmara bê –Hejmara Tîrmeh û Gelawêja 2010'an– bi tevahî dê ji nivîs û karîkaturên ji girtûgehan, nivîsên li ser pirtûkên girtiyan, rewşa nivîsandinê li girtûgehan pêk be. Kesên li girtûgehan û kesên ku dixwazin li ser berhemên ku li girtûgehan tên nivîsandin binivîsin divê heta 15.06.2010'an (Pûşper) nivîsên xwe bişînin.

Ji ber ku dê hejmara **tîrmeh û gelawêjê** ya kovarê berhemên ji girtûgehan be, nivîsên ji derveyî vê mijarê dê bimînin ji hejmara **rezber û kewçêrê** re.

Mizgîniyeke me jî li we dê li Amedê cara pêşin fûara pirtûkan a TUYAP'ê were li-darxistin. Kovara W jî dê li jêr banê Enstîtuya Kurdî ya Amedê li TUYAP'ê be, em ê li standa xwe li benda we bin!

15'ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî ji niha ve li we pîroz be. Em ji niha ve vêya dikarin bibêjin ku bi pêşengiya T'ZPKurdî dê Cejna Zimanê Kurdî mora xwe li meha Gulanê bixe.

Em û gul bi hev re bişkivîn û em û gul va ye li we qesidîn.

Heta kelekela tîrmehê bimînin di xweşiyê de

Hevpeyvîn bi Hêmin re

“Ez ji wê natirsim ku rojekê partiya min bibêje nebe şair, bibe pêşmerge, dibime pêşmerge. Ji bo min ne girîng e, ez di wê baweriyê de me ku wezîfeya her însanê kurd e ku xwe ji wê zilm û zordariya li ser milletê xwe rizgar bike.”

Mehmed UZUN, Mehmûd BAKSÎ

“Ev gotûbêj ji aliyê her du nivîskarên nemir ên bakurê Kurdistanê, Mehmed Uzun (1953-2007), û Mehmûd Baksî (1944-2000) ku di havîna 1979’an de serdana bajarê Mehabadê kiribûn, bi mamoste Hêmin re bi awayê hevpeyvînê li ser kasêtê hatiye hazirkirin.

Hêjayî gotinê ye ku di dema xwe de kasêta orjîna wê gotûbêjê ji aliyê Mehmed Uzun ve pêşkêşî mamoste Hesen Qazî hatibû kirin. **Dêrsim Oremar** jî ji zaravayê soranî kiriye kurmancî.

✓ **Kîngê tu ji dayik bûyî?**
1920

✓ **1920, li ku?**
Li gundê Laçînê, nêzî bajarê Mehabadê.

✓ **Te du dîwan çap kirine?**
Belê, min du dîwan çap kirine.

✓ **Belê di wextê şah de çap kirine?**
Na, piştî şah, her du jî li derveyî welat çap bûne. Çi ji wan li Îranê çap nebûne, çapa duyem a wan li Îranê bûye.

✓ **Navê wan dîwanan çi ne?**
Tarîk û Ron, Naleya Cudayî.

✓ **Tarî û Ron, Naleya Cudayî.**
Ew şîir in ku di dema ez li derveyî welat bûm, min gotine.

✓ **Baş e, mamoste ew negirtibû, bandê baş negirtibû, ez dixwazim hinek pirsyaran dubare bipirsim.**
Fermo.

✓ **Bibore, te kîngê dest pê kiribû ku helbestan binivîsî?**

Min got, min di 15 saliya xwe de dest pê kir, lê baş nebû, nebaş bû. Piştî di 21 saliya min de şîirên min çap bûn, dema ku ez bûm endamê JK’ê, ji hejmarê duyem û pê de di kovara Niştîmanê de şîirên min belav bûn.

✓ **Navê kovarê çi bû?**
Niştîman, sal 1942.

✓ **Baş e mamoste te ji çi îlham girt ku tu şîiran binivîsî? Kîjan sebebên tu teşwîq kir ku tu şîiran binivîsî?**

Mezlûmiyet û hejariya milletê min. Min hîs kir ku milletê min, miletekî hejar e, zîmanê min zîmanekî dewlemend e û wezîfeya min e ku bi wî zîmanî şîiran bibêjim. Wê demê min farisî ji kurdî baştir dîzanibû, lê min qet şîirên bi zîmanê farisî negotîne. Çimkî şairên farisan bi xwe zor in, bila ew bi xwe şîirên xwe binivîsin. Di bîra min de ye carekê mirovekî ji çepgirên farisan jî min pirsî ku tu çima bi xwe şîirên bi zîmanê farisî nabêji? Min got: çima tu şîirên kurdî nabêji?! Tu ku mirovekî înternasyonalîst î, çima şîiran bi kurdî nabêji? Çimkî ez zîmanê xwe wek zîmanekî serbixwe dizanim, milletê xwe jî wek miletekî serbixwe dizanim, mafê min heye ku bi zîmanê xwe binivîsim, bi zîmanê xwe bipeyivim û li welatê xwe bi azadî bijîm û vî heqî weke heqekî meşrû û însaniya xwe dizanim.

✓ **Ji ber wê te dest pê kir helbestan bi kurdî binivîsî?**
Belê...

✓ **Mamoste dema ku te dest bi nivîsandina helbestan kir, wê gavê rewşa kultur û çanda kurdan çawa bû? Namilke, kovar û weşan û rojnameyên kurdî hebûn? Ku hebûn te çi dixwend?**

Min got, me di sala 1942'yan de li Mehabadê kovareke bi navê Niştiman belav dikir. Min jî wê demê weke lawekî di wê kovarê de dinivîsand, ji wê demê û pê de êdî ez şîiran belav dikim. Di serdema şah de nedibû ku şîrên min bi aşkerayî belav bibin, lê bi nihênî di nava xelkê de belav dibûn, heta sala 1947'an ku ji welat helatim û derketim çûm Başûrê Kurdistanê, heta îsal ku ez vegeriyam.

✓ **Îsal tu hatiye? Tu li Îraqê bûye?**

Ez li Îraqê bûm û min sefera Lubnanê jî kiriye, her wiha min birayên kurd li Sûriyeyê û Tirkîyeyê jî ditine.

✓ **Te Cegerxwîn dîtîye?**

Min Cegerxwîn jî dîtîye, li Başûr min dîtîye, ne li Sûriyeyê.

✓ **Ferqa te digel Cegerxwîn?**

Ferqa ku di navbera min û Cegerxwîn de heye, ew şîrên bi şîar (*slogan*) dibêje yanî ji bo rojê şîiran dibêje. Lê ez şîiran dibêjim ku bo kurdan bîmîn, dibe evro tenegehên. Li gor min şîira Cegerxwîn şîar e, ji bo rojê dibêje weke ku rojnameyê binivîsî. Lê ez şîiran ji bo rojê nabêjim, dibêjim ku bîmîne, bo wê dibêjim ku weke diwana Mem û Zîn bîmîne û heta kurd hene kevn nebe. Ji ber wê ez şîiran tenê ji bo kurd, bo zehmetkêşên kurd dibêjim. Bi gotina bazarê şîiran nabêjim, bi gotina şairane şîiran dibêjim. Bila zehmetkêş zehmetê bikişîne û ji şîira şairane têbigihêje. Yanî zimanê kurdî nayînî xwarê.

✓ **Baş e mamoste, te xebata xwe ya siyasî, kulturî, çandî tevî hev kiriye. Bo çi te tenê ji xwe re şîir nenivîsand, dest bi xebata siyasî jî kir? Û te xwest her du bi hev re biçin?**

Min wiha kiriye, min şîira xwe ji xe-

bata xwe ya siyasî cuda nekiriye.

✓ **Ji ber çi? Yanî armanca te çi bû?**

Bawer im ez beriya ku şairek bîm, însanekî kurd im û wezîfeya hemû însanên kurd e ku xwe ji dest wê zîlm û zordariyê rizgar bikin. Ez jî wê natirsim ku rojekê partiya min bibêje nebe şair, bibe pêşmerge, dibime pêşmerge. Ji bo min ne girîng e, ez di wê baweriyê de me ku wezîfeya her însanê kurd e ku xwe ji wê zîlm û zordariya li ser miletê xwe rizgar bike. Êca wezîfe û erka min şîir gotin e û wezîfeya hevalekî din tiştekî din e.

✓ **Te gotibû ku îro “Hêmin” heye, ew girêdayî Qazî Mihemed û Hizba Demokrata. Qesta te ji wê çi bû, tu dixwazî çi bibêjî?**

Bawer im ger min xebata siyasî nekiribûya, nedibûm mirovekî ku niha tu bêtî û digel min biavî. Dibû ez jî gundiyeke bûma weke hemû gundiyan, xebata siyasî ez kirime...

✓ **Baş e mamoste ew zehmetiya ku me behs kiribû, me gotibû ku kurdên Bakur bi tîpên latînî dinivîsin û yên din bi erebî û farisî û kurdên Ermenistanê jî bi tîpên kirilî dinivîsin, ew zehmetî heye... Ji bo wê zehmetiyê lazîm e mirov çi bike? Gelê kurd çi bike? Xwendevan û ronakbîrên kurdan çi bikin?**

Ew jî bo min jî pirsgrêkeke gelekî mezin e, fikreke ji mîj ve ye... Ez çawa dikarim şîira xwe bi kurdên Bakur rabi-gihînim, gotina xwe bigihînim kurdên Bakur. Ez ku di çarçoveya Îranê de otomîyê dixwazim, mecbûr im bi xetên îranî binivîsim. Tu jî ger dixwazî di çarçoveya Tirkîyeyê de otomî bî, mecbûr î bi xetê latînî binivîsî, kurdên Başûr jî her wiha, çi bikin? Ji bo wê ez nikarim... Ew erka kesên siyasî ye, lazîm e ew wê girîftê çareser bikin. Lê ez dixwazim kurd bi xwe xwedî xet û zimanekî bin, ziman û xeteke hevgirtî, him bo Bakur, him bo Başûr û him bo Rojhilat û bi yek

zimanî binivîsin. Ji ber ku niha di navbera zaravayê min û te de ferq heye, zaravayê hemû şarên Îranê jî ji hev cuda ne, zaravayên hemû bajarên ereban jî ji hev cuda ne, lê wan zimanekî hev girti heye ku pê dinivîsin. Lazim e em jî zimanekî ava bikin ku bikaribin pê binivîsin. Li bajarê xwe, li welatê xwe bi zimanê xwe bipeyivin, niha ew pirsgrêk ji bo kurdên Tirkîyeyê, kurdên Îran û Îraqê zor e, lehçeya min digel ya xelkê bajarê Sineyê ji hev cuda ye, ji ber wê jî hûn dibînin ku min di pirtûkên xwe de ji bo kelîmeyan ferheng daniye da ku kurdên din jî jê fêm bikin.

✓ **Baş e min ê ew bipirsiya, tu dema helbestan dinivîsî, bo zimanekî yekgirtî xebata te çêdibe?**

Min ku dest bi xebatê kiriye, zêdetirî 15 salan e, ji bo çêkirina zimanekî yekgirtî hewl didim, ger bizanibim kelîmeyeke kurmanciya jorîn ji ya jêrîn baştir e wê dinivîsim û ew kesê ku şîrên min bixwîne, mecbûr e hînî wê kelîmeya kurmanciya jorîn jî bibe. Bizanibe di zimanê wî/ê de heye, ez ji we hêvî dikim di rojnameya xwe de vê yekê bikin. Ger kelîmeyeke zaravayê me ji ya we baştir be, wê binivîsin, bi kar bînin, ew yek baştir zimanê me nêzî hev dike.

Em miletek in, rast e, ne tenê
du zarava belkî bi dehan
zaravayên zimanê me hene,
lê dikarin ji wan hemû
zaravayan zimanekî
yekgirtî ava bikin

✓ **Mamoste ger hûn xudmuxtariyetê bistînin, yanî otonomî, bixwazin ku ji her çar parçeyên Kurdistanê nivîskar û şairên kurdan ji wê derê top bikin yanî kom bikin û fealiyeteke wisa ferhengî bibe, kulturî bibe, yanî hûn dixwazin fealiyeteke wisa li Mehabadê çêbikin?**

Em wisa dikin, ger bikaribin xudmuxtariyetê bistînin armanca me ew e ku zimanekî çêbikin ku hemû zaravayên Rojhilatê de hebin. Ez bi xwe wek kur-

dekî ku pir geriyame, tecrubeyeke tal ji Başûr heye. Kesên ku bi kurmanciya jorîn dipeyivin nikarin bi soranî bixwînin, ewe bûye duzimanî...

✓ **Badînî û soranî?**

Û hêviya dijmin ew e ku em bibin du millet. Em miletek in, rast e, ne tenê du zarava belkî bi dehan zaravayên zimanê me hene, lê dikarin ji wan hemû zaravayan zimanekî yekgirtî ava bikin. Ev xwezîya min e û heta bimînim jî ji bo vê yekê ez ê hewl bidim.

✓ **Baş e mamoste, tu bi tevahî li ser kultur, helbest, roman, çîrok û kultura kurdan dikarî çi bibêjî? Yanî çawa ye bi dîtina te? Ji Ehmedê Xanî, ji Feqiyê Teyran?**

Min hemû xwendine û li ser hemûyan kar dikim. Ez bixwe bi rastî ji fikra sofîyane ya Ehmedê Xanî fêm nakim, lê baş ji Mem û Zînê têdighijim, kitêbeke pir mezin e di zimanê kurdî de û Ehmedê Xanî li gori min şairekî mezin ê kurdan e. Ehmedê Xanî jî bo min Bote, lê dikarim wê botê bişikînim çimkî xizmeta zimanê kurdî nekirîye, tenê xizmeta zaravayekî zimanê kurdî kiriye, di wir de rexneya min li ser heye, tenê di wir de, karê min bi fikra wê serdemê nîn e. Heta ez ecêbgirtî

mame ku wî mirovî beriya şoreşa Fransayê fikra nasyonalîzmê hebûye. Lê lazim e zêdetir lêkolîn li ser Ehmedê Xanî bê kirin û bê zanîn ku ew fikir li ku di mejiyê wî mirovî de çêbûye.

✓ **Yanî tu dibêjî fikra Ehmedê Xanî beriya şoreşa Fransayê bû?**

Belê belê...Beriya şoreşa Fransayê bû.

✓ **Gerek em bizanin ew ji ku tê?**

Ez bixwe ecêbgirtî mame û nikarim bi

xwe bidim selimandin ku ew fikir çawa çûye nav mejiyê wî. Min di nivîsa xwe de nivîsiye, tevî ku wê serdemê şer li ser olê bûye, yanî di navbera tirk û farisan de û li ser ola şîî û sunî bûye. Lê Ehmedê Xanî di wê serdemê de hizra millet û qewmîyeta xwe hebûye, ne fikra şîî û sunîbûnê. Ev yek ji bo min pir ecêb e! Ji ber wê jî di wê der barê de ez Ehmedê Xanî weke mezintirin şairê kurd dizanim. Lê ji ber fikra ku xizmeta zimanê kurdî nekiriye mafê min heye rexneyên min li ser hebin, lê ez ne mirovê ku dem û cih ji bîra xwe bibim. Tê bîra min serdemekê li gor min axatî û kirmancîti şîstekî ne xirab bû, di wê baweriyê de nebûm. Fikra min negihabû wê astê ku ger mirov bi destê mirovên din bên çewisandin karekî xirab e. Ehmedê Xanî di çi zamanî de bû? 300 sal beriya niha ew fikra wî bû, ew dahênaye, yanî henek niye.

✓ **Dûre, mamoste em ê vê biqedînin, em bikişînin, min dixwest li ser dewlemendiya kultura kurdî tiştan bibêjî, li ser dewlemendiya wê?**

Pir dewlemend e bi herd u zaravayan, min di nivîsên xwe de nivîsiye. Ji du zaravayên kurdî folkolora kurdî, di Rojhilata Navîn de ji hemûyan dewlemendtir e, yek di zaravayê badînî de, yanî kurmanciya jorîn, yek jî di zaravayê mukriyanî de...

✓ **Sorani?**

Mukriyanî, ew herêm e.

✓ **Yanî soranî...**(wiha xuya dike ku yek jî gotûbêjkeran, (yanî Mehmed Uzun) jî

mebesta Hêmin fêr nake û ji zarê Mukriyanî bi soranî fêr dike, ji ber wê jî her dubare dike/ dabezênerê kasetê, Hesên Qazî)

Zor dewlemend e, folklorê kurdî pir pir dewlemendtir e ji nivîsarên me, ku me bi kêmanî li ser wan kar kiriye. Diyar e lazim e folklorê hemû qewmekî bê bijarekirin, yanî tiştên xirab jê bîn avêtin û tenê tiştên baş bimînin. Mesela min bi xwe babetek li ser wê mijarê nivîsî ku kurd kîngê lazim e bibêjin: Şêr ji hêlînê derbikeve çi nêr be çi jî mê.


Diyar e ferqa jin û mêr tune ye, dema

şêr nêr be yan mê, dikare kar bike, ew gotina pêşyan e, kîngê hatiye gotin? Kê gotiye nizamim. Em rewşenbîrên kurd niha hatine ser wê fikrê (Hêmin di-kene)! Folklorê me pir dewlemend e, diyar e bê sedem niye, em miletekî koçer in, pêwîstiya me her tim bi jinê hebûye, dema ez diçim pez biçêrînim diyar e pêwîstiya min bi jinê heye ku hevkarîya min bike. Ekonomî bûye sedem ku jin ji aliyê kurdan ve bi îhtiram be. Di tevahiya dîrokê de jin ji aliyê kurdan ve bi îhti-

ram bûye, ji ber wê jî di folklo-

lorê me de gelek pesindayîna jinê heye, heta me edebiyata jinê jî heye ku ewropî niha ketine wê fikrê, beyta Xec û Siyabend bixwînin, hemen te guhdarî kiriye, edebiyateke temam jinane ye, mêrane nîn e.

✓ **Baş e mamoste wezîfeyên gelê kurd,**



wezîfeyên rewşenbîrên kurd çi ne ku em bikaribin folklora xwe, çanda xwe pêş ve bixin, gerek em çi bikin?

Li gor min lazim e em li gundan bigerin, rewşenbîrên kurd li gundan bigerin, pîrejin û pîremêrên kurdan peyda bikin û ji wan hîn bibin. Wan tomar bikin, wê demê dikarin wan bînin der û him zimanê xwe dewlemend bikin, him folklora xwe dewlemend bikin. Û ew yek wezîfeya we gencan e. Em pîr bûn, taqeta me nemaye, lê hûn pêwîst e bikin, ew wezîfeya me hemûyan e, lazim e bikin. Lazim e em bi zimanê xwe folklora xwe dewlemend bikin û nêzî hev bikin. Min di kitêba xwe de nivîsiye, bo min gelek seyr e ku beyta Xec û Siyamend, Ferx û Estî, beyta Mem û Zîn, di zaravayê soranî de ji heye, di kurmanciya jorîn da ji heye, ji ber çi? Ku wiha ye kê wergerandiye? Kesî wernegerandiye. Xelkê bi xwe ew beyt pê xweş bûne û guhertine û îrane ser wî zaravayî. Min ew yek nivîsandiye, êdî dijmin ji nikare

wan bifewtîne (pêkenîna Hêmin). Bi hezaran berhemên folklorê yên wiha di her du zaravayan de hene û ez di wê baweriyê de me ku ew yek gelek beriya hatina îslamê û zalbûna tirk û faris û ereban li ser me ew folklora hebûye û her dibe jî, ger hebe jî lazim e bîn jiyandin.

✓ **Zehmetiyeke me jî ew e ku mesela rewşenbîr, ronakbîr, hozanên Başûr, ên Rojava yan jî Bakur nas nakin, ên Bakur jî yên Rojhilat nas nakin.**

Belê wiha ye.

✓ **Gelek şit hatine nivîsandin, mesela bêjin şîira te, li Bakur pê nizanin, gelek kêr dizanin. Şairên Bakur an Rojava kêr dizanin. Gerek em çi bikin da ku em wiya bişkênin?**

Em zor zû dikarin wê yekê bikin. Bigerin û ew şairên ku me niha hene, dixwazin zimanekî yekgirtî çêbikin. Şîira wan şairan bi her du rênivîsan (aramî û latînî) belav bikin, şîira Hejar - belkî di



Di heman seferê de Mehmûd Baksî, Mehmed Uzun û rojnamegera swêdî Elin Clason serdana Celal Telebanî kirin ku baregeha wan nêzî sinorê Rîjhîlat bû. Wêne ji aliyê Clasonê ve hatine kişandin. Ji rastê ber bi çepê ve: Mulazîm Omer, Mehmûd Baksî, Salar Ezîz û Mehmed Uzun.

warê siyasî de ez pê re nebim- lê zimanê Hejar li zaravayê kurmançiya jêrîn û jorîn nêzik e. Min gelek pê xweş bû ku li Başûr tenê şairekî soranî yê bi nav û bang bi navê Hêmin heye û xwendingeh û cihên din jî bi navê wî hatine kirin, çimkî kurdên kurmanç ji zimanê min fêhmî dikin, dizanin wê rênivîsê bixwînin. Ez hewl didim zimanê min nêzik be, kurdiyeke esil be, lê nêzî her du zaravayan be.

✓ **Pirsiyara dawîn e, mamoste tu ji bo xwendevanên rojnameya me çi dibêji? Çi pêşniyar dikî, divê xwendevanên me çi bikin?**

Hûn jî weke me hewl bidin şairên kurdên soran binasin, beytên kurdî bi latînî belav bikin.

Bikaribin nêzî hev bikin. Mesela mehabadî dikarin bêjin 'gewre' û 'mezin' ji 'mezin' û 'gewre' fêhmî dikin. Ger du caran binivîsin 'gewre' û 'mezin' ê di nav (...) bi cih bikin, xwendevan dizanin. Yan li cem me ger ji her gundiyeke mehabadî re bêji 'pez' çi ye? Dizane, bi xwe jê re dibêje 'mer', lê 'pez' jî dizane. Ger em bikarin wê yekê bikin zor nêzik dibin.

Rîqî pîroz

Demgirê emma le girtuxane rîq esturtirîm

Lê mî deda emma Leser dawa rewakem surtirîm

Demkujê emma be gij celadekem da dêmewe

Kurdim û natwê mewe, natwê mewe, natwê mewe

Wergera Şîrê...

*'Min digirin lê ji girtigehê bikerbtir im
Li min dixin lê li ser mafê xwe yê rewa bi israr im*

Min dikuje lê li hember celadê xwe di-sekinim

Kurd im û nayê m tewandin, nayê m tewandin, nayê m tewandin

Mimkun e yek bêje di wê şîrê de nasjonalîzm gelek heye, lê nasjonalîzm nîn

e. Ez miletek im, heqê min e bijîm, êca bîr û raya min a siyasî çi be jî, ez beriya her tiştekî miletek im û dixwazim bijîm, dixwazim azad bim, dixwazim xudmux-tariya min hebe.

Dibe di wir de min hizra xwe ya siyasî bi pêş xistibe, behsa rênçberiya kurdan kiriye ku çiqas zehmet dikêşe û kî keda wî dixwe. Min qala şivanê kurd kiriye ku çiqas zehmetê dikêşe û derencama keda wî bo kê ye? Lê armanca min a sereke ew e ku beriya her tiştekî ez kurd im, miletek im, miletekî perçekirî me, zilm li min tê kirin, nahêlin rewşenbîr jî bibim, heta ew kurdên ku fikra wan hatiye guhertin, bi baweriya min hemû ji heyfa dijmin bûye. Mesela ez dijberê fikra Kajîk (1) im, pîs e. Lê dijmin ew qas zilm li me kiriye ku kurdê bê tehemul mec-bûr maye bibe Kajîk. Zilmeke zor e, mafê te nebe bi zimanê xwe binivîsî! Bi zimanê xwe bixwîni, bi zimanê xwe bipe-yivî, bi destê mirov nîn e hêrs dibe. Ger wiha ye, mafê min heye bi zimanê xwe û ji bo kedkarê xwe binivîsim, ne bi zimanê nîn biyani.

Meterêzî şeref

Lêreş le nêw lêr û şax û berde

Lêreş legel ew hemû dax û derde

...

(Bi xwendina vê parçesiirê) gotûbêj bi dawî dibe.

(1) Kajîk: Komeleya azadî û jiyaneve û yekî-tiya Kurdistanê (1959 - 1975)./ wergêr...

Nîşe: Ev gotûbêj cara pêşîn di malpera 'Gzîng'ê de û bi zaravayê soranî hatiye belav kirin, li gor min ev gotûbêj balkêş bû, ji ber wê jî min bi destûra mamoste Hesên Qazî, gotûbêj ji zaravayê soranî wergerande kurmançî. Ev agahî çewt e! Divê bê zelalkirin!

Di gotûbêjê de carinan mamoste Hêmin bê hemdê xwe dixwaze bi kurmançî bi Mehmed Uzun re bipeyive, lê dema behsa Ehmedê Xanî dike, her tim dibêje 'Ehmeda Xanî'.

Dema serdana nemir M. Uzun bo Rojhilat, wî li Swêdê editoriya rojnameyeke bi kurdî dikir. Mixabin navê rojnameyê nizanîm! Dê agahî bê sere-rastkirin!

Pirsên vê gotûbêjê bi piranî ji aliyê M. Uzun hatine pirsîn.

Nifşê bêjî -II-

Helîm YÛSIV

Romanivîsên ku di qonaxa 1990-2000'î de derketin

Ez dixwazim di destpêkê de, li Bakur û Rojava, dîmenekî giştî ji rewşa siyasî ragihînim. Vê dîmenê ku di pencereya ziman, çand û wêjeya kurdî re tê ditin.

Li Bakurê Kurdistanê, di van salan de, pêşketinên dîrokî hatin holê. Pêşketinên di dema Ozal de û piştî rakirina qedexeya li ser kurdî, bi awayekî berbiçav rûdan. Heta raderekê be jî, lê têkoşîna kurdan ji bo bidestxistina mafekî bingeîn yê ji mafê mirovan, bi vê yekê encam da.

Rojnameya heftane "Welat" di 22'yê sibata 1992'yan de, bi kurdî hat weşandin, bi "Welatê Me" berdewam kir û "Azadiya Welat" wek yekemîn rojnameya rojane 15'ê tebaxa 2006'an dest bi weşanê kir. Dezgehên kurdan ên mîna enstîtu û navendên çandê hatin vekirin. Kovarên mîna Rewşen, Rewşenname û Jiyana Rewşen derketin û bi derxistina Kovara Wyê berdewam kir.

Weşanxaneyên kurdan dest bi weşandina pirtûkên kurdî kirin, li Stenbolê dest pê kir û li Amedê dewam kir. Tevgera Ziman û Perwerdehiya Kurdî TZPKurdî hat damezirandin û ji bo kurdî bibe zimanê perwerdehiyê kurd daketin meydanan. Li derveyî welêt jî yekemîn televîzyona kurdî ya satelayt MedTV'yê di 15'ê gulana 1995'an de, dest bi weşanê kir, bi Medya Tv, Mezopotamya

Tv û bi Roj Tv'yê berdewam kir. Ji bilî vê tevgera medya û weşanê ya organîzekirî, bi dehan kovar û rojname û çalakîyên ziman û çanda kurdî hatin holê. Ev aliyekî meseleyê bû. Li aliyê din jî, ev hemû hewldan di warê guherandina zimanê siyaseta kurdan, ji zimanê serdestan ber bi kurdî ve bi ser neket û di qada siyaseta kurdan de, vê zihniyeta ku zimanê serdestan dide pêş her û her ma desthilatdar. Li aliyê din ê sînor, li rojavayê Kurdistanê tevgera siyasî roj bi roj dibû piçîk û parî. Her partiyeke kurdan bû du û sê û çar partî. Zimanê siyasî yê nivîskî erebî bû, lê

geşbûneke berbiçav di derxistina kovarên kurdî de çêbû û hêdî hêdî vê geşbûnê cihê xwe da çilmisîn û sistbûnê.

Bi awayekî fermî zimanê kurdî qedexa mabû û pirtûkên kurdî, bi çapeke xerab, bi dizî û bi zehmetiyên mezin dihatin çapkirin û belavkirin. Li her du aliyên sînor dijarî li dar bû. Li Bakur şerê çekdarî gihîşt asta xwe ya herî bilind û bi

avakirina rêxistinên çete û kujerên rewşenbîr û welatperwerên kurd re dewletê rûyê xwe yê herî qirêj û gemarî diyar kir. Li aliyê din ê sînor

jî jenosîda spî di asta xwe ya herî bilind de bû. Bi bilindbûna asta berxwedana kurdan a li dijî dagirkerên welatê wan re, asta berhem û karê wêjeyî yê kurdî, roman jî di nav de, kete asteke din û nîşanên



xweavakirin û pêşveçûnê li ber çavan zelal bûn.

Mirov nikare vê qonaxê wisa bi temami jî qonaxa berî wê cuda bike, ne jî ji ya piştî wê. Piraniya romanivîsên ku di van salan de derketin, bi taybetî yên di salên dawiya vê qonaxê de, bi awayekî çalak beşdarî berhemdayîna qonaxên pêşiya me bûn, wisa jî berdewam dikin. Mebesta me jî vê dabeşkirinê, danasîn û destnîşankirina xalên hevbeş ên van nîşên romanivîs yên ku beşdarî pêşvebirina pêvajoya romana kurdî bûne. Ez dixwazim destpêkê, wekî danasîn, navên hemû romanivîsên ku di vê qonaxê de derketin, ligel navên berhemên wan û sala weşandina berheman, li gor demê rêz bikim:

Azad Ehmed (Bavê Şihîn)

- 1- Yên perîşan - Beyrût - 1991
- 2- Bexikê kesk - Semakurd - 2008

Medenî Ferho

- 1- Berxwedan jiyan e - AbeCe - Belçika - 1994
- 2- Mîrza Mihemed - Nûdem - 1995
- 3- Xaltika Zeyno - Doz - 1998
- 4- Marê di tûr de - Pêrî - 1999
- 5- Xewnên pînekirî - Pêrî - 2001.
- 6- Dora Bacinê bi dar e - Tevn - 2007
- 6-Çiroka me - Do - 2009

Bûbê Eser

- 1- Gardiyan - Roja Nû - 1994
- 2-Jiyanek - Bajar - 2004

Hesenê Metê

- 1- Labîrenta cinan - Welat - 1994
- 2- Tofan -Apec - 2000
- 3- Gotinên gunehkar -Avesta - 2007

Xurşîd Mîrzengî

- 1- Sînor - Jîndan - 1995.
- 2- Ristemê Zal - Rewşen - 1999
- 3- Belqîtî - Komal - 2004

Mihemed Dehsiwar

- 1- Çirîskên Rizgariyê - Newroz - 1995

Îhsan Colemergî

- 1- Cembelî Kurê Mîrê Hekarî - Apec - 1995

Silêman Demîr

- 1- Sorê gulê - Nûdem - 1997

- 2- Koç - Roja Nû - 1998
- 3- Piştî bîst salan - Doz - 2007
- 4- Cassandra - Avesta - 2010

Mustafa Aydogan

- 1- Pêlên bêrîkirinê - Nûdem-1997

M. Beşîr

- 1- Sofî Remo - Medya - 1999

Lokman Polat

- 1- Kewa marî - Helwest - 1999
- 2- Filozof - Helwest - 2002
- 3- Rojnamevan - Pêrî - 2002
- 4- Robîn - Veng - 2004
- 5- Kodnav Viyan - Helwest - 2006
- 6- Parola operasyonê - Helwest - 2008

Zeynel Abidîn

- 1- Binefşên Tariyê - Doz - 1999
- 2-Girava stêrkên vemirî - Evra verlag-Berlîn - 2004
- 3- Bigirî heval- Evra verlag - Berlîn - 2007

Îbrahîm Seydo Aydogan

- 1- Reş û Spî - Doz - 1999
- 2- Leyla Fîgaro - Mîr - 2003

Fêrgîn Melîk Aykoç

- 1- Mamosteyê zinaran - Rewşen - 1999
- 2- Îlên li ber pûkê - Rewşen - 2002

Laleş Qaso

- 1- Se şev û sê roj - Nûdem - 1999
- 2- Wêran - Pelda - 2002
- 3- Xezeba azadiyê - Pelda - 2000
- 4- Ronakbîr - Pelda - 2003

Helîm Yûsiv

- 1- Sobarto - Avesta - 1999
- 2- Tîrsa bê diran - Avesta - 2006
- 3- Gava ku masî tî dibin - Lîs - 2008

Bavê Nazê

- 1- Çiyayên bi xwînê avdayî - 1978
- 2- Stockholmê te çi dîtiye bêje - Förtattores Bokmaskin -1987
- 3- Dara pelweşiyayî - Duhok 2002 - Lîs 2010
- 4- Miriyê heram - Lîs - 2009

Şahînê Bekirê Soreklî

- 1- Wendabûn - Enstituya Kurdî Beşa Elmanî -1987
- 2- Veger - Yekîtiya Nivîskaran a Duhokê - 2006

Ji bilî Mehmed Uzun û Mehmûd Baksî ku her du çûne ber dilovaniya Xwedê, berhemên Bavê Nazê û Şahîne Bekirê Soreklî, li kêleka çirokê, di warê romanê de jî berdewam kirin. Ji ber vê yekê, me navên wan jî li navên vê demê zêde kirin. Wisa jî, ne bi navê Nûrî Şemdin, ne jî bi navê Birîndar nema tu roman derketin.

Taybetiyên vê qonaxê di pêvajoya romana kurdî de

✓ Romana kurdî ji qonaxa ku mîna alaveke siyasê be, derbasî qada wêjeyê bû. Bi her awayî ber bi xweseriyê ve çû. Ji nav lepên mijarên siyasî û jînenîgariya kesayetên dirokî xwe berda qada civakî û derûnî ya kurdan. Ji siyasê naveroka xwe ber bi rengîniya jiyane ve ajot.

✓ Ji hêla teknîk û honandinê ve, cudayî û sîdwergirtina ji teknîka romana nûjen ên zimanên din, hêdî hêdî, diyar dibû.

✓ Piraniya nivîskarên vê qonaxê hewl dan ku nebin qurbanên siyaseta dewletên dagirker, wisa jî nebin alavên propagandaya siyaseta kurdan.

✓ Zimanê romanê ber bi resenî û asteke bilindtir ve çû û bi demê re, kêr zêde dikaribû li ser kurmanciyê standard bê axaftin.

✓ Her çendî hinek ji van nivîskaran berdewamiya qonaxa beriya xwe bin, hinekên din jî bi awayekî çalak beşdarî qonaxa ku wê bê, bûn. Vê yekê rê, bi temamî, li ber wan ditinên ku romana kurdî nedidîtin, girt. Romana aurî bû rastiyeke wêjeya kurdî ku, hêjayî nîrxandin, rexnekirin û diyarkirina astên cihê û cuda ye.

Romanivîsên qonaxa salên 2000'î heta 2010'an

Ji bo binavkirina nîfşekî, mirov nikare wî di nav deh salan de asê bihêle. Dibe ku dabeşkirina navan û berhemên li gor demê, angû di hundirê deh salan de, alîkariya me ji bo pêvajoya lêkolînê û zelalkirina danasînê bike, lê ji bo binavkirina nîfşên nû yê romana kurmancî, divê mirov nav û berhemên her du qonaxên dawiyê bîne cem hev:

Adil Zozanî

1- Kejê - Pêrî - 2001

2-Mişextî - Lîs-2009

Reşad Akgul

1-Veger - Rewşen-2001

2-Evdalkovî - Mezopotamya - 2004

Newroz Saîdpour

1-Vîyan - Sî - 2002

Remezan Alan

1-Saturn - Avesta - 2002

Mezher Bozan

1-Av zelal bû - 1, 2, 3, 4, Pêrî-2002, 2004, 2006, 2008

2-Zêna - Nûbihar - 2007

3-Zarokên me - Pêrî - 2005

4-Asim - Pêrî - 2007

Torî

1- Mendik - Berfîn - 2002

Kemal Orgun

1-Li qerexa şeva hîvron - Sî-2002

Omer Dilsoz

1- Hêviyên birîndar - Aram - 2003

2- Bêhna axê - Berçem - 2005

3- Neynika dilî - Aram - 2009

Jîr Dilovan

1-Zenga zêrîn - Mezopotamya - 2003

Menaf Osman

1-Girê şêran - Serhildan - Aram - 2003

Eyup Kiran

1-Dewrêşê Evdî - Mîr - 2003

2- Pilingê serhedê - Elma- 2005

Jan Dost

1-Mijabad - Belkî - 2003

2- 3 gav û 3darek, Şeva dawî di jiyana Şêx Seîdê kal de - Avesta - 2007

3-Mîrname - Avesta - 2008

Abbas Abbas

1-Xewnên siyarî - Pêrî - 2004

2-Şivanê berxan - Pêrî - 2004

3-Dengbêjê piçûk - Pêrî - 2005

4-Helbestvan - Pêrî - 2005

5-Neviya çiyayekî - Pêrî - 2006

Mîran Janbar

1-Ardûda - Lîs - 2004

Riza Çolpan

1- Serhatiyên Rustem û nemerdiya namerdan - Veng - 2004

Lokman Ayebe

- 1-Jar lê Sermest - Belkî - 2004
- 2-Gava heyatê - Belkî - 2007

Mehdî Zana

- 1- Ay dayê - Tevn - 2005

Yaqob Tilermenî

- 1-Kitim - Sêbareya Mêrdînê 1 - Lîs - 2005
- 2-Qerebafon- Sêbareya Mêrdînê, 2 - Do - 2009
- 3-Bavfileh- Sêbareya Mêrdînê, 3 - Do - 2009

Dilawer Zeraq

- 1-Şevên wînda wêneyên meçhûl - Lîs 2005

Firat Cewerî

- 1-Payîza Dereng - Nûdem - 2005
- 2-Ez ê yekî bikujim - Avesta - 2008

Atila Barişer

- 1- Mandalîn - Elma- 2005

Sabrî Akbel

- 1- Evîna Pînhan - Nûbihar - 2006

Diyaar Bohtî

- 1-Gul bişkivîn - Mezopotamya - 2006
- 2-Mexmûr - Mezopotamya - 2007
- 3-Soryaz - Do - 2008

Serkan Birûsk

- 1- Sê terîş - Apec - 2006

Nesîp Tarim

- 1- Xezal - Belkî - 2007

Yunus Eroglu

- 1-Nameyek ji Xwedê re - Lîs - 2007
- 2-Otobês - Lîs - 2010

Arîn Zîn

- 1- Ez stêrka sîpan im - Berçem - 2007

Aram Gernas

- 1- Toqa lanetê - Doz - 2007

Îlhamî Sertkaya

- 1- Kilama Şîlanê - Pêrî - 2007

Îbrahîm Osman

- 1-Evîna mêrxasekî - Lîs - 2008

Edîb Polat

- 1-Ristemê Zal - Evrensel - 2008

Mîr Qasimlo

- 1-Wêneyên keserê - Pêrî - 2008
- 2-Giyanên bahozi - Do - 2009

Şener Ozmen

- 1- Rojnivîska Spînoza - Lîs - 2008
- 2- Pêşbaziya çîrokên neqediyayî - Lîs - 2010

Hesen Huseyin Deniz

- 1- Hêvî her dem heye - Do - 2008

Zarife Demir

- 1-Kela bilind - Apec- 2008

Ali Huseyn Kerim

- 1-Şopa rojên bihurî - Rewşen - 2008

Hesenê Alê

- 1- Sêwiyên rojhilat - Stil offset - 2009

Newaf Mîro

- 2- Keleşê reş - Pêrî - 2009

Cihan Roj

- 1- Gîtara bê tîl - Do - 2009

Abdullah Pertev Işık

- 1-Mirinên bêwext - Astore - 2009

Ozgur Kiyak

- 1-Rêwiyên bêwelat - Do - 2009 - 32

Di nav van her du qonaxên derbasbûyî de, hin nav û berhem hene ku wê bandora xwe li pêvajoya romanê ya salên pêşiya me jî bikin. Dijwariya karê vî nîfşî, ligel tunebûna piştgiyê, rewşa wî nêzikî rewşa *bêjiyan* kiriye.

Nîfşê ku bi keda xwe ya takekesane, bi tenê, bê xwedî, bê pişt, bê çapemenî, bê reklam, bê werger, bê pere, bê xwendevan, bê dewlet, bê xwedî û bê xwedan, rahiştîye barê pêşxistina wêjeya miletekî perçebûyî û bê dewlet. Her wisa bilindkirina asta zimanekî qedexekirî ku bi hêzên çar dewletên pişaftker hatiye dorpeçkirin, ji xwe re kirin mijûlî û erk.

Taybetiya vî nîfşî ya sereke ew e, ku bi zimanên dewletên serdest, pêzanînên xwe yên di der barê romanê û çawaniya nivîsandinê bi dest xwe ve anîn û bi zimanê xwe *-kurmancî-* nivîsandin. Ne derfet hebûn ku bi kurdi pirtûkên li ser teoriya romanê, şêwe û metodên teknîkî yên nivîsandinê û dîroka pêvajoya wê, bixwînin. Ne jî romanên kurdi, bi wê hejmara ku tê xwestin, li ber destan hebûn, ku xwe bi zimanê xwe ava bikin. Çend navên girîng, di wê navê re, bûn mal

û milkê zimanên serdest. Ji bilî peyva “regez kurd” ku di vê çarçoveyê de ji danasîne pê ve tiştekî nabêje, nikaribû li ser van romanivîsan bê gotin. Ew jî tiştekî li wêjeya kurdî zêde nake. Mirov dikare vê rewşa ne asayî ya romanivîsên kurd bi du awayan şîrove bike. Aliyê erênî ew e, ev nivîskar ên ku bi zimanekî din xwendin û bi zimanê xwe nivîsîn, man dilsozê zimanê dayîkê û bi fedakarî û kedeke mezin xwe gihandin radeya romanivîsandinê. Wisa, ji bo berhemê bi xwe jî, zemîna serkeftinê hat amadekirin.

Di romanên li ser rewşa kurdan de, zimanê resen ên kesên romanê bi xwe kurdî ye, wisa jî di dema nivîsandinê de, kurdî dimîne. Vê reseniyê, rê li ber bidestxweveanîna kûrahiya ruhê civaka kurd û êşên wê yên xedar de jî, vekir. Di romanên ku bi erebî, yan bi tirkî, li ser kurdan tên nivîsandin, nivîskar bi xwe neçarî wergera zimanê kesên xwe yên romanê dibe û ev yek bandoreke xerab li asta romanê û ya karakter û zimanê wê dike. Ji bilî wê, romanivîs bi xwe dibe şîrik û hevparê talankirina çanda xwe û guheztina hin taybetiyên civaka kurd ber bi zimanê serdestan ve ku di encamê de ji wêjeya wan re dibe mal.

Aliyê neyînî yê vê rewşa “duzimanî” ew e ku nivîskarê kurd nikaribe xwe bi temamî ji bin siya zihniyet û mentelîteya zimanê dewleta serdest rizgar bike. Forma zimên û awayê avakirin û sazkirina hevokan a zimanê din, carinan ji bo zimanê romanê yê kurdî dibe sedema zirareke mezin. Bi vî awayî, roman mîna romaneke wergerandî tê xuyakirin. Carinan jî vê bandorê xwe berdida kûrahiya mejî û ramanên nivîskêr. Her çendî nivîskarekî weha, bi kurdî binivîse, lê dîsa jî bi hişmendiya dewleta xwediya zimanê xwendina xwe, tevdi gere. Vê bandorê xwe di hin mînan de nîşan dida, wekî biçûkxistina ziman û wêjeya kurdan, reva ji binavkirina Kurdistanê û xwepêşkêşkirina wekî nivîskarekî pirzimanî yan jî niştimanî. Ango bi kurdî dibin alîkarên planên dewletên ku kurdî qedexe dikin.

Tevlihev kirina mijaran û pêdiviya têgihîştinê:

Yek ji sîmayên vê rewşa me behs kir tevlihev kirina mijaran e. Mînak wê, di danûstendinên li ser romanê de, diyar dibin.

Li cihanê, piştî Şerê Cihanê yê Duyem û bi avakirina dewletên neteweyî re, danûstendinên li ser romana berî û piştî dema dagirkirin û kolonyalîzmê dest pê kirin. Pê re jî romana nûjen, modern û vê dawiyê jî “postmodern” û her wisa. Bihev girêdanek di navbera naverok û formên romanê de hebû. Bi taybetî li cîhana rojava ku roman wek serencama “bajaran” û pêşveçûna çîna bûrjûwaziyê ve hate girêdan. Şaşîtiya mezin di qada wêjeya kurdî de, ew bû ku kesên hatin û behsa romana kurdî kirin, ew nîrxandinên ku li ser romaneke din hatibûn holê, ji xwe re kirin pal û pişt. Kesên ku xwestin behsa romana kurdî bikin, hatin û behsa çend klîşeyên hazir kirin û her ew klîşe hatin dubarekirin. Geh qala tunebûna romana kurdî dibû, geh jî rastiya rewşa romanê dibû qurbana nîrxandinên kesên bêagah ku piraniya wan romanên nexwendine.

Di vê der barê de, divê mirov çend xalên girêdayî taybetiya pêvajoya romana kurdî bi bîr bîne:

1- Di demekê de ku li her deverê behsa qonaxên piştî dema dagirkeriyê “kolonyalîzmê” dibû, Kurdistan, wê çaxê û heta niha jî, mêtîngeheke “koloniyêke” di nav dewletan de, perçebûyî ye. Jixwe, wê ev rewşa bi her awayî ji welatên din cuda, siya xwe bavêje ser romana kurdî jî.

2- Her çendî roman wek berhemeke “bûrjûwaziyê” an “bajarvanîyê” û li rojava jî dayîk bûbe, lê dîsa jî ji bo hemû mirovahiyê bûye mal. Romana nûjen, modern, xwe nema dispêre wan mercên destpêkê yên ku roman derxistin holê. Bi vî awayî, roman ji bo her miletî çî be, ji bo kurdan jî ew e.

Bindestî û perçebûna kurdan û welatê wan, wisa jî qedexekirina zimên, di riya nivîsandina romaneke kurdî ya nûjen de ku di asta romana zimanekî yan miletêkî

din de be, nabin asteng.

Berevajî wê, rewşa aloz a kurdan, dikare bibe çavkaniyeke dewlemendiya mijaran, wisa jî ji bo afirandina romanê, bibe zemîneke alîkar.

3- Balkişandina ser taybetiya pêvajoya romana kurdî, nayê wê wateyê ku romana kurdî ji derveyî pêvajoya romanê ya cîhanê ye.

Balkêş e, her gava ku beramberiyeke wisa çêdibe, bi her awayî, wêjeya kurdî, romana kurdî, pê re jî romanivîsên kurd, tîn biçûkxistin.

4- Divê ev her du alî ji nav hevdu bîn derxistin, aliyek ev e; Paşdemayîn û bindestiya kurdan, perçebûna welêt û tunebûna dewleteke neteweyî, bi peyvekê “paşdemayîn” a civakî û siyasî.

Aliyê din jî ev e; Rewşa romana kurdî. Ango paşdemayîna kurdan nayê wê wateyê ku romana kurdî jî paşde bimîne. Têkilî heye, lê dibe ku tîkiliyeke berevajî be. Civakeke paşdemayî dikare bibe xwediyê wêjeyeke “pêşveçûyî”

Divê ev rastî, bi awayekî zelal, bîne fêmkirin. Dewletên dagirker dikarin rê li ber hemû projeyên siyasî û civakî yên kurdan bigirin, lê tu artêş û dewlet nikarin rê li ber nivîsandina romaneke xweşik bigirin.

Siyaseta kurdan, heta niha, bi girîngiya wêjeya nivîskî nehesiyaye û bi awayekî ku tê xwestin, dest dirêjî ziman û wêjeya kurdî nekiriye. Vê dawiyê, dewlet, bi girîngiya vê meselê hesiyane û dest avêtin qada ziman û wêjeya kurdî. Hem hewl dan ku “nivîskarên xwe yên kurdînivîs” çêbikin, hem jî mantelîteya xwe, bi kurdî, derbasî wan deverên civaka kurd bikin, ew ên ku bi hemû hêza çek û zordariya xwe ya giran nikaribûn xwe bigihînin wê derê.

Yek ji sedemên girîng ên bêjîbûna nîfşê nû yê wêjeya kurdî jî xwe dispêre vê bî talihiya siyaseta kurdan û birêvebirina vê siyaseta bi zimanê dewletên dagirker.

Dewleta kurdan nîn e. Gelo kurd û tevgerên wan ên siyasî, ji bo geşbûna romana kurdî, çi dikin?

Pirseke bi vî rengî, hinekî komîk û hinekî jî bi mirov xerîb tê. Ji ber ku tiştêkî bi vî navê “romana kurdî” di nav kar û bar û plan û mijûliyên siyaseta kurdan de, bi hemû dezgehên xwe ve, tune ye.

Girîngtirîn xal, di vê der barê de, tunebûna projeyan e. Ango dema plan û projeyên “çand û huner û kulturê” tîn danîn, raman û xeyalên rêveberên siyaseta dezgehên kurdan ji lidarxistina festîvalan, her ji çend salan carekê yan çend rojên ji bo semîner û xwendinên wêjeyî, yan jî konferanseke zimên wêdetir naçe. Du, sê rojan, bi dehên nivîskar û wêjevan tîn cem hev. An di nav xirecira muzîk û stranan re dengê wan naçe tu kesî, yan jî wan çend rojan hevdu dibînin, biryar û ramanên xwe ji hev re dibêjin û vedigerin malên xwe û çalakî li wir diqede.

Heta niha haya min jê tune ye ku “butçeyek” e biçûçik be jî ji bo romaneke kurdî hatiye veqetandin. Ne ji bo nivîsandinê, ne ji bo belavkirinê, ne jî ji bo wergerandina bo zimanên din.

Heta niha xelateke bi nîrx ji bo wêjeya kurdî, ne li çar perçeyên Kurdistanê, ne jî li derve, nehatiye terxankirin.

Hemû xelatên ku di rojên wêjeyê de tîn belavkirin, an kaxiz maxiz in ji bo dîlxweşkirinê ne, yan jî tiştîkî miştikên sembolîk û erzan in. Ev yek jî nîşaneke berbiçav e ji nîrxdayîna kurdan ji bo berhemên wan ên wêjeyî.

Di vê der barê de, **ji bilî hewldanên “donkîşotî” yên romanivîsên kurmançî, tiştêk li meydanê nayê dîtin.**

Bi keda xwe, bi îmkânên xwe yên takekesane, romanivîsê kurmançî, mîna bêjiyekî, di nav civakeke ji ziman û ruhê xwe yê resen hatiye dîrxistin, li ber xwe dide û bi zimanê dayîka xwe yê qedexê dinivîse.

Her “bêjiyek” bi tena serê xwe, li deverêkê romana xwe, bi kedeke mezin, digihîne ber destê weşangerê kurd. Bi vî awayî “bêjiyek” li vir, “bêjiyek” li wir, bi dilsoziyeke mezin, her yek ji hêla xwe ve, tasek av berdide cihoka romana

kurmancî, ya ku êdî rê li ber herikandina ava wê nema dikare bê girtin.

Ji 1995'an û vir ve, ew "bêjî"yên belawela, dikarin mîna nifşekî nû bîn dîtin.

Ew cihoka romana kurmancî hêdî hêdî dibe çem. Ew çem, roj bi roj, ber xwe fireh dike û berê qeyikên romana kurdî ber bi deryaya mezin a wêjeya cîhanî ve diajo.

Çend encamên giştî

✓ Sal bi sal, hejmara romanivîsên kurmancî zêde dibe. Nişanên vê yekê jî, hejmara romanivîsên her qonaxekê ji qonaxên ku me behs kirine ye. Diyar e ku wê ev hejmar, di salên li pêşiya me de, hîn zêdetir bibe.

✓ Zêdebûna hejmara berheman, zêdebûna teknîk, şêwe û awayên honandinê bi xwe re anîn.

✓ Bi giştî, ev roman nebûn film û rêzefilm. Derfeta belavbûna berfireh a van romanên, heta niha, çênebûye. Hem jî girseyên mezin dûr mane, hem jî, dûrî rexne û nirxandinên berfireh man. Nimûneyên awarte hebin, dîsa jî pîr hindik in. Wekî mînak, divê miroveke/î romanivîs di asta jina serokomar de be, heta ku romana wî/wê bibe film. Li Başûr, bi îمكانên keça Îbrahîm Ehmed, Hêroxan ku xanima serokê Yekîtî Niştîmanî Kurdistan -YNK- û serokomarê Îraqê C. Telebanî ye, romana bavê wê "Jana gel" wekî film hat kişandin.

✓ Hema hema tunebûna jinên romanivîs di kurmancî de, ji bilî navekî yan duduyan, nişaneke jî nişanên rewşa xerab a civaka kurd û rewşenbîriya wê ye.

✓ Tevî hemû guhertinên ku rewşa cîhanê ya nû ku piştî salên nodî, bi xwe re anîn. Tevî hilweşîna kelehên îdeolojî û ramanê li seranserê cîhanê û eşkerebûna girîngiya ziman û wêjeyê jî bo her miletî, dîsa jî nivîskarê kurd bi hewldanên xwe yên şexsî û takekesane re, bi tenê hat hiştin. Romanivîsê kurd

jî bi romana xwe ya ku (nayê) xwendin û (nayê) firotin re tenê ma. Wek mînak, hemû karên ji bo pêşvebirina ziman û wêjeya kurdî, li benda biserketina sosyalîzmê diman. Bawerî ew bû ku wê sosyalîzm hemû pirsgrêkan çareser bike û her weha, li şûna wê niha "demokrasi"yê cih girtiye.


✓ Di vê dinyaya gilover de, ji berê bêtir, berjewendiyên dewletên dagirker bi hêzên mezin, wekî Emerîka û Ewrûpayê re dibin yek. Dibe ku kurd, di eniya pêşvebirina ziman û wêjeya xwe de jî, hemû dinyayê li hemberî xwe bibînin. Pencere, li her derê li hewldanên pêşvebirin û vejandina ziman û wêjeya kurdî bîn tengkirin.

Wek mînak, demekê Yekîtiya Sovyetan pencereyek bû, demekê jî hin dewletên Ewrûpa û Îskandinavyayê, lê niha dibe ku dewletên Ewrûpayê ji bo kurdî, mîna Tîrkiye û Sûriyeyê tevbigerin. Ev yek li şûna ku kurdan bitirsîne, divê wan li zimanê wan, wêje û çanda wan germ bike. Kurd, ji bo ziman wêje û çanda xwe çî bikin, ew e. Ev rastiya giştî, ji bo romanê jî derbas dibe.

- Tevî hemû astengîyan, ew deriyê romana kurdî ku li gor rewşa siyasî, geh vedibû û geh jî dihat girtin, ji niha û pê ve dê vekirî bimîne û wê tu rewşên siyasî nema karibin wî deriyê li afirandin û nûkirinê kilit bikin. Ev yek jî bo romanivîsên kurd ezmûneke giran e. Serkeftina di vî warî de ji bo wêjeya me pêdiviyeke bi lez e.

Ji bo dîmena romana kurmancî, bi temamî zelal bibe, pêdivî bi agahiyên li ser rewşa vê romanê di nav kurrmancên Rojhilat û kurdên Sovyeta berê de, heye. Her wisa romanên li herêma Behdînan, Başûrê Kurdistanê. Ev jî mijarên lêkolîneke taybet in, ku wê piştî demekê encam bide.

Nîşeya nivîskar: Ji bo sererastkirina agahiyên di derbarê romanivîsan û berhemên wan de, daxwaz ji hemû xwendevan û nivîskaran ew e, ku alîkariya me bi sererastkirina agahiyên şaş bikin, her wisa agahiyên nû heta dawîya 2010an, eger hebin, ji me re bişînin.



"Weşanên Belkî"yê

Kooperatifler Mah. Tren Yolu Sk. Bağırın Apt. No:1 Ofis/Diyarbakır
Tel&Faks: (0412) 224 47 72 e-mail: cirusko@hotmail.com
www.wesanbelki.com

Stok*

Îsmâîl HACANÎ

Li sêryana ha, gazînoyeke kevnar heye, maseyek danîne û yarîkerên mezin li ber yek in. Agah ji demê nîn e, salên wan çirke ne û çerxên wan birge ne, ji şeşê ta bîst û yekê li ber yek in, ne diwestin, ne radiwestin, ên pêk ve hûlî bûne.

Eve heyameke qereçiyek di-hête vê gazînoyê, moriyan vedigire, bextên reş spî dike, qereçiyê be-jinzirav e, dev û lêv şîrîn in, mêtî jê dibare. Hinda merdane ye tu bibêjiyê dehmena xwe rake, bê yek û du radike, bibêjiyê maçekê, sêyan dide, gelekî seyr e hez ji bazi-nan nake û zendên wê teji bazin in.

Wê roja ha bi destê min girt û perixand û bextê min xwend, serê xwe hejand û got:

Jiyê te gelekî dirêj e, te ava heyatê vexwariye, zû bi zû namirî, ji hebûna Adem tu yê heyî heta nebûna Adem, lê te hind bawerî bi xwe nîn e hindî bi xelkî heye.

Hêştî tiliyên min di nav destên wê de, dîsa gurdegurda dengê yarîkeran li pişt maseyê bilind bû.

Yekî digot:

- *Stoka xwe peyt bike.*

Yê din digot:

- *Ma we çi maye heta hûn yariyê sera bikin?*

Ewê beramber, destê xwe bir bin keşê xwe û pirtûkeke kevn û berg û lêvdirayî anî der û bi lêvên xwe vena û danî ser

maseyê û got:

- *Eve beyta min.*

Ewa bi rex ve ji pişt maseyê rabû û qulpeke singê xwe vekir û destê xwe danîn ser memikên xwe yên rût û got:

- *Ez ê bi van cotê pîvokan bi-hême yariyê.*

Di vê navbeynê de dengêkî tîj ji goristana beramber hat, hemû li xwe zivîrîn, miriyekî serê xwe û destê xwe yê çepê ji nav kefen anîbû der wekî kangûrûyan, bi cotkanî xwe dihavêt û digot:

- *Rawestî ez jî yarîker im.*

Hemûyan pêk ve gotê:

- *Ma te çi heye heta tu yariyê sera bikî?*

Ewî jî ji dûr ve bersiv

da:

- *Eve kefenê min.*

Çavên hemûyan ma li xwedanê stokê, ewî jî bi qebe ve destê xwe bir paxila xwe û kaxezeke mezin û nexşandî danî ser maseyê û got:

- *Eve nexşeya welatê min stok e, vêca werinê gund.. gund... bajêr... bajêr li ber we ye.*

Evê çirokê xelata yekemîniyê bir di pêşbaziya rêveberiya rewşenbîrî û hunerî li Duhokê ewa di 10.12.2005'ê de hatiye sazîkirin.

***Stock:** Bi îngilîzî Stake, di qumarê de terxankirina pereyan, di qumarê de pere-dayîn. Kovara W





Hecî NEHSAN

Tu xewnên şûm dibînî di xewên zîvîn de
Rûyên te pir dibin
di vê esmertiya kedîkirî de
Di rojhilata nivîsên sêwî de
çi dinivîsim digihîje te
Tenêti bi helbesta
di berîka min re mijûl dibe
Ma tu jî dixwazî bibî helbesteke bi çend
peyvên tazî li ber tîna dîl

Hevokek nenivîsî bo terpilîna pênuşê dihêlîm
bo raperîna hibrê
Lê tu di ser ciwantiya min re dibihurî
çi bikim, çi bibêjim
Derd nakevin ber diranên peyvê
ka ez çi bibêjim?

An jî wekî “qîrîna” Edward Manchî ji niha
ve bibim rewrewkeke tagirtî?

Xîsa çivîkan ji lêvên te difûre, lê tu wisa arî yî
Ka dengê xwe bi baranê bişo
û di vê valahiya şîn de were
Ev şîn di ku de zirav dibe di wir de peyt dibe
Lê tu şip û şîn were heta dem dibehce

Çivîkek di ruhê min de diperpîte
Heyv li şehlan dinihêre
Sîtavkek stranên şîregermî dinihurîne
Tu li rûyê xwe cihekî bihêle
bo ramûsanê û were

07.11.2009

Helbesta Kuştî

Guleke şermo
Di nav striyên har de
Ji janên meyandî xeyalên tenteneyî çêdikir
Dem di bin nêrînan de nerm dikir
Havîna çûyî
Min navê te li lênûska xwe nivîsî
Nadiya
Tu xwişka hemû helbestên min î
Gulhinara ku bi qîrînê vebû
Şehida hêmayê
Nadiya
Tu firîna xalxalokan î
Hemû kulîlk sinix dimînin
û îskeîska peyvên bê navnîşan e

02.10.2009

Têbîniya nivîskar: Nadiya Anjoman, jineke efxan bû. Tenê ji bo ku helbest dinivîsî (helbest-van bû) mêrê wê, ew kuşt. Nadiya 25 salî bû. Di helbestên xwe de zilma li ser jinê vedigot

Di helbestê de hestên azadiyê

Kamran Simo HEDILÎ

Helbest li dijî hemû xirabiyan çeka serhildana bindestan e

Ramana azadiyê, di bîr û ramana mirov de cihê bingeîn digire. Azadî ne tenê şadî û dilxweşiyê tîne, mirov dike mirov. Ji bo pêşxistina ramana azadiyê jî, helbest bandoreke berbiçav di pêşengiya pêşxistina raman û hestên azadiyê de dileyîze. Bi vê rola xwe ya ku xîtabî hest û ramanê dike, helbest dibe hêviya rizgarî û azadiyê. Civak û gelên ku helbestvaniya wan li pêş e, raman û hestên wan ên azadiyê jî xurt in.

Paul Eluard di helbesta xwe ya bi navê “Azadî” de dibêje: *”Ez li zevî û baskên çûkên biçûk, di siyê de li aş dinivîsim. Li rêçên jî xew hişyar bûn, li riyên ku hatine reşandin û diçin, li meydana nêşt (tiptije) navê te dinivîsim ey azadî”*

Raman, hest, xewn û xeyalên helbestvan azad, paqij û aşîxwaz in. Helbestvan li cihanê li wekheviyê digere. Di nav tiştê ku helbestvan li wan digere de azadî li pêşiyê tê.

Octavio Paz dibêje: *“Azadî tişteki wisa ye, di hebûna kesayetiya cihana nava me de, hebûneke hêja ye û tişteki ku qet ne pêwîst e wê bixîne nav qelebalixa gîştî. Bi gotînek din hebûneke xweser e, her kes hêjahiya wê di kesayetiya xwe de hildigire”*

Seidê Kurdî dibêje, *“ez bê nan dikarim bijîm, lê ez nikarim bê azadî bijîm.”*

Sira azadiyê hunereke wisa ye, bêtî ku kevin bibe di nava mirov de dijî û dibe pêhesîna hestan. Ev sira pîroz, di dinya nefretê de dibe fînda şadiyê. Di êş û jana bêhêviyê de dibe dermanê xweşiyê. Dibe paqîjiya avê, dibe zelaliya xeyalê û di nava helbestvan de dibe şeweya jiyanê. Helbestvan ne bêtî wê dibe û ne jî, ji ber çavtirsandinên zaliman bédeng dimîne. Helbestvanên ku pêlên azadiyê di nava wan de diherikin, helbesta xwe dikin stêrk û li pêşberî tariyê radiwestin.

Di Şerê Cihanê yê Duyemîn de, helbesta nivîskar û helbestvanê sovyetê Konstantîn Simonov a bi navê *“li benda min bimîne”* li seranserê Sovyetê dibe kaniya hêviyê. Hemû dayik, jin û yar vê helbestê jî ber dikin û dibe asoya sebra dilê wan.

Dîsa di şerê li dijî faşîzmê de, li Spanyayê bandora hestên siyasi yên Federîko García Lorca, bandoreke mezin li ser gelê Spaniyayê kir. Li Şiliyê jî di berxwedana li dijî diktatorê faşîst Pînoşî de rola Pablo Neruda nayê jibirkirin.

Di şerên azadî û rizgariyê de bandora helbestvanan, ji bandora fermandarên şerker ne kêmtir e.

Raman û hestên azadiyê mîna çemên bê ku zanibin rawestin, di hişê helbestvanan de her diherikin. Bi mîzdana mêtî, tiştên ku nayên fêhmkirin, helbestvan fêhm dikin û dibêjin. Bi forma anîna ziman di dilê bêhest de qolincên ronîya birûskê dijenînin. Carinan jî mîna dûyê pixêriyên bajarên wêneyên nediyar çêdikin.

Hunermendên ku hunera xwe di pêşengiya çerxê de neherikînin, dibin kujerên hatina gelê xwe û gelên wan bi çêja azadiyê nizanin. Ji ber ku helbest, berxwedana ku pêşî lê nayê girtin e. Hin danasînen helbestê wisa tên kirin; helbest serhildana bi peyvên a li dijî astengiyên jiyanê ye. Helbest, di dema bêhêvîtiyê de qirîna mîrxasîyê ye. Li dîlgirtina gelan û hem li ya kesên, henasa azadiyê ye. Helbest, şerê di navbera hiş û binhişînê de ye. Helbest, hunera xewndîtina azadiya civakên ku hatine razandin e. Azadkirina giyanê civakên ku giyanê wan dîl hatiye girtin e. Hunera nîşankirina asoya hêviya gelên ku hêviyên wan hatine şikandin e. Helbestvan van tiştan hemûyan di helbesta xwe de pêşkêşî civakê dike. Ji bo wê tê gotin, *“helbest ji hinan re şer e, ji hinan re zîlm e, ji hinan re jî hêvî û azadî ye.”*



Aristo di der barê hêviyê de dibêje,
"hêvî, xewneke ku mirovan hişyar dike ye"

Li cihên ku serdest dixwazin hêviyê bikujin, pêşiyê dengê helbestvanan tê bihîstin û gelek caran dengê wan dibe kaniya hêviyê. Mînak, piştî Şerê Cihanê yê Yekemîn, welatê kurdan bûbû gola xwînê û dibe ku ev cara pêşîn bû kurdan xwe wisa neçar diditin. Li nav wê deryaya neçariyê, dengê helbestvanê hêja seydayê Cegerxwîn wiha dihat.

*"Bavê te çû şer, şêr e li meydan
 Êrîş dibin ser Îran û Tûran"*

*Destên xwe dan hev kurmanç û dostan
 De rabe ser xwe, kurê min rabe!"*

Seydayê Cegerxwîn bi helbestên xwe bû çirûska nîşana hêviyê û bi nivîsandina helbesta xwe bi navê *"Kî me ez"* bû bersiva hemû tirsandinên neyaran. Xwîna wêrekiyê li dil û mêjiyên ku hatine tirsandin gerand.

Dîsa di sala 1975'an de hêviya serhildana kurdan a li başûrê Kurdistanê şikest û kurd di nav deryaya neçariyê de li hena-seyêke jiyane digeriyan.

Helbestvanê hêja Seydayê Tîrêj, bi helbesta xwe ya bi navê *"Ey bîlbîlê dîlşad, hela wer bike fixan"* av reşand ser gula hêviyê û

bû strana li ser zimanê her kesê/a ku nedixwest ku hêvî bimire.

Gelek mînakên weke vana li cihanê jî hene ku helbestvan bûne çirûska hêviya azadiyê. Ji bo pêşkêşkirina vê çirûskê xwe kirine qurban. Yek ji van çirûskan, helbestvan û lehengê neteweyî yê Macaristanê Sandor Patofi ye. Di raperîna sala 1848'an a li dijî zilm û serdestiya malbata Habsburg de, wek berpirsiyarê ciwanên bajarê Budepeşteyê, di nav raperînê de cih digire.

Helbesta wî ya bi navê *"Hişyar be Macar"* dibe sembola şoreşê. Piştî jî di şerê li dijî dagîrkirina Macaristanê de, helbestvan û lehengê neteweyî Sandor Petofi dîsa cihê xwe digire. Hem bi pênûsa xwe dibe çirûska hêviyê û hem bi kiriyara xwe vê dike. Diçe eniya şer û dibe pêşengê hêviyê. Mîna şervanekî şer dike, heta ku digihîje dîlovaniya xwe. Kuştina wî jî dibe moraleke mezin ji bo gelê Macaristanê.

Di derbarê azadiyê de Victor Hugo jî wisa dibêje, *"Di dinyayê de du tişt hene ku ez dixwazim û jiyane bi min didin hezkirin, evîn û azadî. Di ber evînê de pêwîst be ez ê jiyana xwe bidim, lê ji bo azadiyê ez evîna xwe jî feda dikim."*

Helbestvan ji bo ramana azadiyê û pê-

şketinê xwe dike qurbanê baweriya xwe. Nietzsche di der barê vê mijarê de dibêje: *“Bişeyî, bişeyî da tu perçe perçe bibî”*

Ev hestên azadiyê bi hemû helbestvanan re weke hev ne xurt in. Bi hinan re hestên din li pêş in. Helbestvan di bandora çî de be, helbesta wan wê dinivîse. Di nava xwe de çî kom kiribe, ew derdikeve derve. Têgihîştina wan a jiyane û çîroka jiyana wan çî be, rengê helbesta wan ew e.

Helbestvanê ku bibe şoreşgerê xwedî giyanekî xurt, li dijî mirinê serî rake, li pêşberî çerxa bê temen ku dizivire raweste û hesab jê bipirse, ew helbestvan dê bibe pêşengê pêşvebirina jiyaneke xweş û nemir. Eger pêwîst be di nivî de çerxê bişikîne, bibe aşîxwaz û jiyaneperest be, li bêmirîniyê bigire û tu caran raneweste, dikare xwe bike gorî hestên xwe. Yanî pêwîst e ku helbestvan, rojên ku tê de dijî ji xwe re û civatê re têr nebîne.

Pêwîst e helbestvan nebe pesindarê sistem û rêveberên roja xwe û nebe asteng ji veguhertina jiyane re.

Berî vêga bi salan Jean Paul Sartre di danasîna helbestvan de gotibû. *“Helbestvan kesê ku xwe ji bo helbestê dike gorî ye.”* Di vê danasîna helbestvanan de, helbestvanên weke Baudelaire, Lautremont, Rimbaud ji xwe re mînak girtiye. Her yek ji van helbestvanan gihiştîye lûtkeya hunerê. Lê di jiyane de yên herî zêde zehmetî kişandine jî, ew bûne. Ji ber ku wan berî civata ku tê de dijiyan tişt hîs dikirin, didîtin û dianîn ziman. Ji ber ku civatê ew fêhm nedikirin, ew afaroz dikirin. Lê ji ber ku desthilatdar ji nêrîn û gotinên wan ditirsiyan, ew ji nedîtinê re dihiştin an jî ceza dikirin.

Helbestvanên ku hestdariya wan a li pêşberî bêmafîyê xurt e, dikevin bin bandora helbesta xwe. Mîna kesên ku li nav gel di xewê de digerin, ango xewger in. Ji ber ku her demê di bin bandora bûyeran de dimînin û dihezirin bê çawa dikarin bûyeran di helbestên xwe de bi cih bikin.

Walter Benjamin dibêje, *“Ramanwer kesê li nav civatê di xew de digere ye. Li nav wan digere lê ne ji wan e. Ji wan pirtir difikire, ji wan zûtir dibîne, ji wan zanatir e*

lê mîna bêkaran dixuyê.”

Rimbaud ji bo Baudelaire yê ku civatê ew afarozkirî (çîrozkirî) dibêje: *“Yê pêşerojê dibîne.”*

Cezayê dîtina pêşerojê, ne bi carekê tenê ye ku didine helbestvanên pêşerojê dibînin. Ev ceza ji roja ku mirovan dewlet avakirine ve heye.

Feylezofê mezin Sokrates ji bo ku pêşeroj didît, jehr pê dan vexwarin û ew wisa ceza kirin. Ji bo ku rêveberên komarên Atînayê jê ditirsiyan, ev ceza danê. Dîsa berî vêga bi du hezar salan, helbestvan Publius Ovidius Naso ji ber helbestên xwe hatiye koçberkirin. Împaratorê Romayê Augustus, helbestên wî yên evîne li derveyî exlaq dibîne û wî dişîne nefiyê û hemû pirtûkên wî ji pirtûkxaneyan dide komkirin. Bi vî awayî ji çavên civatê dikeve û li nefiyê dimire. Lê piştî raman û nêrînên di pirtûkên wî de bandora xwe li ser hunera sedsalên serdema navîn û li Ronesansa Ewropayê dike û ji nû ve li nav Ewropayê û cihanê tê naskirin.

Weke van mînan gelek mînak hene ku mirov dikare bide. Li her welatî mirov dikare bi çendan mînak bide. Hin bi mirinê, hin bi girtîgehê û hin jî bi koçberiyê hatine cezakirin. Helbestvan dibe fedekarê/a herî mezin û cefakêşê/a jiyane. Ev ji bo helbestvanên gel û çînen bindest zehmettir e. Helbestvaniya çîn û gelên bindest ew qas ne hêsan e. Hin caran jiyane ji wan re dibe zindan û hin caran jî berxwedan û têkoşîn e. Ev berxwedan bi jiyana wan ji wan re dibe mal. Di destên helbestvanên gel û çînen bindest de carinan helbest ku-lîlk in, carinan jî dibe gule û xencer.

Gotineke wisa tê gotin, *“Welatên ku helbestvanên wî bêdeng bin, ew welat mîna zarokên sêwî ne.”* Dema welatek sêwî be, gelê wî welatî bi rûmet nikare bijî û çêja tiştekî jiyane namîne.

Saint John Perse dibêje: *“Helbestvan xwe di nav bûyerên dîrokê de dibîne û xwe ji trajêdiyan dîr nabîne. Ji bo vê yekê, nîşandana rûyê demê têra helbestvan dike.”*

Yanî ji ber ku trajêdiyên dîrokê dizanin, pêşeroja xwe zû dikarin bibînin. Maskeya li ser rûyê desthilatdaran radikin û rût

nîşanî civakê didin.

Li vir mebest, helbestvanên ku pêşerojê dibînin û ji bo azadî û pêşxistina civatê dinivîsîn e. Mebest ne helbestvanên ku methkirina şah û qralan nivîsandin e. Ev cureyê nivîskar û helbestvanan feydeya xwe di nivîsandina pesnê serdestan de dibînin. Lê mijar ne li ser wan e, mijar nivîskar û helbestvanên ku nivîs û helbestên wan pêşengiya pêşxistî û azadkirina civatê kirine ye.

Rene Char di rêzikeke helbesta xwe de dibêje; *"...û bîmire, ji bo ku tu bi navê her kesî axiviyî..."*

Bê çawa hin kes helbestvanên azadîxwaz heft qatan dîkin bin erdê. Yên ji wan hez dîkin û xwe di nêrîn û gotinên wan de dibînin jî wan ji xwe re pêşeng dibînin. Ev alî, wan derdixin heft qatên asîman. Bi helbestên wan tîrî coşê û li dijî serdestan serî radîkin.

Gelek helbestvanên bi nav û deng ji bo pêşxistina civatê, di eniya pêş de cih girtine. Hinan pênûsa xwe kirine şûrê pêşxistinê. Hinan pênûsa xwe kirine kulîlk û pêşkêşî xoşewîstiyê kirine. Hinan pênûsa xwe kirine desmala girî ji bo azadiyê. Ev hemû jî, rê û rêbazên pêşxistina civatê nîşan didin. Helbestvan êşên xwe û civatê bi parzûnê ziman tenik dîkin û bi peyvên ku li guhan xweş werin, pêşkêşî civatê dîkin.

Bi riya peyvê, civatê bi xêr û xweşiya azadiyê dihesînin. Peyvan wisa dihûnin nahêlin ku qirêj li ser peyvê bimîne. Dilxweşî û bextewariyên civata xwe yên ku bi sedan salan heta roja wan hatine, tîne ziman. Ev dilxweşî û bextewariyên gel û çînen bindest yên ku serdestan ji ber tîrs û çavnebariyên xwe ji pûçbûnê re hiştine û nahêlin werin meydana jîyanê, helbestvan wan dibêjin. Ev hejahiyan ci-

vatê yên ku serdest dixwazin kakilê wan pûç bikin, helbestvan bi şehîkirinê geş û xwestîr dîkin û dibêjin.

Li nav kurdan ji aliyê hestên neteweyî ve, rola Ehmedê Xanî tu caran nayê jibîrkirin. Ew yek ji wan kesên ku berî civatê ev xetera li ser ziman û çanda kurdan dîtiye û pîrs kiriye. Berî îro bi sêsed salan, bindestîya kurdan dîtiye û ji bo rizgar bibin yekîtiya wan xwestiye. Ev raman û hestên xwe di helbestên xwe de bi kar anîne.

*"Ez mame di hûkmeta Xwedê de
Kurmanç di dewleta dinê de.*

*Aya bi çi wechî mane mehrûm?
Bîlcumle ji bo çi bûne mehkûm?"*

Û wisa gazinên xwe didomîne.

*"Ger dê hebûya me îtîfaqek
Vekra bikira me înqiyadek
Rom û Erebb û Ecem temamî
Hemûyan ji me re dikir xulamî"*

Vê pêşîdîtina Ehmedê Xanî kiriya kesekî pîroz û mezin di nav gelê kurd de. Her wisa sistem û dewletên ku naxwazin kurd ji bin destên wan derkevin, xwestin ku Ehmedê Xanî were jibîrkirin. Mîna ku helbestvan û zanayekî bi navê Ehmedê Xanî nehatiye vê

dinyayê. Rojekê ne navê wî dibêjin û ne dixwazin ku mirov li cihekî helbestên wî bibîne.

Disa bandora helbestvanên alman Schiller û Goethe ji bo ronîkirina gelê alman mînak in.

Çawa ku xweşîkî û spehîbûn armanca helbestê ye, hişyarîkirina hest û ramanê civatê jî armanca wê ye. Ji bo van armancan çî pêwîst be, divê helbestvan bike.

Mamoste Îbrahîm Ehmed jî dibêje:



“Nejî ji bo mirinê, bimirê ji bo jînê”

Helbestvanên ku helbestê ji bo azadî û rizgariya mirovan dinivîsin tu kes nikare pêşiyê li ber dengê wan bigire. Dengê wan weke dîtina stêrkên li hemû welatan tê bihîstin. Dengê wan ne sînoran û ne kurtedeman nas dike. Ziman û nêrînên wan mîna awirên teyrên baz li asîmanên welatan digerin û xwendevanên xwe digirin. Halikarnas Balıkcısı dibêje, *“Helbest peyva bi bask e”*

Sait Faik jî dibêje: *“Cihê helbest lê nebe, xoşewîstiya mirovan jî lê nabe. Bi tenê helbest dikare hezkirina mirovan bi mirovan bike, helbest tiştê ku mirovan nêzikî hev dike ye”*

Helbest, ji bo hestên azadiyê dibe pira navbera gelan û dibe pira ku hezkirinê ji dilekî dibe dilekî din. Carnan dibe gaziyek, an gazinceke ku evîndar ji dildarên xwe re, yan bawermend ji derwêşên xwe re weke peyamê bi rê dikan. Carnan bi peyvên xoşewîstiyê helbestvan xîtabî dilan dikan. Carnan bi riya helbestê pêxember peyamên xwe digihînin bawermendên xwe. Hin caran jî helbest propagandeyek e. Carnan jî şeweya perwerdehiya jiyanê ye. Lê bi piranî, peyamên ku bi riya helbestê tên dayîn, peyamên hezkirinê ne.

Mahatma Gandî dibêje: *“Ji berdêla ku mirov piranî çêkin û bigihên hev, diwar çêkirine û jî hev dûr ketine.”*

Helbestvan wan diwaran nas nakin û hezkirin, dostanî û germiya dilê mirovan digihînin hev. Tovê hezkirinê li dilên mirovan direşînin. Helbestên xwe hem dikan pira hezkirinê û hem jî dikan rêzana hezkirinê. Ji ber vê yekê, divê mirov danaşîna helbestê û têgihîştina mirovan a azadiyê ji hev cuda neke. Ji bo ku helbestvan karibe helbesta xwe bike pir, divê zimanê xwe, cihana xwe û şewê nivîsandina xwe bibîne.

Helbestvan bi riya teorîk tiştan fêhm dike û bi riya pratîkê wan diguhere. Bi ya yekemîn digihîje xwezaya xwe, bi ya duyemîn wê diafirîne. Lê forma yekemîn bingeha ya duyemîn e. Ji bo helbestvan bikaribe helbesta ku li

dilan digere û hestên azadiyê hişyar dike binivîse, di çî temenî de dest bi nivîsê bike bila bike, bi salan pêwîst e bixwîne û bibe xwendevanekî/e baş. Piştî dikare cihana xwe, dengê xwe, şeweya xwe biafirîne. Yanî ji bo nivîsandinê pêwîst e bixwîne. Heta li jiyanê be, bibe xwendevanekî/e baş. Tiştê baş bi helbestvan dide nivîsandin, bandora hevoksazî, sembol û şeweyên di pirtûkên ku tên xwendin de ye. Li vir mebest ne ew e ku helbestvan akademiye yan zanîngeheke baş bixwîne. Kes nikare hunera helbestê û helbestê bi helbestvan bide zanîn. Ne dibistana helbestê heye û ne mamosteyên helbestnivîsandinê hene.

Roman çawa tê nivîsandin, kompozîsyona wê çawa ye, çîrok çawa tê nivîsandin piçekî be jî mirov dikare bide zanîn û şeweya nivîsandinê bide fêhmkirin. Lê ya helbestê mirov nikare bide zanîn. Yanî zanînen teorîk û pratîkên helbestê mirov nikare bide. Lê hunera helbestnivîsandinê, bi pirxwendin û bihîstinê ye. Helbestvan vê jî nav jiyanê derdixe û bi dest dixê. Disa mirov dikare wisa bibêje, helbest rûbara hest û xeyala ku di navbera xwendevan û helbestvan de ye.

Gotineke girîng wiha dibêje: *“çîroka her kesî heye lê helbesta her kesî nîn e.”*

Goeth dibêje: *“Ji her tiştê ku bandora xwe, roj bi roj li ser min zêde neke yan rasterast kelecaneke li jiyana min neke û tiştêkî lê zêde neke, bi tenê zanîne bide, ez jê nefret dikim”*

Helbestvan ji her tiştên ku dixwînin, dibihîzin û hîs dikan sûdê werdigirin. Bi şeweya veşartina sembolan di helbesta xwe de bi cih dikan. Bi vê rêbazê xwendevanên xwe di nav kelecane de tînin coşê. Helbestvanên ku bi kelecana giyanê xwe helbestê dinivîsin, helbesta wan dibe çavneqandina asîman a rakirina bahoze. Tariyê didin çirisandin. Çirûskan direşînin ser xeyalên azadiyê û dilên dildaran ji hezkirinê tijî dikan. Ji xewnên ramanê re pencereyê vedikan.

Aragon dibêje: *“Sêhra hunera helbestê ew e ku kêmayiyan werdigêrin xweşîkiyê.”*

Veqetîn

Û rû li wan çilmsibû
Û bê navber dihilqikîn

Nola berfa li ser kulîlkan
Dadiketin pelên payîzê

An jî destên te yên narîn dadiketin ramûsanên min



Çawa bizanibim delala min

Çawa bizanibim delala min ku hîna ji min hez dikî
Guh bidê! Dîsa nalenala boriyên şevê ne
Delalê Lou, li ber min resmê te, oooox çiqas hez ji te dikim
Û tu sankî bi keviyên lêvan bi dildara xwe dikenî

Tu hay ji te nîn e, çi bi te hat delalê
Ooof heyî yan tune yî yan te dev ji
Wê soza evînê ya ku dabû vî leşkerî berda
Min pir dixwest bimirim li qeraxa behreke biyan

Hêy Lou jana min a bê debar, hêy Lou dilê min ê parçewerçe
Newayeke şêrîn a boriyên nêçîran di guhê min de
Û belê va ye dibînim, dûr ji min gelek dûr
Ew nêrînên nerm û bi heyecan ên ez pê gêj dibim

Ji porê te yê hevrîşimî radimûsim yaqûta dilê min
Û ew porê ku nîşaneyê evîna te ye
Dengê te yê melodîk û bîranînên min dûr dibin
Hêy boriyên şevê, jiyanê min pirtûkek e û diqulibin rûpel

Bi xatirê te delala min Lou, ji çavên min rondik dibarin
Dizanim dê te nebînim heta mirinê
Delalê Lou, her bilind dibe tarî di navbera me de
Û min ji te hêvî, bes carcaran bi bîr bîne wan demên sotikevîn

Katjimêr
digirî
tam sê caran

Heke li wir miribûma !!!

Heke li wir miribûma, li pêş di şer de
Delalê Lou, te yê xwe kur û kem kiribûya
Nola mirina guleyê, parçewarçe
Ji bo ku bi bîr bêm tu tişt nedin alî li dû min
Guleyeke delal ku dişibe sorkulîlkeke delal
Û bîranînên pelixî li çar kenarî
Dê binixumiya cîhan bi xwîna min
Behr, stêrka xuricî, gelî û çiya
Û li esmanên heftan gerestêrkên nûwelidî
Nola sêvên ji zêr çêbûyî li dora Baratier*

Ev; bîranînên jibîrbûyî ne, lê dijîn li çar kenarî
Min dê sermemikên te yên gewr ji mêtinê sorsor kiribûna
Min dê lêvên te û porê te yê rengdojeh ji ramûsanên sorsor kiribûya
Tu dê tu caran pîr nebûyayî û ev hemû tiştên xweş
Ji bo çîroka evînê dê tim û tim ciwan bimana

Dê bi xêra xwîna min him dinya
Him jî roj çêtir bibiriqiya
Û ji bo kulîlkan rengên xweştir, ji bo çeman herikîneke boş
Bi xêra xwîna min
Dê hezkirineke bêhempa daketa cîhanê
Dildara min tu yê bi bedana xwe ya şilftazî hîna bi hêz bibûyayî

Lou, heke li wir bimirim bîranînên jibîrbûyî
 Di demên xwe yên bi coş de bi bîr bîne
 Bi bîr bîne
 Di rojên ciwaniya bi agirê evîne dagirtî de
 Xwîna min ku jêderka bextewariya te ye
 Tu bibe herî bextewar ji ber ku herî xweşik tu yî

Hêy evîna min hêy serserîtiya min a mezin
 Lou dadikeve şev
 O li wir tê bihîstin/ dirêj
 Û pir dirêj e çîroka xwînê

Guillaume APOLLÎNAÎRE
Wergera ji frensî
Remezhan OLCEN

Cette adorable personne c'est toi
 Je t'aime et grand je t'aime
 O li wir tẽ k
 U pir dirẽj e

Kakil

Dilşêr BÊWAR

Ji bo Ehmed Huseynî

Embara kul û eşan di dil de
Himîniya çemê dîrokê diçirîne
Meya ku ji kakilê avestayê hatiye vedizîn
Egera lêgerîn û jiserxweçûyîne ye
Dolbenda li ber pozê peyvdankê alandî
Hêmaya gayê bin nîr e
Umrê bi jehra biskên xemê (*yarê*)

nexemiliye beyhode ye
Sî û sîber venîştîye li ser tûncik û sim-
bêlê narincî
Ewrên teqînên bahozi ne
Yaqûtên ji nava qermiçokên eniya qemer
digindirin
Newayên xwezayî ne
Îksîrîn xewn û xewnerojkan diazirîn



Şî n

Janbijan AR

Ji bo Gulistanekê..

Şîn e
Bi rondikên çavên min rojiya xwe ya
mirinan veke tayê
hêviyên min di xewnerojan de vejîne
ji dûr ve bi xerîbiyeke mîxane
cejnê min ên qurbanan
ji her rojî bêtir reş û şîn in
masiyên ku li qeraxan sobeberî dikirin
niha di xemsayên rûyê min de bi zikrê
ketine
guneh in, wan (jî) vejîne

şîn e
niha tunebûna kesan bêtir
di laşê min de diçe
di berfanbaran de asîman nagirîn
rûyê min berfa sor nabarîne
di bin siya “ez”an de ez natebitim tayê
min biperçivîne.... min biperçivîne....

*

Bêrîkirinên min li benda
bêrîkirinên te har
Ji par ve navê paryayê li xwe edilandine
xew, şev, ez û ez
ji ber dengên te re jî heram in êdî
dilovaniya senaryoyên karesatan
di cencereyan de laş dipêçe haydar be
di dest de dilên delal jî nemane ezgorî
wa ye ronî jî çav berdide tariyê
tu jî xwe fêrî mîrateke din bike

** Navê helbestê ye. Kovara W*

Bavê min tiştê nekiriye!

Kawa ŞÊXÊ

Dengê derî ez ji xew şiyar kirim, min bazda, ji ber ku ji zû ve ye deriyê min wisa xurt lê nedaye. Min derî vekir, hevalê min Hamo li ber derî sekiniye destê xwe daniye ser devê xwe û xwe bi zorê girtiye û li dora xwe dinihêre. Min ew derbas kir û dema ket hundir; keniya û nema karibû raweste.

Min jê pirsî:

- Çi heye Hamo?

- Ez ê.... niha..... Û nema karibû ji ken berdewam bikira.

- Heger tu vî kenî bernedî tu nikarî bi axivî û heger tu neaxivî jî ji bo min wekhev e! Min jê re got û kenê wî her diçû bêtir dibû.

Ji nişka ve kenê wî rawestiya, li min nihêrî û got:

- Ez ê ji te re bibêjim lê tu yê bawer nekî!

- Ka bibêje û bawerkirin û nebawerkirin dimîne li min!

- Tu dizanî kî miriye?

- Miriye? Tu bi mirina hinekan ew qas dikenî?

- Erê ez ji te re bibêjim tu yê jî bikenî!

- Hema kî be jî, ma mirov dikare bi mirinê ew qas bikene?

- Bavê Xidir miriye!

- Ez nas nakim, îcar bi xwe bikene!

- Û ji ber vê ez dikenim.

- Min got qey tiştê birastî heye, gerek min ji ber xwe ve fêr bikira ku planek ji yên te ye. Ka were derbas bibe û hew!

- Na, te fêr nekir, ev ne plan û ne jî henek e.

- Min ji te re got ez bavê Xidir nas nakim û hew!

- Tu Xidirê hevalê me nas nakî?

- Ez Xidir nas dikim, heger tu li ser Xidirê me yê sor dibêji?

- Ew bi xwe.

- Ê?

- Bavê wî mir!

- Tu şaş î!

- Na, na ez ne şaş im!

- Xidir ê sor ê xwediyê dikana mirişkan?

- Erê, Xidir lo, ma çend hevalên me hene bi navê Xidir?

- Tenê yek e!

- Bavê wî yekî mir.

- Ez ji te re dibêjim, tu şaş î!

- Çima? Hamo pirsî wek yekî ku bi bersivê dizane.

- Ji ber ku bavê wî nîn e ta ku bimire!

- Û kenê min jî ji ber vê yekê bû. Gava din Xidir telefon ji min re vekir, digiriya û got bavê min mir, werin alikariya min bikin em ê wî veşêrin!

- Ev bêtirî pênc salan e ku ez û Xidir em heval in, ne rojekê behsa bavê xwe kiriye û ne me ew ditiye.

- Erê, ji ber vê yekê dema Xidir ji min re got min bawer nekir û ez keniyam, lê dema Xidir giriya min nas kir ku rast dibêje. Min telefon ji hemû hevalan re vekir û va ye ez hatim ba te jî da ku em herin alikariya wî bikin!

- Ez heta niha jî bawer nakim. Min got, lê di dilê xwe de min bawer kir dema min ew rastî di çavên Hamo de dît.

Hamo got:

- Yê min, ez ketime heyra ku çawa ez ê xwe bigirim da ku ez li ber Xidir nekenim.

- Ez bawer im wê Xidir jî li ber nekeve, ji ber ku ew ji berê ve miriye!

Hamoyê ku dizane tiştan xweş bike, destên xwe li hev xistin û berdewam kir:

- Ne rojekê me dengê wî bihîst, ne rojekê kesî behsa wî kir li mala wî?

- Lê dîsa jî ne gerek e ku tu wisa bikenî, mirin mirin e!

- Tiştê ez bêtir kenandim, dema ku min telefon ji hevalên me re vekir da ku werin, Hejar hat û gurzek gulên mezin bi xwe re anîbû.

Min got:

- Hejar jê werê hîn li Rûsyayê ye û em her du kenîyan.

Min kincên xwe zû li xwe kirin û di ber re Hamo ji min re diaxivî:

- Di vê kolana pişt a we de, li ber deriyê mala Ehmed tirimbêla Elo li benda me ye.

Em derketin, çûn ber bi tirimbêlê. Di minîbûsa biçûk de hemû hevalên me xwe dabûn ser hev. Min gava yekemîn avêt hundir yekî ji hevalan ji min re got:

- Te bihîstîye ku mirî dimirin? Û hevalên mayî hemû kenîyan.

Yekî got:

- Bi rastî jî min heta roja îro nebihîstibû ku bavê Xidir heye û min nebihîstibû ku rolek lîstîye di jiyana kurê xwe de û ne bi cîran û derdoran re!

Tirimbêla me berê xwe da gundê Xidir. Hamo yê ku birêvebirina vî karî dikir got:

- Na, na em ê pêşiyê herin mala Cemîl, em ê wî jî bi xwe re bibin û paşê em ê herin ser mezê, niha hemû li wir in.

Di hundirê vê gruba me de hemû rengên mirovan li hev vehewiyane, tevî ku me piraniya dema xwe bi hev re derbas dikir; lê dîsa jî her yek ji me fikrên wî yê cuda hebûn. Tenê tiştê ku em li ser digihîştin hev ew bû ku me hemûyan ji çand û hunera kurdî hez dikir û diparast.

Ji bilî hevaltiya me ya wekî din û emrê me yê nêzikî hev jî. Lê dîsa jî di mijara çand û hunerê de her yek ji me nêrinên wî hebûn; Elo pir ji stranên dîlanê hez dikir û ji bo wî gotin ne girîng bûn, tenê rîtmek xweş hebûya û xwe li ber li ba bikira bes bû û bi felsefeyê jî ev aliyê xwe diparast û digot: ez dizanim ev muzîk ji bo min tiştêkî xweş û baş e ji bo psikolojiya min e, ji ber vê ez jê hez dikim.

Hejar piştî ku ji Rûsyayê vegeyriya pir ji muzîka romansî û klasîk hez dikir, ji ber ku muzîka kurdî ya romansî û klasîk li gora wî tune bû; li ber muzîka rûsî dima û ji ber me nedihîşt di nava me de

veke ji ber vê ew jî bê muzîk dima.

Hamo ji muzîka sivik hez dikir û li her kesî guhdarî dikir û hema yekî bigota: Ez birîndar im an jî ez dinalim, wî jî digot; vî ez helandim.

Lê Xidir ji me hemûyan bêtir li ber dîsekinî bê wê li çî guhdarî bike, yanî heger ne tiştêkî bijartî bûya û li gor xwesteka wî bûya nikaribû lê guhdarî bike.

Xidir ji muzîka kurdî ya kevn hez dikir û timî digot însanê li tiştê xerab guhdarî bike alîkariya wan kesan dike ku kultura me xera dîkin.

Ji aliyekî din ve jî Xidir xortê hê qenc û dilsoz bû di nava me de û dikaribû ji bo xatirê ku kovareke kurdî bi dest bixe bi sedan kîlometreyan here.

Tirimbêla me berê xwe da mezê, piştî ku me hevalê xwe yê dawîn Cemîl hilanî û em çûn û di ber re Hamo pêkenok berdewam dikirin û Elo jî wek her dem ajotina xwe pêşî me dikir.

- Ka ji me re wê teybê vekin hîn em dûr in lo, berî em nêzikî gund bibin em ê vemirînin! Cemîl got:

- Ez fikirîm lê min nema zanibû ez kasêta kê ji we re vekim. Elo lê vegeand:

- Ji ber ku me timî tirimbêla Elo bi xwe re dibir ger em biçûna deverêkê; her yekî ji me kasêtek li gorî xwe kiribû tirimbêlê. Heger em bi rêyeke dirêj ve biçûna; me rê li kasêten xwe par dikir, yanî di her perçeyek rê de me li yekî guhdarî dikir.

Hamo bang kir:

- Ji ber ku ez rêvebirê vê rêyê me; divê hûn li kasêta min guhdarî bikin! Tevî ku kasêta wî, ya em herî jê aciz bûn jî, ji ber ku stranbêjê wî yekî nû hînî kurdî bûbû û behsa xanima xwe dikir û pelên payizê û baranê qiyametek tiştên romansî dabûn ser hev, lê nikaribû gavek tenê ji bi aliyê romansiyetê de bavêje. Heta bi Hejarê ku ji stranên romansî hez dikir serê xwe bi acizî dihejand û berê xwe bi aliyê derve ve dikir.

Elo ji me hemûyan mezintir bû, ji ber vê Hamo xwest ku wî bide pêş li ba malbata Xidir, ji bo serxweşiyê. Hamo jê re got:

- Elo ez niha we bi rê ve dibim lê heger em gihîştin û pê ve tu yê bibî rêvebirê me, ji ber ku kes ji me nizane di rewşên wisa de bi axive wek te!

Elo singê xwe vekir, rihetiya xwe stend û got: Erê erê, ez hingî çûme serxweşiyên li ba min ew û dawet wek hev hemû kar in. Bi xêra vê tirimbêlê em hînî pir tiştan bûne. Binihêrin ez ê ji we re tiştêkî bibêjim; dibêjin carekê rehmetiyê Seydayê Cigerxwîn di ber mezelekî re derbas bûye, ditiye jinek li ber gorekê rûniştiye û digirî, Seyda rabûye jê pirsîye û gotiye: Xwakê, ma ev ê mirî çî yê te bû tu wisa li ser digirîyî? Dibêjin jinikê lê vege-randiye û gotiye: Yabo hema duayekê jê re bike, merekî ne di xêr û ne di şera kesî de bû, ne qencyên wî li kesî hebûn û ne jî xerabî bi kesî kiribû. Wê çaxê Seyda jê re gotiye: Hema ew mirovê ku ne qencî û ne xerabî kirine bila rehma Xwedê ne lê be, ew însanê ku nikaribe xêrê bike hema bila xerabiyekê bike da ku em bizanibin ku heye!

Em hemû bi gotina Elo kenîyan.

- Elo me digot tu yê alîkariya me bikî, ji bo em xemgîn xuya bikin, ne tu yê kenê me binî. Guneh e ji bo xatirê Xidir! Min got:

- Xatir matir tê de nîn e, însan heger wisa be gerek were şermezarkirin. Ma ji we werê ev çîroka Seyda rastî ye? Ez ne bawer im lê Seyda wek her dem mamos-tetiya xwe ji millet re berdewam kiriye û bi vê çîrokê xwestiye bibêje ku însan gerek timî hewl bide û çî pê re derdikeve bila derkeve. Hejar bi tirs got:

- Lê dîsa ji mirin tiştêkî cuda ye!

- Na, na mirî dîsa namirin û ev însan ji berê ve miribû, em kurd ne pir hewceyî kesên wisan in! Hamo got;

- Lê mirin! Hejar xwest tiştêkî bibêje lê wî gotina xwe vege-rand, dema Elo lê nihêrî û got:

- Binihêre, Hejar hurmeta min ji te û ramanên te re heye, lê gerek em kurd êdî ji vî warî derkevin da ku em bi pêş bik-evin. Ew kulilkên te anîne nazikbûna hestên te nîşan didin, lê heger em her mirovekî wisa bi gulan têxin gorê; yên ku

kirin wê çî cudabûna wan hebe ji yên ku nekirine?

- Lê min xwest... Hejar xwest tiştêkî bibêje lê Elo dîsa gotina wî birî û got:

- Ez dizanim te çî xwest, lê ez tiştêkî din dixwazim. Wî mirovî tiştêkî nekir ne wisa, lê a niha hûn hemû karekî baş dikin, dema hûn diçin dilê hevaleyê xwe xweş dikin. Ji ber vê - bi nerîna min - ev gulên hanê ji we re bin wê çêtir bel!

Hejar serê xwe hejand, li gulên xwe nihêrî û got: Ê ma çû min kirîn.

- Na, neçû! Elo got, tirimbêl li alîyekî rê rawestand û li me zivirî. Destê xwe avet gurza gulên Hejar, pakêta wan a naylon vekir, gulên wê derxistin û her yekî ji me yek da me, me jî bê deng û matmayî gulên xwe wergirtin.

Yekî ji Elo pirsî: Ma ka hema em neçin û hew, ma em wisa difikirin hema bila her kes zanibe ku kesekî wisa, em bi za-nebûn naçin şîna wî!

Elo got: Na, em ji bo Xidir diçin wekî ku alîkarî û li wir ez ê vê gotinê bibêjim.

Min xwe avêt nav: Ne gerek e tu bibêjî, em ê wî veşêrin, serê Xidir xweş bikin û vege-rin malên xwe!

Hamo dest bi pêkenokên xwe kir, heta em gihîştin wir. Me rûyê xwe tirş kir, me gulên xwe li ser kursiyên xwe hiştin û em daketin çûn ser mezel.

Li ser mezel, çend mirov hebûn ku gor hazir kiribûn. Xidir çav sor kiribûn ji girî, tozê serê wî pêçabû.

Dema em dîtin hat pêşiya me, me hemûyan bi destê wî girt û me dest bi alî-kariya wî kir, me bavê wî veşart. Her tişt qediya, di ber re jî Hamo carê qironcokek dida min an jî çavekî dide yê din û em jî bi dizî dikenîyan.

Carekê Xidir li me nihêrî ku em dike-nin, me hemûyan fedî kir, lê Elo bi cege-reke mezin ber bi Xidir ve çû, destê xwe da ser milê wî û jê re got:

- Xidir, bila serê te sax be, lê em di rê de axivîn û me dît ku bavê te ji zû ve mi-riye, ne niha miriye û ji ber vê ne hewce ye ku tu wisa li ber bikevî; ji ber ku ew li jiyanê be yan jî ne lê be wek hev e, ji te re û ji her kesî re, îcar çîroka Seydayê

Cegerxwîn û pîrê ya li ser gorê tu dizanî?

Hamo ber bi Xidir ve çû û got: Xidir, bila serê te sax be, ez ê ji te re bibêjim yanî me xwest em bibêjin ku bavê te ne helbestek, ne nîgarek û ne çîrokek li dû xwe hişt û ne me dersek jê girt; ji ber vê me xwest em jî mirina wî bikin çîrok, ma ku kesî ji jiyana wî sûd negirt!

Gerek min jî tiştê bigota, ez ber bi wan ve hatim û Xidir matmayî li me dinihêre, min got:

- Yanî mirî mirine û nikarin dîsa bimirin, ji ber vê însanê ku rola wî tune be; ne hewce ye mirov ji bo mirina wî şîne çêke, tu bawer dikî ku min nizanibû ku bavê te heye; heta min bihîst ku miriye?

Dema min gotina xwe bi dawî kir, hêsir di çavê Xidir de civiyan û bi şewat li aliyê gora bavê xwe nihêrî, hêsirên xwe ziwa kirin û got:

- Na, gelî hevalên delal we şaş fêm kiriye. Bavê min ne ew kesê ku hûn behsa wî dikin e! Bavê min dengê wî xweş bû û dikaribû binivîsiya jî. Ji bo gelê xwe timî dilşewat bû, lê ewî ev biryar beriya pazdeh salan da. Dema dît bê çawa stranên kurdî tîn xerakirin û hinek kes wan bi dengên xwe yê ne xweş dibêjin, bi gotinên tevlihev kultura me gemarî dikin. Wî di destpêkê de hewl da ku bistrê lê dema dît ku ew heqê strana kurdî nade li nav û dengê xwe nepirsî û dev ji stranan berda.

Hewl da ku binivîse lê dema nihêrî ku nikare tiştêkî cuda binivîse ewî biryar stend ku helbest û çîrokan ji bo belavkirina navê xwe xera neke. Ew tevî karê politîk bû û dît bê di hundirê partiyên me de çawa axatî bi rengekî nû tê meşandin û her kes li navê xwe digere û perçebûn û wendabûn, nema zanibû kî rast dibêje û kî şaş e û ji tirsê ku tevli parçeyekî bibe paşê derkeve ku ew şaş bû; ew jî berdan û nema karên politîk jî kir.

Li mala xwe rûnişt li nûçeyan guhdarî kir, di dilê wî de hêviya xewneke mezin mir û dema min jê pirsî: Yabo hevalên min tîn ba min tu çima nayê ba me û bi me re rûnaneyî û bi me re naaxivî? Ji

min re got: Binihêre kurê min, hûn xort in nû tîn, hûn hemû hêvî û hêz in û çênabe ez hêviyên xwe yên mirî nîşanî we bidim û hêviyên xortan bişikênim.

Bavê min guhên wî diêşyan û digot: Dermanê guhê min nûçeyeke xweş e ji bo kurdan, lê wî ew nûçe nebihîst. Dema ku birakujiyê di nava kurdan de dest pê kir, ewî dermanên guhê xwe hemû avêtin û tevî ew êşa ku nedihîst ew bi şev razê, ewî nema guhên xwe derman kirin û di demên dawîn de dema ku li ser ekranên televizyonên cîhanê alaya kurdan dît, tevî ku nema deng diçûyê lê dîsa jî pir şa bû û ji min re digot: Kurê min ji wan re bibêje, wê dijmin hewl bidin wan bera hev din, bila haya wan ji vî tiştî hebe!

Xidir bi dengêkî girî berdewam kir: Na, gelî xortan, bavê min heger mirîbûya jî lê ew miriyê gel û welatê xwe bû.

Dema Xidir gotina xwe bi dawî kir, hêsirên me hemûyan bariyan. Elo berê xwe da tirimbêla xwe, kulilkên me hemûyan dan ser hev û hemû li ser gora wî mirovî rêz kirin. Ew mirovê ku di dilê me de cihekî nû ji xwe re çêkir. Ew mirovê dema dît ku nikare fêdê bike, xerabî û tehde jî nekir û ev qenciya herî mezin bû.

Min di dilê xwe de got: Li min bibore Seydayê Cigerxwîn, ew mirovê ku nikare qenciye bike bila rehma Xwedê lê be tenê dema ku xerabiyê neke!

Em vegeriyan malê û di dilê her yekî ji me de nêrîneke nû li ser cîhanê ava bû. Elo destê xwe avêt nava kasêtên xwe, yek ji wan hilbijart xist teybê û berî ku vêxe hemû kasêtên din di pencerê re avêtin û di nav wan de kasêta Hamo hebû lê Hamo dengê xwe nekir.

Elo got li ser ruhê bavê Xidir bila vê strana zelal a ku xwest wê biparêze, paqij û zelal bimîne. Teyp vekir û dengê wê hilda û bi dengê şahê dengbêjan Şakiro re dilê me hemûyan ji singê me, bi du baskên tenik bi aliyê asîmanekî paqij û zelal ve firiya û firiya.

Vlotho- Almanya
03-01-2006

Çîroka kurdî û çîroknûsekî kurd

Îsmâîl DÎNDAR

Çîrok çi ye gelo? Ji nav bi milyaran mirov, aliyek ji jiyana mirovekî, ne bi seranser, wesleyeke biçûçik, dîmeneke kurt, rewşeke wê kêliyê, ji temenekî sihê. Ew wesle, ew dîmena piçûk û ew rewşa ji rêzê çawa dibe hest, tevî û xeml û diherike dilê mirovên ku ew û kesên di çîrokê de tînin vegotin hev û din nas nakin?

Çîrok rewşeke ji jiyana mirovekî/ê ya ji rêzê be heke, ew tiştê ku wê bi me dide xwendin û nahêle ku em ji bîr bikin an şopeke mayînde di hişê me de dihele, yan ji binhişê me şiyar dike ji xewê û dibe sedama pirsan, bi çi û çawan tê strandin gelo?

Û êdî ku çîroka xwendî, dilgermiyekê çêke bi kesên xwendeyê çîrokê re yan bi guhdarên çîrokê re. Ma ne ji mafê me ye ku em li vir bibêjin, kesê/a ku çîroka Saîd Faîk Abasiyanî a bi navê “Semawer” bixwîne, gelo dikare nebe dilovanê jiyanê û hez ji kesên belengaz neke, alikariya kesên bêçare neke? Kesê ku ruh û tehma çîroka navborî di dilê xwe de hîs kiribe, gelo ew dikare bibe xwediyê nebaşiyekê?

Ji vir ez dixwazim bêm ser çîroka çîroknûsê kurd birêz Mehmet Dicle ya bi navê “Leylan”. Leylan, çîrokeke nivîskêr ji berhema wî ya duyem a bi navê “Nara” ye. Leylan, di nav serpehatiyên jiyanê ku hemû kurd ji nêzik ve dinasin de, diçe û tê. Bi mijara xwe, bi derûniya rewş û bûyerên xwe, ji nivê jiyanê tê, loma tehmeke jiyanî dide xwendevanên xwe. Ma ne çîrok her tim divê wisan ji nav jiyanê biherike dilê me û bi qasî jiyanê be. Her weha, axaftin û diyalogên di çîrokê de jî heta mirov bibêje bes, xwezayî û rastî in. Ku ne wisan bûya jixwe, mirov ew tehma xweş jê wernedigirt.

Heke çîrok şopek di hiş û dilê xwendevanê xwe de nehiştibe û dil germ nekiribe, jixwe mirov nikare qala rewîştê çîrokê jî bike. Bi mijara xwe ya rastî û sirûştî, bi hûnandin û teşeya xwe ya ku rewş û derû-

niya çîrokê mirov dike dil û di nav salan de dibe wî aliyî û wî aliyî. Çîroka Leylan mirov seranser dil digire. Êdî heke tu karibî were û nekeve nav vegotinên herikbar û encama salên dijwar, jiyana ku her tiştê de belawela bûye.

Hêvî, ew hêmana ku dikare mirovê herî lawaz, li ser piyan zindî bihêle, nola leylana di çiqçiqê havînê de, di çoleke bi tîkî tenê û zipî ziwa de dilê mirov hênik bike û bibe hêza meşa di rêya zor û zehmet de, bûye hêmana herî pêş a çîrokê. Ku ligel her tiştî, rastî jî tê de, lehenga me, jinika pîr, Xaltiya Hacerê, bi hêviyekê pihê li ser piyan e.

Zimanê çîrokê, li gorî naverok û tevna çîrokê hatiye hûnandin, weke çemekî naze-nîn di nav deşt û çiyayan de bi aram diherike. Ku em bala xwe bidin van çend ristên li jêrê, em ê vê yekê bi hêsanî bibînin:

“Bêhna axa şil û zelaliya esmanê sibeha destpêka havînê, hesteke ku ew baş dinasî di dilê wê de şîn kirin. Lê ev bi xwe nebû, ev bi tenê bêhna wê bû. Dilşahî.

Her sibeh di hewşê de çend zarokên ku salê yek li wan zêde dibûn bera hev didan, dikenyan, digiryan. Ew bi qestîka bi wan re hêrs dibû, digot:” (leylan- r.9)

“Lê ne li kurê xwe, li jinika bi qasî tava zivistanê zer û bi qasî tava zivistanê sar dinêre. Dike nake di sira ku kurê wê li dû çûye nagihîje.”

Bi rastî jî çîroka birêz Dicle, di çîroka kurmancî de, pênûseke nû û zêrîn e. Çîroknûsê wisan dilovan ku bi ser de jî ciwan û jêhatî bin, ji bo dahatûya wêjeya kurdî dilxweşiyekê pir mezin e. Dicle her weha nola ku di çîroka bi navê “Nara”ya ku navê xwe daye berhemê; çîroka nûjen û çîroka geleri ku ji hêla kedkarên kurdî, dengbêjan ve dihat strandin, bi hezn û teşeyekê nûjen digihîne hev û din. Pênûsa xwe dike pireke ku seranser ji ziman, mejî û dil hatiye pê. Lingekî xwe diavêje dîroka kambax, yekê diavêje dahatûya nediyar a

welatekî û diqîre û hey diqîre...

Her weha Dicle tenê devoka herêma xwe têrî xwe nabîne. Ew ji hemû devokan sûde werdigire û tu kes nikare ji devoka wî derxe bê ew ji ku derê ye û ev yek jî di kurmancî de serkeftinek e.

Bê şik, di çîrokê de, tiştên ku jiyanekê ji rêzê dike çîrok û bi mirovan dide xwendin hûnandina hunerî û ziman bi xwe ye. Di çîrokê de mirov dikare qala du zimanan bike. Yek zimanê çîrokê bi xwe ye ya din zimanê ku çîrok pê tê nivîsandin e. Zimanê çîrokê

jixwe ew şêwe, feraset û pir caran terciha nivîskaran e. Lê zimanê ku çîrok pê tê nivîsîn yek tenê ye. Di her wext û mercî de, nivîskar mecbûr e li gorî rê û rêbazên wî zimanî tevbigere. Qalib, biwêj, gotinên pêşiyên û her weha peyvikan li gorî rêpîvanên wî zimanî hilbijêre û bi kar bîne.

Ji van pencereyan ku em li ser çîroka birêz M. Dicle hûr bibin, ji aliyê teşe, hûnandin û zimanê vegotinê ve, Dicle stêrkeke nû ku di her rewşê de dibiriqe ye. Em li vir ji çîroknûsê xwe re dibêjin qewet be ji te re û serkeftinên mezintir dixwazin û gelek çîrokan jê dipên.

Lê heke em ji hêla pirsgirêkên kurmancî ve li çîrokê binêrin; kêmasiya ku di hemû nivîskarên kurd ên ku bi şîrê tirkî, erebî û yan jî farisî mezin bûne de xwe didin der. A sereke ew e ku hevok bi mantiqa zimanê serdest saz dibe. Dîsa, mijarên rêzimana kurdî; mējeriya navdêran û her weha mijara herî bi nîqaş, mijara tewangê dibin qada nîqaş û pirsgirêkan.

Ku em li ser çend mînakên ku me ji berhema navborî hildane, yek bi yek li ser hûr bibin, bawer dikim ku mijar dê bēhtir zelal bibe.

“Ew jî ketibû ferqa awirên li ser min.” Çîroka “Havîna Evînê” rûpel:41, ku em li hevokê binêrin bi hêsanî xuya ye ku bi

mantiqa “farkina varmak” a tirkî ye.

“Min dia dikirin di hundirê xwe de.” Çîroka “Havîna Evînê” rûpel:55, kurd jî dua dikan lê ne di hundirê xwe de, di dilê xwe de dua dikan.

“Ê me jî karên me li gorî me hene.” Çîroka “Agirê Zuleyxyê” rûpel:70, di vê hevokê de jî rasterast ramana tirkî li kurmancî hatiye wergerandin.

“Yaşo dizanibû ku mêrê wê ew kiriye ferqê.” Çîroka “Şekirê Eydê” rûpel:90, di vê hevokê de jî ramana bi tirkî beloq e.

“Bi kubariyeke zirav” çîroka “Beysûs” rûpel:95, di kurmancî de, her çi qas peyveke erebî be jî peyvika “kubar” heye û cihê xwe girtiye. Lê bi mantiqa “ince zerafet” nabêjin “kubariyeke zirav”. Li vir jî rasterast mantiqa tirkî heye.

“Dewr û dewran qewirandibû.” Çîroka “Beysûs” rûpel:95, li vê derê jî peyvika -lêkera- “qewirandin”ê ne di cihê xwe de hatiye bi kar anîn. Sal derbas dibin, tîr bihurandin,

lê nayên qewirandin.

“Ji pereyên mezin, heta bi listikên qanûnî.” Çîroka “Beysûs” rûpel:96, li vir jî mantiqa bi tirkî ya gotina “büyük para” heye.

“Mirov fikir ji serma re biqefiliya.” Çîroka “Havîna Evînê” rûpel:41, di hevokê de daçek şaş hatiye bikaranîn, diviyabû “re” tunebûya.

“Sala hatî ez ê lîseyê xelas kim.” Çîroka “Havîna Evînê”, rûpel:47, lêkera hatin ne li gorî dema ku vedibêje hatiye bikaranîn. Diviyabû, bibêje “sala bê.”

“Mêrdin ketibû xew.” Çîroka “Havîna Evînê” rûpel:50, divê peyvika “xew” bitewe bibe “xewê.”

“Xaltiya min û pîra min xurînî radixis-



tin.” Çîroka “Havîna Evînê” rûpel:50, heke raxistin be, xurînî nayê raxistin, sifre tê raxistin, xurînî (taştê) tê amadekirin.

“Di odeyên dêrê yên nepenî de dinêriya min.” Çîroka “Havîna Evînê” rûpel:51, diviyabû dawîya hevokê “li min dinihêrî” bûya.

“...derdiketim ser kursiyê û min çav bi mirovan dixist.” Çîroka “Havîna Evînê” rûpel:56, li gorî dîtina min diviyabû bibe “min çav li mirovan dikir”

“Çend lingên din jî çûm.” Çîroka “Havîna Evînê” rûpel:57, peyvika “ling” di tirkî de jî nîn e. Ango nabêjin “birkaç ayak daha git-tim.” Di kurmancî de jî nabêjin çend ling çûm; tê gotin, “çend gavan çûm.”

“Li ser her balîfekê xeweke cuda dihate dîtin.” Çîroka “Agirê Zuleyxayê” rûpel: 69, di vê hevokê de ku pîrsgirêk ne nenivîsandina tîpa “n”yê be, ango jî dêvla “xew-neke”, “xeweke” hatibe nivîsandin; xew nayê dîtin.

Min bi kêf berhema “Nara” ya birêz M. Dicle xwend û ew qas jî ez pê serbilind bûm. Her weha berhema wî ya yekem a bi navê “Asûs” jî ne kêmi vê berhemê bû. Ez berhema “Nara” û nivîskarê wê li çîroka kurdî pîroz dikim.

Dilopek jiyan

Welat DILKEN

*Destên xwe yên qermiçî
Li tabloya rûyê xwe digerland
Wênesazê sibê û êvarê
Bi rengên rengan saz dikir sûretê
jiyanê*

*Her lêdana firçeya westiyayî
Kêliyêk kurt û tamdar
A heyata me dilopand ser valahiya
tabloyî*

*Dilopeke spî: Aştiya nefiriyayî
Dilopeke sor: Evîna neditî
Dilopeke zer: Roja hilnehatî
Dilopeke kesk: Bihara nezayî
Dilopeke şîn: Ezmanê venekirî
Û*

*Dilopeke reş!
Min got, mamoste ev reng
Qedera welatê min tîne bîra min*

*Kêliyêkê bê deng sekinî, serê kesereke
kûr vexist
Kişand, kişand û di nava riyê xwe yê
spî de veşart dûman
Û dilopek rengavî daliqand di quncê
tabloyî de
Û got; kurê min
A dirêjiya emrê we
Wekî qedera vê dilopê ye, wê di
demeke kin de
Bikeve û wekî erdnîgariya welatê we
Wê nivçe bihêle
Hunera min...*

Rewşa kirmancîya (zazakîya) ewroyêne

Mehmud NÊŞITE

Zaza û zazakî

Ez wazena verê, naye vajî, nameyê zawayan tena zaza niyo. Ez kilm vajî: Zazê Çêrmûge, Sêwregî, Aldûş û Motkî xo ra vanê “dimilî” û diyalakta xo ra zî vanê “dimilkî.”

Hetê Çewligî û qezayanê Dîyarbekirî yê ke te de zazayî estê yê zî xo ra vanê “kird” û diyalakta xo ra zî vanê “kirdkî”.

Hetê Dersim, Gimgim û Erzîngan xo ra vanê “kirmanc” û diyalakta xo ra zî vanê “kirmancî”.

Hetê derûdorê Xarpêtî xo ra vanê “zaza” û diyalakta xo ra zî vanê “zazakî”.

Yew rastîyêke esta ganî ma înkare nêkerî. (Kam cî name beno wa bibo wexto ke ma vajê zaza û zazakî hîna asan mesela fehm bena. Ewro raşt çewt miyanê şarî de çekuya “zaza” û “zazakî” ronîşt.)

Dormeyê ma, hetê Çewlig û Licê de, xo ra vanê kird û zîwanê xo ra zî vanê kirdkî. Mi waştênê, no nuştayê xo de zî sey dormeyê xo name bikerdêne û mi şarê xo ra bivatêne kird û qalkerdişê înan ra zî bivatêne kirdkî. Labelê ezê înan ra vajî “kirmanc” û qalkerdişê înan ra zî vajî “kirmancî.”

(Tîya ra 12,13 sere verê cû bi nameyê “Grûba Xebate ya Vateyî” grûbêke dest eşt xebata (kirmancî) zazakî. A grûbe hema zî xebata xo domnena û bi nameyê “Vate” yew kovare vejena. Na grûbe şeş aşman ra reyêk kom bena û çar, panc rojî standartîzasiyonê zazakî û tayê terman ser o vindena. Na grube nê çar nameyan ra nameyê “kirmanc” û “kirmancî” qebul kerda. No semed ra ez zî zaza, dimilî, kird û kirmancan ra vana “kirmanc” û zazakî ra zî vana “kirmancî”. Ezê no nuştayê xo de zî nê her dî nameyan bişuxulnî. Yanî ez zî vana kirmanc û kirmancî.)

Kirmancî (zazê) tena parçeyê vakurê kurdistanî de estê. Parçeyê Îranî, Sûriye û yê Iraqî de çinî yê. Tena Iraq de bi nameyê hewramî yew qalkerdiş esto. Hewram haniyo mintiqê hetê Helepçe yî de. Kurdê hewramî bi hewramkî qalî kenê. Miyanê hewramkî û kirmancî (zazakî) de nêzikbîyayîşêko xurt esto. Labelê ma ewro nêşkenê vajê kokê her diyan yew o.

Mi va, kirmancî (zaza) tena vakurê Kurdistanî de estê. Ewro, goreyê îdareyê Tirkîya kirmancî (zazê) 12 wîlayetê Tirkîya de ciwîyenê. Nê wîlayetî nê yê. Bidlis, Çewlig, Dêrsim, Dîyarbekir, Erzîngan, Erzirom, Mûş, Ruha, Semsûr, Sêrt, Sêwas û Xarpêt. Labelê çîyêk zaf balkêşo ke kirmancî (zaza) zafêr hetê koyanê nê wîlayetan de ciwîyenê.

Şarê nê 12 wîlayetan pêro kirmancî nîyê û bi kirmancî qalî nêkenê. Şarê zereyê wîlayetê (şaristanê) Dêrsim û Çewligî tena kirmancî (zazakî) qalî kenê. Şarê zereyê Dîyarbekirî teqriben nême kirmancî nême zî kurmanckî qalî kenê. Îhtîmalê ke Dîyarbekir de şaro ke kurmanckî qalî bikero zaf bo. Labelê şaristanê bînan de tayê qezayê înan kirmancê û bi kirmancî qalî kenê. Nimûne: şaristanê Semsûrî ra tena şarê qeza Aldûşî (Gergerî) kirmanco û kirmancî qalî keno.

Bê nê şaristananê Kurdistanî de, şaristanê Aksaray, Qeyserî û Gumuşxane yê Tirkîya de zî kirmancî (zaza) estê.

Destpêkerdişê kirmancîya (zazakîya) nuşteki

Kirmancîya nuşteki sey diyalakte bînan yê kurdî hendêke kane (kehen) nîya. Kirmancîya (zazakîya) nuşteki sera 1899 de dest pê kerda. O ke vernî bi na diyalakta kirmancî (zazakî) nuştio Mela Ehmedê Xasî yo. Mela Ehmedê Xasî

1893 de yew mewlid nuşt. No mewlid 1899 çap bîyo. Mela Ehmedê Xasî bi eslê xo Liceyî o. Melatî zî kerdo û di serî zî Licê de muftîyeyî kerdo.

No mewlid esero verên o ke bi kirmanckî (zazakî) nusîyo. Nê eserî ra dima kirmanckîya nuşteki dest pê kerdo. Ey ra dima, reyna yew mela, reyna yew mewlid nuşt. No melayê ma zî Mela Usman Efendiyê Babî o. No mela zî Sêwregî ra yo. O zî Sêwregî de melatî û dima zî muftîye yê Sêwregî kerdo. La nê her dî melayê ma yê erjayî ra dima kirmanckî ya nuşteki, hetanî 1978-79 giran, giran gure yo (aver şîyo).

Nê mewlidan ra dima hema, hema çiyêko zaf balkêş nênusîyo. 1978-79 de kovareka bi nameyê “Tirêj” vejîyena. Na kovare seraser bi kurdî (kurmanckî û zazakî) ya û na kovare de, kirmanckî (zazakî) û kurmanckî tê reyde yenê nusîyayene.

Wexto ke eskeran 12'ê êlule yê sera 1980 de dest nê îdareyê Tirkîya ser o xebata kurdî vinderte. Sey heme xebatê kurdî xebata na kovare zî o tarîx ra dima vindert. Dima çend humarî Swêd de vejîya.

12'ê êlule de zaf welatperwerî zaf zîwanzanî mecbûr mendê û remayê û hetê Awrûpa ra şîy. La ê merdimêke remay û şîyê Awrûpa xebata xo uca de ramitê. Xebata kurmanckî ya nuşteki Awrûpa de senî aver şîye, xebata kirmanckî (zazakî) zî Awrûpa da hêz û hewl da xo û aver şîye.

Nê xebatan ra ê ke bala merdimî ancena, xebata “Grûba Xebate ya Vateyî” ya. Na grube 1996 de bi kombîyayîşê çend kirmancan (zazayan) dest pê kerde. No kombîyayîş de seba vetişê yew kovare qerar ame girewtş. 1997 ra dima goreyê nê qerarî bi nameyê “Vate” yew kovare vejîya. Na kovare hema zî weşanayena û hetanî ewro 33 humare neşr bîya.

Ewro nêzdî 200 heb (teneyî) kitabê kirmanckî (zazakî) neşr bîyê. Hebêk dî hebî kovare kirmanckî (zazakî) weşanayenê. Hebêk dî hebî keyeperê kirmanckî estê.

Yew weşanxaneyê “Vate” Îstanbul de esto. No weşanxane seraser giraniya xo dayo Kirmanckî. Hetanî ewro nêzdî çewres kitabî çap kerdo.

Kirmanckî, hetê edebîyatî de bi taybetî hetê “edebîyato nuşteki” de zî kêmi nîya. Romanî, hikayeyî, dîwanî, ferhengî, gramerî û şîrî nusîyê. Çend kitabê xerîban zî tadîyê kirmanckî.

Rewşa dîyalekta kirmanckî (zazakî) ya ewro û standardîzekerdişê kirmanckî (zazakî)

Bi pêroyî problemê zîwanê ma kurdan estê û nê problemî zaf zî giran ê. Xora problemê mîletê ma (şarê ma) giran o. Kurdî bi çend dîyalekte (lehçe) qisey bena. Sey ke bi zafane zîwanzanî zî vanê çar dîyalektê kurdî estî. Nê çar dîyalektan ra kurmanckî û sorankî hem hetê qiseykerdişê de hem zî hetê nuştîşê de, goreyê dîyalekta kirmanckî (zazakî) û gorankî hê aver de. Yanî nê her dîyalektî xo miyan de warê standartîzasyonî de hîna aver de ya. Kirmanckî (zazakî) goreyê kurmanckî û sorankî heme hetan ra ropey (tepay) menda. Ewro komelê (cemat) kirmancan zafêr qalekerdişê werîbînan ra fehm kenê. Ma vajê yew kirmanco Çolemergîj, Dîyarbekirîj û Dihokîj fekê werîbînan ra fehm kenê. Beno ke qalkerdişê înan de tay ferqê fonetîkî bibê. La werîbînan ra hende dîrî nîyê. Hetê nuşteki de, tay problemî bibî zî reyna heme kirmancî nuştîşê werîbînan eşkenê biwanê û nuştîşê werîban ra eşkenê fehm bikerê.

Labelê kirmancî (zazê) hetê qalkerdişê de zî û hetê nuştîşê de zî sey kirmancan werîbînan ra hende asan fehm nêkenê. Ewro yew kirmanco/a Çewlîgîj û yewê Dersimîj werîbînan ra ya fehm nêkenê ya bi zor fehm kenê. Ya zî kirmancêka/o (zaza) Motkanîj (Mutkî) û yewo/a Paloyîj, pîranîj, Aldûşîj fekê werîbînan ra hende asan fehm nêkenê. Ferqî esta la ferqîya qije esta û ferqîya pile esta. Ez eşkena vaji ke di dewê kirmancan ke hê tê lewe de, miyanê înan de zî ferqî esta.

Ez nêwazena ferqîya beyntarê fekê kirmacan derg û dila binusî. La reyna zî ma gama ke behsa rewşa kirmancî bîkerê ganî ma ferqîya beyntarê mintiqayan zî vajê. Ewro zaf ziwanzanê ma formatê kirmancî kenê di şiqî (qismî). Mintîqa Dersimî û yê teberê Dêrsimî.

Seba ke serê kirmancîya nuşteki hetanî ewro xebatêka cidî nêviraziya ya her mintîqa goreyê xo nameyan name keno. Ez wazena tena yew numune bidî. Ewro 30 nameyê morcela estê. Morcela, miclewri, mijlewri, mijloli, miclor, miclol, mijlor, mijlori, mijlowri, mijmewli, mîyercila, mocla, mojla, muejla, mojle, molcela, molcila, morcila, muercela, muerceli, mercueli, merjueli, morzela, mijlewreki, mijloki, milorçike, mîloçike, muloçike, muleçike. Zaf numuneyê winî estê. Ma her yew merdim “karınca” ya tirkî sey goreyê mintîqa xo name bikerê şarê mintiqayê bînî fehm nêkenê. Na babetê rê yew çare lazim o. No çare zî lazim o ke kirmancî xo mîyande standardîze biba.

Ez wazena bi çend çekuyan (kelîme) ferqa kirmancî û diyalektê binan bîkerî: Samed çi beno wa bibo kirmancî (zazakî) mîyande tay taybetiyanê kurdkî nêxerîpiyo. Ewro ez vana qey tena dîyalekta kirmancî (zazakî) de formê cinsan aseno. Verê cû heme diyalektê kurdkî de no formê cinsî bibiyo. Labelê ewro tena na meseleya cinsî kirmancî de eşkara ya.

Numune: Kurmanckî de çekuya “ker”. Merdim hetanî ke mîyanê cumle de na çekuye nêşuxulno merdim cinsê na çekuye fehm nêkeno.

Gama ma vajê:

“kera cîranê me”. Merdim hema fehm keno ke na here, makî ya.

“kerê cîranê me.” Merdim hema fehm keno ke no her nêrî yo.

“kerên cîranê me” merdim hema zano ke nê herî zafhumarê.

Labelê kirmancî (zazakî) de winî nîya. Heme çekuyî ya makî yê, ya zî nêrî yê, ya zî zaf humarê.

Her: nêrî

Here: makî

Herî: zafhumar

Hetê gramerî de û hetê viraştîşê cumleyan de reyna tayê ferqî estê.

Nimûne:

“ez ji mal têm.” Edat, yanî “ji” vernî nameyî de nusîyo.

“ez keye ra yena”. Edat, yanî “ra” nameyî ra pey nusîyo.

Alfabeya kirmancî (zazakî)

Na babete ser o nuştexê kirmancî (zazayan) pê nêkenê. Mîyanê înan de ferqê zaf muhîmî estê. Tayê te ra alfabe ya tirkî bikar anê. Tayê zî xo gore yew alfabe viraştî û pê nusenê. Tena Gruba Xebate yê Vateyî sey kurmancan alfabe ya Berdirxanîyan gûrenena. Alfabe bîngehê ziwane nuşteki yo. Eke merdim alfabe ser o pê nêkero rastnuştîş ser o qet pê nekeno. Verê ganî merdim alfabe ser o pê bikero dima zî merdim hema qayde û quralanê binan ser o munaqeşe bikero. No samed ra rewşa kirmancîya nuşteki hende zaf rind nîya.

Ewro çar, panc heb gramerê kirmancî hê mi destî de. Nînan ra gramerê Deniz Gundizî û ê Munzur Çemî goreyê qayde û quralê Gruba Xebate yê Vateyî rayirê nuşteki yê Kirmancî roşin kenê. Ê ke nê her dî grameran taqîp kenê nuştîşê werîbinan ra fehm kenê. Nê her dî gramerî zî goreyê kirmancîya mintîqa xo nênusnenê. Goreyê qayde û quralê standardîzeyaya na grube nusenê.

Labelê di, hîrê heb gramerê bînî zî estê. Hebêk ê Fexrî Pamukçu yo. Hebo bîn zî ê Harun Turgutî yo. Nê her dî nuştîşê zî nê her dî grameranê xo goreyê fekê mintiqaya xo nuştê.

Eke merdim tena mintîqa xo bi fikiro û goreyê dewa xo, goreyê qeza û bajarê xo bifikiriyo, kirmancîya mintîqa xo rover bido o wext yew mintîqa, yew mintîqa bîne ra fehm nêkeno. No fehm û feraset zî kirmancîya nuşteki aver nêbeno.

Bi saya grameran ziwani raşt yene nuştîş û wendişî. Gramer şenik yew gure nîyo!

Nîno vatişî


Nesrîn NAVDAR

ez zana,
bi çend rêzikanê helbestêke
pakrewanîye to nîna vatişî!
Delalîye to
û waro ge to bi gune xo aw da!
Nîno vatişî êşê inî ziwanî.
Nalîne çeman nîno vatişî!
Çemê ge bi hesranê dayan ameyê şitişî
û bi germinîye zere to herekênê...
Ma zanê,
heskerdişê to tenê baxçey gulan rê nêbi.
Aw û agirî rê bi heskerdişê to,
kere, herî û daran rê bi,
ko û deştan rê,
erd û ezmanî rê bi heskerdişê to.

Vernîye inî hemine de zî
Mordeman rê...
Bi qaso ge samedê azadiye îne
canê xo bidê!
De ti vace!
Çireyde yeno vatişî heskerdişê to?
bi lerznayîşê zerêke,
bi hesranê di çiman
û bi vatişê di lewan.
Tî zî vînenê ge her şewe
estereyî xo to rê çirisnenê.
Roj to rê bereqnenê xo,
gulî xo to rê xemelnenê
û demeserî diyarîye to kenê
renganê xo.

29/03/2010

Daîmî BÎNGOL



Her qirkerdiş ra dime
Can dano perperik
Dengbêj dest erzeno goşe xo
Verê koya de
Kilama çemê çetelê
Robar ax û zar de
Her veşayîş ra dime
Asmên beno xur û xan
Mordem gijgeleka xo de masî
Zeman saeta qûmî
Helbestvan qûm
Her beynoke ra dime
Çûçike awarî
Bî xem pey ra

10.04.2010

Kenê miriyan

Qado ŞÊRÎN

Ez servekirî û eşkere dibêjim, ez ji ber vê biryara xwe jî şerm nakim, min bi dehên caran gotiye; ez nayê, ez nema tîm şîna miriyan, ez nema dikarim ji wilo bêtir xwe bihetikînim, ez bûme qajik û ketime her devî. Dîsa jî li ku yek bimire yekser telefoni min dîkin da ku bi wan re biçim şîna miriyan. Ji bo ku neçim her carê mehneyekê derdixim, hin caran xwe li mirinê datînim û xwe dixim nav nivînan, hin caran hevîna xwe li ser rojan û li ber deriyê nexweşxaneyê datînim, her carê tiştêkî diafirînim, wek li mal bim jî dibêjim; ez bi hezaran kîlometreyan dûrî malê me, êdî sê rojan divê bersiva telefona malê nedim. Her carê mehneyekê derdixim lê diyar e hemû vala diçin û dost ji fen û fûtên min agahdar bûne û zextê li min dîkin da ku bi wan re biçim û reva min ji ber wan tune.

Ez hunerên ku di şîna miriyan de hatine serê min tînim bîra wan, her carê ez ê bînim bîra wan jî; ma nayê bîra we bê çî di şîna bavê Hesên de hat serê min, sêzdeh sal derbas bûn û hîna jî navbera me xweş nebûye û xweş nabe jî eger wisa berdewam bike.

Berê ez ne wisa bûm, berî ku diçûm şîna miriyan, min jî mehdê xwe tîrş û tahl dîkir, ma ku min wisa nekira min ê çawa diyar bikira ku kes wek min li ber ê/a mirî nakeve. Carekê li ser gora Simkoyê hevalê xwe ji mirovên wî bêtir digiriyam, min li xwe dixist, min xwîn ji xwe anî der, qîrîna min di asîmanê heftan re derdiket, ta ku dê û bavê wî li ber min geriyan, ez bi garmayî hembêz kirim û ez bi xwe re birim mal. A niha îcar li ser miriyan dikenim, kî dibe bila bibe ku diçim şîna miriyan, ken siya xwe digire ser min û min bernade, min dagir dike, ta ku li wir bim dikenim, dev lêvên xwe dikim nakim vala ye, miriyên xwe tînim bîra xwe vala ye, Helebçe û Nagazakî tînim bîra xwe vala ye, her û her dikenim. Gelek caran xwediyên mirî berî

min dane, gelek caran ez dame xatirê bavê min, gelek caran bi xeyd û girî vegeyame malê, hema ku ji şîniyê derdike-tim her tişt vedigere wek berê.

Berî du salan min sondeke giran xwar, belkî bi axa welêt bû, min soza mîrên berê da û dest danî ser simbêlan ku nema biçim şîna miriyan. Kî dimire bila bimire lê ez naçim, kî bixeyide jî bila bixeyide baştir e ez bihetikim. Eger mirovên min mirin, bila ew jî neyên serdana min, yek bi yekê, ser bi ser.

Gelekî kêfxweş dibim dema mirovek dimire û dibe nûçe û bi nûçeyê re xwediyên mirî *e-mail* û telefona xwe ji bo pêşkêşkirina sersaxiyan diweşînin, yekser radibim nameyeke tije hestên xemgîn û germ dînvîsim û rê dikim, bi nivîsandina nameyê re jî dikenim, lê wisa baştir e, kes min nabîne û li pêş sed mîrî min nahetikînin û ji mala xwe naqewitînin.

Du caran dostekî min ji dêvla min ve telefonî malbata miriyan kir, carekê nas kirin ku ne ez im, di wê carê de hevalê min ê ku dengê min û wî qaşo wek hev in du sixêf û tîfek xwaribû, dengê wî hat min jî digot; eger tu ne wek wî bûya te ji ber wî ve telefon venedikir.

Cara dawîn ku çûm şîna miriyan, heftêya borî bû. Diya dostekî miribû (Xwedê wê bi dîlovaniya xwe şa bike), diya wî hîna ciwan bû û ez hatim agahdarkirin ku gelekî li ber diya xwe dikeve, bîst û çar saetan digirî û li xwe dixê, îcar nas û xerîb diçin serdana wî ta ku li ber dilê wî bigirin, min jî dixwest wek her kesî biçim, lê min nikaribû. Dostekî bi xemgînî telefon vekir, kela girî di qirîkê de, got: “Diya Azad miriye divê tu zû bê, da ku em biçin ba wî, kenekî ez girtim û bernedam ta ku hêsiyan di çavên min re avêtin, min telefon danî û nema rakir. Piştî kêlikekê yekî din telefon vekir û gazin kirin; “Yaho kes nema te li şîna miriyan dibîne, her kes pîrsa te dike,

diya Azad miriye, rê jê venagere, gerek tu bê em bi hev re biçin, hîna ez li ser telefona malê bûm, bû girgira ya destan, mijar dîsa mirina diya Azad bû. Min derew kirin nekirin neketin serên wan, reva min nema.

Dema em ketin hindurê malê hîna Azad digiriya, bi rastî dilê min gelekî pê şewitî û kela girî ket qirika min, cara pêşîn bû ku wisa bi min re çêdibû, her yekî ji me bi şeweyê xwe li ber dilê wî dida, min tenê du gotin jê re gotin; “Bê mirin nabe, mirin tune bûya me yê hev bixwara, mirin jiyana veşarî ye. Min zanibû Azad di nava xwe de bersiva min dabû; “Ma gerek bû diya min a niha bimira!

Xemgîniya min gelekî berdewam nekir, min li kê dinihêrî kenê min dihat, ji bo ku kenê xwe bifetisînim min li Azad dinihêrî, wî baş alîkariya min dikir ta ku qerpînî ji ber derî hat, qerpîniya burxeyan li ser ke-

viran. Mêrek derbas bû û te fedî dikir lê binihêre, bi taxim û qirawêt, bi simbêl û berçavk, dema ket hindur û Azad hembêz kir, çavên min çûn ser sola wî, sola fût-bolê ya bi burxe di lingan debû, hîna wî Azad hembêz dikir pîrçînî bi min ket, kenekî ne normal ez girtim û bernedam û her çavên min li ser sola wî bûn, min di nava xwe de digot; “Yaho weleh û bileh hin kes meymûn in û şerm nakin, kî be û li ku be dê bi wan bikene.” Her ku çavên min bi sola wî diketin dengê kenê min jî bilindtir dibû, ta ku du mirov rabûn ser pêyan û ji min re gotin; “Bi rastî tu şerm nakî, eger tu yê ranewestî rabe derkeve, yekî din bi çepilên min girt û ez avêtim derve. Dîsa bi mehdekî tîrş û tahl û bi dilekî xemgîn vegeriyam malê û her min ji xwe re digot; tobe ku careke din biçim şîna miriyan.



Xewna xwedawendî

Evdê Koçer CANO

“Dicle min jî bi xwe re bibe...”

Ji xewneke xwedawendî

Rista toriniya zanyarî

... min jî bibe bi xwe re...

(Bila Promete jî kerem bikira)

Ma ne tişta çavşikandinê dike jî, xwarina cergekî ya qertelî ye?

Ka bêje

Çend helbestên şevê hene

Ji hîvê gilovertir

Çend meqamên wê hene

Ji jînekî kurtir

Pêşwext û nivîskî...

Çend xatirxwestin hebûn

Ji vê zûtir

(ku ji firîna çûka dilê zarokekî re qertel bû)

Ku şev jî nebûna

Te digot qey meriv

Atêrkên xwe timî

Dirijand paxila çûyînekê.

(Bibexşîne du çûyîn. Çûyînek ji bo demê, ya din tenê ji bo çûyînê)

Tu dibînî ne!

Ji xewneke reben û parsekî re

Perîkên hezar çivîkan peritandin!

(Bêmiraziya; “Xwedê mirazê te bike”)

Dîsgotin: pê têr nabin, pê têr nabin.

Çavnebar in.

Nexwe hemû çem bi xatûnekê re

Bi keybanûyekê re direqisin?

(Ev ji qral û mîr û mîrzayên mirazan)

Ev e lîstika tîrêjê? Bêje ev e, lîstika tîrêjê?

Jehr têkevê jehr têkevê

Ji min re çi

Şefeqa min heye; yek

Bi rojê re tê; dudu

Xewneke wê heye; rojê pênc rikû

... Dicle min jî bi xwe re bibe...

Sema

Şivan AR

Şev bû... Rê di nav goristanê de wek şîpek ava tariyê dizivirî. Li xwarê; li dora Mizgefta Eyûbsiltanê şewqeke argonî, roniyeke çilmisî dida ser gorîçeyan. Guliyên darên kajê xwe berdidan erdê. Piştî dengê kuliyên goristanê; di xaçerêya cem Mizgefta Eyûbsultanê de dengê erbanê û neyê tevli selewatan olan dida. Li pêşiya semazenî sê zilam rûniştibûn.

Zilamê yekem, serê xwe bi aliyekî ve tewandibû. Bi çavê xwe yê hûrkirî xwe berdabû newalên dengê neyê.

Zilamê duyem, zilamekî derwêş bû. Bi "ya Elah!.. Ya Elah!.." re serê xwe li her du aliyên xwe dida. Erbane di destê wî de direqisî. Piştî ku semazenî bi usûl xwe tewand, silav da, kirasê wî yê pêçayî hêdî hêdî vebû.

Zilamê sêyem şêxekî rîspî bû. Wî jî dest bi neqşandina qesîdeyê kir:

bizivire!

ji bo navê Xwedê

ji bo aşbûna giyanî;

bidirîne perdeya dilê xwe

stêrkan birijîne ser asîmanên xwe

stêrkan birijîne ser asîmanên xwe.

em ji Xweda distînin

didin murîdan

safitîyê armanc dîkin

sulhê em bang dîkin.

Rê, pêlik bi pêlik bi hewa diket. Riya Pîer Lotî... riya li nav goristanê... Bi avêtina her gavê re; bi gumeguma erbaneyê, zîziya neyê û giraniya gotinan dûrî min diketin. Her tişt siviktir û her fikir zelaltir dibû. Wek şîpeke ava tariyê diherikîn.

Tirbeke ji kevirê mermer, bi hesin hatibû dorpêçkirin. Destê mirî, bi tiliyên hesinî digirt (Ew miriyê zindankirî bû). Li aliyê din, miriyeke jin piştî xwe dabû gorîçeya xwe ya gulrîsandî. Rûyê wê yê spî û bê qermîçok, wek keçeke nûgihayî teze bû. Kemana di destê xwe de spartibû neqeba mil û gerdêndeya xwe. Bi têla di destê xwe yê din de keman dijenand. Deng dernediket! Her tişt di aramiya bédengiyê de sist bûbû. Piştî demeke kurt, deng bi qesîdiya kuliyên re mîna zeraqên tavê bilind bû di nav asoyên guh de. Û dengê şêx û erbaneyê dîsa rûnişt li ser hemû dangan.

Weke kulîlkê bişkivîbû

vebûyî hêdî hêdî

ey kesê bawer û pak!

li xwe berde ahenga newayê

bizivire!

ji bo eşqa afirînerê mezin

ji bo qedîmiya hezkirinê

dizivirim!..

dizivirim...

mîna rojê

xwerû bi êgir.

dizivirim...

dizivirim...

wek heyvê

roniyeke spî û nerm e çepera min.

Di ber qebra Zaro Axa re derbas dibim. Bi şaşika rîşikkirî bala min dikîşîne. Zaro Axayê Bedlîsî; xwediyê emrê 160 salî, çend şahîşah, çend şerên axirzeman ditiye. Piştî xwe bi gorîçeya xwe ve paldaye, cixareya xwe dipêçe.

Pahîzokekê jî di ber re dibêje û li dora bîranînên qemûşkgirtî diçe û tê. Çardeh mezel dûrî wî, dûrî wî, du aşiqan pal dane hevdu, li lempeyên bajarê Stenbolê dinihêrin. Li ber kolosên Mizgefta Eyûb-siltanê, minareyên kubar û dirêj bejn didin li nav menzera bajêr.

'her tişt dizivire
dizivire..
wek cihanê li dora xwe
dizivire
li nav gerdûndeyê..

giyanî bigihîne bi rêka Xwedayî
giyanî bigihîne bi rêka Xwedayî...'

Bêhna axê dikeve pozê min! Di nav zêviyên miriyan de, bi hesteke gêjbuyî gavan diavêjim. Lingên min li qirş û qalan dikeve.

Pistepist ji miriyan derdikeve;
- Ewqas ji ruhstîn(ezraîl) ditirsiyam ku min mirina xwe anî. (hîhî hî)
- Ez jî bûm pakrewanê welatê xwe.
- Wexta jidayîkbûnê ez mirime.
(Dengê girîneke pitikê)

- Hişşt! Ji te re dibêjim, ez keçeke şazdeh salî me li dinyayê, li dora çavên min kilê sibhanî, navê min Hêja ye, bi rastî jî hêjayî lawekî mêrxas bûm. Lê ji bo kerekî min xwe kuşt.

- Yekî bêkes, dûrî germiya mirovan bûm. Li qurçika kolanekê, bilindî asî-man bû ruhê min.

- Pîrejineke heftê û du salî, di nav nivînên xwe de bûm. Gazî min kir mirinê.

- Ez hatim kuştinn!

Xwe ker dikim li ber miriyên ku dipeyivin. Komek kêlên wek şaşik rêz bûne, heçkû dîlana mirinê dikişînin. Li dirahanê, kesekî navê wî 'Lewnî' nexşan çêdike li ser kaxizekî. Nexşên reqas û muzîkjenan. Bi nazenîni û bi coş reqsê dike. Rengên jiyanê wî direngîne. Ba bi zûrîn e û porên min tevdide. Kovik li erdê dixirikin, bê rêgeh bi dareke biyê ve difitilim. Li himberî min mezelekî vekirî, bêhna axê difûrine. Di dilê min de janeke diwar lê dide! Li ser gorîçeyê, navê min heye. Û li ser dinivîse: 'El Fatîhe'. Ez fêhm dikim ku evînê ez kuşt-time.

10.10.2009

Tu ji bo çi nakelimî

Robîn ŞERNA

xemzeya te
îroj tuyên
dilê min velorand
bi çavnebarî

teyr û teba
di hilobiyên xwezayê de...

tu ji bo çi nakelimî
Ji bo çi

di nalîna Xwedayê enirî de
jiyana hersimîn
li min stûxwar...

di kurahiya
kanyonên dilê min
û te de
bi kindira şevê
xeniqandina kalê min
ê rihspî

di hilobiyên bédengiya te de
gijnikên laşê min mebred dibin...

tu ji bo çi nakelimî
ji bo çi

Bilbilekî ziman bi xwîn
Ji hêlîna xemzeya te
qêrîna bédengiyê heyirand
û çûn ew çûn...

Xewnerojkek

Şengul OGUR

Piştâ xwe dabû darê, dar bû
Piyên xwe di nav giya dabû, giya bû
Lêvên wê li kulîlkê dibişirîn, kulîlk lê şîn bû
Porêxwe li ber bê berdabû, ba bû
Nizam ew bihar bû, nizam bihar ew!

Min piştâ xwe da piştâ wê, bûm dar
Piyên xwe di piyên wê da, bûm giya
Min lêvên xwe di lêvên wê dan, çûkan
perwaz da
Porên me tevgeriyan bûn babilisok û bahoz
Nizam hingê bihar bûn
Nizam havîn
Nizam zivistan
Ne payîz bû dizanim

Hingê, darê kulîlk veda
Û strand kulîlka şadiyê
Hingê çûkan li darê hêlîn vedan
Û strîn strana biharê
Me dît giyana giyayan
Em bûn hênikahiya wan

Me dît ku kurmê biharê ne, em
Me dît ku pirpirik in
Li kulîlkan
Li kevirên tî
Me dît ku dilopên baranê ne, em

Me ji bîr kir nav û zanav

Ezman in êdî em, binêre
Çiqas jî şîn in, em
Dibîne? Stêrk in em
Heyv çiqas jî bedew e ne wilo?
Dinya çiqas bêdeng e?

Em razên beriya ku biqede raz
Dar raz in
Giya raz in
Ba raz in
Kulîlk raz
Çûk raz
De em di razekê de raz in

Kêferata helbestdanê

Hekîm EHMED

Ev bû çend car? Ji te re dibêjim
Eger çavên te miqeresiyê bi ewran re
bikin
Xew û şev bi hev re nabin.
Balgîyê dixim bin serê xwe
Serê xwe dixim bin balgîyê
Şiyar dimînim
Û li xewa nivînan guhdar dikim

Helbesteke mê
Bi keçkaniya porê xwe min mest dike
Û di bin mitêlê de
Laşê min î qetiyayî
Bi şûjinine neditî didirû
Mirina xewê pira êşan e di ser wê de
Mazoxên kulperest digihên razîbûnê

Bêhna mêbûna helbestê difûre
Ez ji dilê xwe direvim hundirê serê xwe
Mîna kesên ku zanin ew kî ne
Lê lawirine biçûk û bi lingekî
Di serê min de xwe çim dikin

Hezar carî min ji te re got
Dirêjbûna demê giran e
Û piştâ min ji giraniyê kedî dibe
Diranên xwe disîqînim
Ta hemû dikevin
Sî û şeş ziman di ciyê wan de şîn tîn

Ax Xwedêyo..
Te zimanê lalan ji bo çi çêkiriye?
Û ev helbest eger neyê pîjiqandin
Wê îşev di dawa min de mîz bike

Civak, kultur, biwêj û nivîskar

Medenî FERHO

Feylesofiya gelê kurd navdar e. Dîroka mirovahiyê, bi piranî dîroka Rojhilata Navîn çavdêriya vê yekê kiriye. Dema ku mirov nava girîşa kultura gelên cîran li hev dide û wek diraxeyê radixe ber çavan, ev rastî di aliyê ferhengî, dîrokî, zanistî û berhemdariya pişesaziyî de xuya dike. Pêjna dewsa feylesofiya civaka kurd, ne tenê li dewletên cîranên Kurdistanê, li welatên Ewropayê jî tê guhên mirov. Mîna ku Zecharia Sitshîn dibêje; nûjenî, berhemdarî û keşfên li şaristaniya rojhilat û sê parên cihanê bûne bingeha şaristanî, bawerî û kulturê. Li ser bingeha kultur, şaristanî û nûjeniya berî 6 hezar sal ya li Zagrosan, kelek, silo, firin, cêr û sewîl, halet û gîsîn kelpîç, kils û êtûn, şekûl û tayê rêza diwaran, mîzîna avê, pirtûk, pêñûs, kanûn, hesin, sindan û çakûç, das û qeynax, halet, nîr û misas, tîr û kevan, tevrik, paleyî, kedîkirina pez û hespan, dotina sewalan û çêkirina mast û bidestxistina rûn, teşî û ristin, dolab, tevn, cumik û qumaş, eba û libade, muzîk, civak, diwan, dadgeh, ol û Xweda, xanî, qesr û qonax, xanûman û poste derketine û bûne bingeha şaristaniya sê ribên cihanê.

Mirovahiyê bi saya gelê ku hîna ola Nuh a Xwedayê şev û rojan diparêze, fêr bû ku mirovahî, ji “heriya organîk” hatiye afirandin. Ev navê pêşengiyê ye. Di destpêkê de gotina; “Ronahî pêşketin e. Kesê piştî xwe bide ronahiyê, wê bikeve reşiyê” bi kar aniyê û mirovahî şiyar kiriye.

Pêşengiya ku di dîrokê de bi qasî dem û dewranên dijwar bûye û di heyamên erd-hejê de, tîkçûnên kafûkûnî jiyaye. Van qonaxên tîkçûnê, valahiyên mezin derxistin meydana. Van valahiyên jî hêza xwedîderketina li nîrxan, li berhemdariya nîfşan û girîşkirina kultura bi hezar salan, lewaz kir. Qedîmî û zanist, di ayîngehên ku navbera xwe û ezman bi kilometreyên xelekî dagirtibûn, sir û razên konê şîn fêr bûbû, xwe li ber êrîşên dagirkeriyên bi

dehsalan negirt. Gelê kurd, mîna bikeve kebîs, xwe di nava kiras û xeftanê xwe de pêça. Temirî, lê xaka xwe berneda.

Berneda û wateya gotina k-u-r-d neda jibîrkirin. Kur, Roj, Demjiyan... Ev her sê nav, di çarçoveyê felsefîk, Êzdayî û cografîk de şîrove kir. Nîfşan radestî nîfşan kir. Bi çîrok, efsane, mesele, metelok û biwêjan... Serpêhatiyên ku di nava dem û dewranan de wek çîrokên sumendiya hiş û raman hatin gotin jî, di hêman çarçoveyê de dikarin werin hejmartin.

Bi vê re; wateya gotina kurd, di sê rengan de hate şîrove kirin û bav radestî zarokên xwe kir. Welatê hesin... Axa qafîk... Hêza rojê... Pêşiyê gotin bû, piştî bû tîr û kevan, bû rim û mertal, piştî bû şûr. Lewra navekî ji yê kurd, zarokên rojê, yan ji zarokêna agir e. Ev gotin, di dawîya sedsala bîstan de (piştî Tevgera Azadiya Kurda) belaş nehat gotin. Binyata wê heye. Kawayê Hesinkar, kurê welatê hesin e û destana duyemîn e. Destana agir, hesin û mirov afirand; mirovê jî heriya organîk hat çêkirin, ber bi serdestiya xwezayê ajot. Piştî mirov, ax û hesin bi hev şîrîn kir. Ax meyand, keyand û cêr çêkirin. Kevir li ser hev kirin û xanî derxistin meydana. Piştî hesin... Dema ku Prometheusê kurd agir ji ocaxa Xwedawendan dîzî û anî ser rûyê erdê, gava pêşketinê dest pê kir; qonaxa Kawayê Hesinkar derket meydana. Li her bajarê Kurdistanê, hesinkar û kolanên hesinkaran pîroz in.

Prometheus, kurê agir e û di kûra agir de ax dibe qafîk. Dibe cêr û den û sewîl... Prometheus destana yekemîn e. Roj, navê Şems e. Navê Şeşîms, Şemşo ye... Navê ayîngeha pîroz e û navê mirovên diçine serdana wê jî Şemsî û Şemsa ye. Zarokên Rojê, mîr dibin şemsî, jin dibin şemsa... Piroziyên Yezdanî pak î mehreban û dîlovan in, bi heft bircikan, bi heft “oli”yan, bi heft kêlan tîr naskirin. Destpêka zanista ezmanî, ji vir dest pê dike.

Dergehê pîr-î roj li vir hat vekirin.

Toreya qedîm, di zanista “kozmogonî”yê de heta weke îro parastîye. Bingeha zanista xwe li ser; “Her tişt bi destpêkekê... Her destpêk li ser hebûnekê” da rûniştandin. Ev nasandina kîmyaya bedena cîhanê ye. Di haveynê meyandina kîmyaya bedena cîhanê de, Gtin hebû, Kirin hebû û Firaze hebû. Ji bilî Lebşîrîna Êzda, pirtûkên pîroz û olî tev dibêjin. Êzda got: Êzda, Yezdan, yan jî Xweda bi gotinê dest pê kiriye. Lewra gotin bûye hêza Pêxemberan jî. Lewre di weteya gotina Kurd de, gotin heye. Têkiliya bi ax, av, hewa û germê re heye. Yanî bingeha ola “Xwedanê Şev û rojê” jî bi vî rengî hat avakirin. Navenda hebûnê, navenda binyata bi destîniyê ve girêdayî ye⁰. Destînî, (çarenûsî) bingeha drametîzekirina jiyanê ye. Lê cihê ku mirov hebe, bêguman tevger, qerqesûn, qîr û teşqeleyan. Lewre gotina “mirovê çê, singê xwe dide ber qîr û teşqeleyan”, yan jî “mijûmoran li ser çiyayê bilind kom dibe.”

Roja ku, kevir û heste li hev ket û agir avêt pûşî, çiroka Prometheus dest pê kir. Hingê bingeha destanan hat afirandin. Adem kevirê yekemîn e, Prometheus kevirê duyemîn e, Nuh kevirê sêyemîn e, Kawa kevirê çaremîn e... Ji wê rojê û heta weke îro, kevir li ser kevir tê rêzkirin. Gotin li ser gotinê tê avakirin. Dibêjin; “kultur û zanist, ne keda yek mirovî, ked û xwehdana bi milyon mirovan e.” Kultur girîşkirina nîfşan e. Nîfşan radestî nîfşan kiriye û hatiye berhev kirin. Keda hevreyî, bikaranîna alavan, keda kolektîf derxistîye. Berhema herî giranbuha ya kolektîf jî ZIMAN e. Keda hevreyî, axaftina mirovan; axaftinê jî hişmendiya mirov derxistîye holê.

Destan bûne bingeha dîrokê. Dîrok wek avakirina pêşerojê û wek plankirina paşerojê tê binavkirin. Dîrok bi xwe jî li ser keda mirovan hatiye rûniştandin. Kedê, mirov jî lawîran jî cuda kiriye. Dîrok berhema gelên xwedî destan e.

Gelên ku Biwêj, kirine stûna kultur û zimanê xwe.

Gelê Kurd, yek ji gelê bijarte yê cîhanê

ye ku destan afirandine û bûye pira navbera mirovahiyê. Qonaxeke navendî ya parzemînên cîhanê ye. Di vê dema ku navê Kurdistanê bû Welatê Rojê de, tixûbên cîhanê jî teng bûn. Pêjna dewsa mirovan jî aliyê din ê tixûban hat û li qonaxên piştî tixûban bûn mêvan. Ev demjiyana biçûk-bûna cîhanê û rêbûwariya mirovan, danûstendina mirovan e. Destpêka hêzên dagirker û kêşa karwanên bazirganî ye. Bi çûnûhatin, bi danûstendinê re tevger zêde bû. Yekemîn car, li Mezopotamyayê, di qeraxên Çiyarêzên Zagrosan xan hatin çekirin. Welatê Rojê, bû guzergeha mirovahiyê. Danûstendina cihanî, piranî, di kêşa navendî de pêk hat. Pêşiyê bi milan, bi piştan bû. Piştîre bû ker, devîh û hêstir. Piştîre bûn karwanên bazirganiyê.

Di kêşa navendî ya cîhanê de, di guzergeha navebra kîşweran de feylesofiyê dest pê kir. Ava kimyewî ya mêjiyê mirov bêhtirîn tevdigeriya û hişmendî bi pêş ket. Hejmar, xiş û hesab zêde bû, malxwêr derketin. Gotinên “kotqulêr û qesîs/carîs” derketin holê. Rê vebûbûn, çûnûhatin, danûstendin zêdebûbû. Di rêbûwariyê de, di têkiliyan de, di danûstendinê de, pêdivî bi gotinê hebû û gotin zêde bû. Dema ku gotina “her pêdivî, pêdivîyeke din dixwaze” derxist holê. Pêdivî, bîyî hiş û hewngîriya ku dibe bingeha feylesofiyê çênabe. Di vê dema ku hêdî hêdî feylesofî derdiket holê de, di “kûre”yên hesinkaran de, hesin dihat helandin û şûr bi avê dihatin stewiandin. Di kêrîn pişekaran de jî den û cêr, dîzik û sewîl dihatin cesirkirin. Yanî bi hişmendiye re, şûr jî, qafîk jî derketibû holê. Cenga gotinê û şûr bi hev re destpêkir.

Bi destpêka feylesofiyê re, tixûbên axaftinê, ferhenga gotinan dewlemend bû. Ji aliyekî ve afirgeriya alavan, pêdiviya gotinên nû derdiket. Roja ku nîr hat çekirin û li ser stûyê ga û hêstiran hat danîn, halet li pey wan hat girêdan, derket holê ku bê gîsin cot nabe. Çandinî û paleyî, gêrekin, deraxekirin û dêran bê mirov çênabe. Mirov jî bê gotin nikare van karan bike. Hesin di kûreya hesinkaran de hat helandin û bi çakûçan li ser sindanê hate tewandin. Heriyê di kûreya pişkeran de

rengêkî din stend. Her kar, her alav û her darbeya çakûç li ser sindan û pêtên agirê di kûreyan de, gotinek afirand. Çirûskên agir bûn gotin û bela bûn. Pêtên rimiya ku wek bingeha çirûskan bû, ha ha biwêj afirandin. Tecrûbe û serpêhati zêde dibû. Bi her tecrûbeyê û bi her serpêhaityê re biwêj dihatin afirandin. Gotinê gotin afirand. Biwêjê biwêj, çirokê çirok, serpêhatiyan darbi meselên şîretbêjî. Di encamê de, gotinê destan, piştî çirok afirandin.

Destan bê gotinên helbestî, çirok jî bê biwêjan nedihatîn hûnandin.

Ev demjiyana herî zêrîn a ziman û ferhenga mirovahiyê ye. Ji ber ku, feylesofî bi biwêjan dewlemend bû û wateya tiştan, şîrovekirina tiştan, tenê bi gotinên tazî û yek rûdênî nedihat temamkirin. Gotin jî gotinê hat zêdekirin, ji zêdekirinê rûdênên nû derdikevin holê. Ji bo nezanan ev efsûn bû, ji bo zanayan jî feylesofî bû. Di roja îroyîn de, her du cure mirov hene û hîna jî ew nîqaşa li ser gotin û biwêjan berdewam dike. Lê ne tenê şerê gotin û biwêjan heye. Şerê jiyanê, şerê xakê, şerê hebûnê, şerê nasnameyê, şerê kulturê, şerê nan û mafan, bi yek gotinê, şerê azadiyê bi di-jwarî dewam dike.

Miratzedeyên kultura bingehîn a berî Îsa bi 6 hezar salan; xwediyê navenda kêşa cîhanî û pira navbera mirovahiyê, Kurd, xwediyê sê gotinên pîroz, Erd, Roj, Ezman; xwediyê heft gotinên bingeha jiyanê; Ax, Agir, Mirov, Ked, Gotin, Hesin û Av, îro şerê man û nemanê, bi gotin û şûr dikin.

Balkêş e ku di sedsala bîst û yekê de, ferhenga çek û alavên kuştinê, ji ferhenga feylesofiya zanistê dewlemendtir bûye. Her çiqas, barûd û risas cewherê mirovahiyê dikujin jî, pîroziyên mirovahiyê, kultura ku bingeha xwe li ser biwêjan û hwd. avakiriye tîn parastin. Ehda hebûnê...

Eger ehda hebûnê parastina jiyanê be, bihêjkirina zimanekî jî parastina biwêjan e. Renginkirin û ahengkirina zimanekî, bi parastina biwêjan dikare pêk were.

Ez wek nivîskarekî, di her pirtûka xwe de, di nivîsên xwe de serî li biwêjan didim. Belkî, biwêj xwe derdixin pêş û di nivîsê de pêdiviya xwe destnîşan dikin. Ji ber ku

nirxên civakê, nirxên mirovahiyê, bi gotinên şelûfî, kelê û kal, çilptazî nayên parastin. Pêdivî bi renginkirin, dewlemendkirina hevok û minakan heye. Biwêj ne tenê wateyek e, ji bilî çend wateyan, endirekt û hinekî bi zext rastiye radigihînin. Biwêj, pira navbera çirokbêj û guhdar e. Pira navbera kevn û nû, navbera nû û teknolojiyê ye. Wek mertalê kevn jî kar dikin. Lewra gelek kes, biwêjan wek “ce-wher” bi nav dikin û dibêjin, “li gorî pêdiviyan derketine holê.” Lê di aliyê pêdiviyan de, ez heman ramanê par ve nakim. Li gorî min biwêj, ji kûrahiya feylesofiya hişmendî û hewngîriyê derketine. Çirokbêj, eger ne xwedî hewngîriyeke bi hiş bin, nikarin bibin çirokbêj. Ji bo çirokbêjiyê, ji bo destanbêjan deryaya mêji pêwîst e. Ji dewlemendiya kulturê, ji berhemdariya ziman û hewngîriyê feylesofiya civakî derdikeve holê. Hinekî siyasî, hinekî tevger û tîkiliyên jiyanê, hinekî jî, tevgera civakî û qerqêşûnên desthilatdarî, di afirgeriya biwêjan de rola xwe listiye. Di diwan û koçkan de, di tîkilî û danûstendinê de, gotina direkt, yanî gotina “deqerû’ dikare bibe sedema gelek tevliheviyan. Dikare bibe sedema kuştin û qerqêşûnan. Lewra biwêj û gotina endirekt girîng e. Bingeha diplomasiyê ev binyat û rastî ye. Konetî, diplomatî, şarezatî û zîrekî, bi gotina endirekt û di cihê wê de, dest pê kiriye. Gelek caran, gotinên pirhêlî ku mirov dikaribe di çarçoveya hiqûqî de jî bike perde, bike mertal, bike sedem heye. Yan jî biwêjên aborî... Wek “mal qîrêja destan e”, yan jî, “bike û bibîne”, “tu bike, piştî dora me ye” û hwd. Ev biwêj, endirekt teklîfa berjewendiyan in.

Biwêj, dilxêlênêkê ji mirov re çênakin. Lê hişê mirov tevlihev dikin. Mînak “bila nebe xwîna siyahoş”, mesaja vê biwêjê, “dev ji kîna tohildanê berde” ye. Yan jî “destê xwe jê bişo”, li pey nekudîne, êdî sûdemendiya wî nagihê te.

Mirov dikare bêje ku di civakên feylesof de, bersiva pêdiviyan zû hatiye dîtin. Gelê kurd, yek ji van gelan e û di ferhenga zimanê dayikê de, xezîneyeke biwêjan afirandiye. Ne nû, kevn û li gorî her tiştî, li

gorî her bûyer û pêhatiyê, li gorî her demê. Li gorî her beş û dabaşan, li gorî her cure kar û têkiliyên bi jiyan û mirovan re. “Ziha gur pê ve ye”; ev biwêj, di demjiyana efsûnbazî û starzanî de hatiye gotin. Gelo çend hezar sal temenê wê heye? Ji ber ku di efsûnbaziyê de, Ziha Gur xwedî taybetmendî û roleke sereke ye. Ji bo mirovên bi şans jî, ev biwêj tê gotin. Wek ku, niviştên bi ziha gur hatine pêçan pêre hene û dergehên şans li ber vebûne.

Di cîhana ku teknoloji, beş û cureyên nivîsê kuştine de jî, biwêj rola xwe di ziman de winda nakin. Teknoloji, gelek curenivîs jî holê rakirine. Yek ji van beşên herî têkçûyî name ye. Baş tê zanîn ku name, di literatûra edebiyata cîhanê de xwedî giraniyekê ye û dema tê nivîsandin jî, serlêdana biwêj û gotinên xwedî ziletên taybet derdikevin holê. Ji ber ku di nameyan de, pêdivî bi hinek gotinên cureyî û taybet heye, lewra biwêj xemla hevokan û rengîniya hişmendiya xwediyê nameyê derdixe pêş. Name jî, berhema hişmendî û mesajan e. Lewra gelek caran mesaj endîrektên gotin. Hingê rola biwêjan derdikeve pêş. Teknoloji, ev derfetên afirgeriya biwêjan, an jî bikaranîna biwêjan jî holê rakirîye. Ne name bi tenê, metelok jî kuştine. Mirovahî pîr û kal kiriye. Qure û kubar kiriye. Metelok, wek karê sewtelî, aware û serseriyên tê dîtin.

Metelok, di nav gelek civakên cîhanê de nîn in. Ji bo afirgeriya metelokan, hiş û ramanê pratîk, zîrek, dagirtî û degel lazim e. Gelên ku gihabin radeya feylesofiyê metelok afirandine.

Metelok, bi hiş û ramanê pîr pêşketî, xwedî taybetmendî û dewlemendiya mezin a ferhengê dikarin werin afirandin.

Di cih de û li gorî mirovê li hember gotinên bi pîvan û wezin û helbestî lazim in. Ji ber ku metelok, hinekî helbest e, mîzah e, sîx, tujik û tamsarî ye. Her kes nikare metelokan bibêje.

Di cih de û li gorî gotina mirovê li hember û di wê kêlikê de, tê afirandin û

gotin. Hewnekî pratîkî, ezberêke zêde gotin, biwêj û hostatiyeke hûnandina di çarçoveya pîvanî de tînin gotin. Hûnandina “tevna gotinê” li ser piyan û di heman demê de, ne hêsan e.

Teknoloji, mirov di nava diranê çerxa xwe de pîr û kal, kubar, qure, pûç û sivik kir. Hêvî ew bû ku teknoloji bandorê li ziman û kulturê neke, lê ev jî nabe. Ji ber ku di cîhanê de û jiyanê de her tişt têkildarî hev e.

Ji bilî name û metelokan gelek cure nivîsên din jî, bi ber dasa teknolojiyê ketine û tîk çûne, yan jî li ber tîkçûnê ne. Eger nivîskar û lehengên ziman û kulturê zîrek nebin û tîkçûnê li hemberî dem û dewranan nedin, li gorî pêdiviyên bersivê nedin, teknoloji ziman lawaz dike, teng dike, di nava gotinên teknîkî de difetisîne.

Dema ku biwêja “zan zanê, nezan baqê nîska ye” hat dikirandin; mirov, şî-nayî, hişmendî, hewngîrî, pîvan, mijula hiya mêjî, tîgîhîştin, birewerî, dûrnêrîne tîne bîra xwe.

Ev tev, ji bo berxwedana li hemberî teknoloji û parastina ziman û biwêjan, ji bo parastina destan û folklorê lazim in. Guman dikim ku pêdiviya vî “lazim-bûnê” bi şîrovekirinê nîn e. Yan jî, “di guhê ga de diji”, mirov feylesofiya, demjiyanên berî 6 hezar salan nebîne, gelo gotineke din jî vî biwêjê watedartir wê hebe? Yan jî, “Şam dîr e, ma mişar jî dîr e” xelesa ku valahiya navbera nîşan, valahiya navbera dem û dewranên tîr qerqesûn û xelesa navbera nîrx û tekonojîyê destnîşan dike.

Erê di demjiyana tekonojîyê de, Şam nêzik bûye, lê mişar jî jî holê rabûye. Hîna biwêj, an jî pêşgotina “Şam ne dîr e, lê balafir nîn e” derneketiye û nebûye xwedî wateyeke ku mirov li ser birame û şîrove bike.

Di vî çarçoveyê de, ez dikarim bibêjim ku, gelê kurd, di nava lêgerînekê de ye û dixwaze feylesofê xwe bibîne. Ev feylesof wê bibe mamostayê ziman û parastina nîrxan. Yek ji van nîrxan jî biwêj in.

Şahid kî ye?

Xwendineke dîtir li ser dîtin û dîktatoriyê

Bextiyar ELÎ

Şahid ew kes e ku ji serî ve tawanan dibîne. Tiştê ku şahid ji kesekî asayî cuda dike, ew e ku şahid di gava rûdana guneh û tawanan de li wê derê ye; pêşî bédeng e û çu tiştî nabêje, temaşe dike û dest nabe ku qurbanîyan rizgar bike. Lewma şahid, an sebebê qurban e, an neçar e ji ber cebreke derekî bédeng bimîne an jî di ber celad û gunehbar de ye û di gava rûdana guneh de tiştan bi çavekî dîtir dibîne. Rewşa şahidiyê, bê endaze zehmet e. Şahidê rasteqîn ew kes e ku heqîqeta serhatiyekê pê re ye, wate, beşeke girîng a rûdanê dizane, dikare girêya karesatê veçirîne, sir û nihênîyên mirinê derbîne û rastiyeke jibîrkirî an nehatî têgihiştin an jî hatî xefkirin raxe ber çavan. Li vir, dema behsa şahid dikim, behsa wî kesê asayî nakim ku li ser kêşeyeke asayî diçe dadgehê û li ser meseleyeke sade qise dike; belkî behsa wî bûnewerî dikim ku şehadetê li ser karesatên jibîrbûyî û çepraguhastiyên (çephênraw) di nav mêjûyê de dide û hewl dide rastiyeke jibîrkirî ya mêjûyî û tawaneke neselmandî bîne bîra me. Maneyek ji maneyan, hikayeteke mêjûyî pê re ye û binerekî mêjûyî ye ku di kuncikeke diyarkirî re rûdaneke mezin a mêjûyî ditiye. Şahid, kesek e ku heta dereceyeke bilind “firîşteya mêjûyê” ye ku Walter Benjamin tîne bîra me. **(1)** Bi baweriya Benjamin, erka vê firîşteya mêjûyê ye ku beşên mirî û çepraguhastî û feramoşkirî yên li nav mêjûyê rizgar bike. Walter Benjamin di nivîsareke taybet a li ser mêjûyê



de wêneyê firîşteyekê dikêşe ku bi ser dêrisa mêjûyê de difire û wêran e û karesatan bi du çavên pir sersamî (meraqqdar) dibîne; lê belê, bayekî bêxêr wê difirîne û nikare çu tiştî ji nav wê xerabatê hilgire û rizgar bike. Walter Benjamin îlhama vî wêneyî ji tabloyeke Paul Klee werdigire; îro, dema em behsa rabirdûyê dikin, ev wêne bûye yek ji wan wêneyên girîng ên teheyyula me. Firîşteyeke ku bi ser dêrisê re difire û sersamane seyr dike û nikare çu tiştî rizgar bike. Ev firîşteya ku di edebiyata nivîskî de wek “angelus novus” naskirî

ye, niha, remzeke girîng e di nav lîteratûra felsefeya mêjûyê de. Ez wisa dibînim ku şahid, heta dereceyeke bilind, rengê vê firîşteya mêjûyî dide; firîşteya ku vegeriyaye, ku li dijî bayê jibîrçûnê şer dike û divê bi roleke rizgarker rabe. Çêdibe em bi awayekî bibêjin ku şahid rola mêjûyê dibîne di gava rawestan û bibîranînê de. Walter Benjamin ji mêjûyê dixwest ku raweste, çavê

xwe li rastiyan nemiqîne û guh

bidêre hawarên rabirdûyê. Lê belê, cudatiya di navbera şahid û firîşteya Walter Benjamin de ew e ku şahid mêjûyekê qiset dike ku bi xwe tê de jiyaye, ditiye; heçî firîşteya Walter Benjamin e, ew bi ser xwelî û xubarê de hatiye; wate, piştî rûdanan dihê û dixwaze tiştêkî rizgar bike. Ew xubar û wêraniya ku firîşte dibîne, xweliya rabirdûyê ye; xweliya wan dem û domanên ku rabuhurîne. Lê belê, şahid bi xwe di nav agirî de bûye, şahid bi xwe mêjû ye bi zindî; wate, ne temaşevanek e ku ji derve li

texteyê şanoyê seyr bike yan wêneyê texteyê şanoyê bikêşe; belkî aktorek e ku ji nav nimayîşê hatiye derve, nîgar an figûrekî tabloyê ye ku ji tabloyê hatiye der; ji ser ve lê neniherîye belkî di nava wê de jiyaye. Şahid di kuncikekî wisa taybet de li tiştan dinihêre ku kesên din nikarin ligel wî hevniğah/hevnêrîn bin. Ew mîna firîştaya Walter Benjamin di ser re li xwarê seyr nake, yan jî li lorê behsa xwarê nake; lê bi pêçewane, di xwarê re behsa xwarê dike. Ew di ser mêjûyê re nafire, belkî di nav de difire û di nav de radiweste; ew mehkûm e ku di nav de niştetih bibe. Yanî şahid bar û cebreke wisa dixê ser milê xwe ku mêjûnûs, edîb û filozof jî kêmtir dixine ser milê xwe; ew jî dîtina heqîqetê ye. Ji ber ku di rastiye de ew wisa qise dike ku ji hemûyan bêtir nêzikî heqîqetê ye. Ew li mêjûyê seyr nake, belkî di cihekî de dîl dibe; wate, li ser wan hûrdekariyan radiweste ku çu kesekî din lê nêzik nebûye. Bi maneyeke deqîqtir, şahid ne ew firîşte ye ku li xweliya mêjûyê dinihêre da ku tiştêkî jê rizgar bike, bi pêçewane, xwelî bi xwe ye ku dihe ziman. Lê belê ev “hatina ziman” û “ketina nav qisekirinê” heta çu dereceyê dikare rastiye nîşanî me bide? Ev, yek ji pirsyarên mezin e. Gelo şahid di serdema dîktatorî û hal û mercên felaketê de heta ku derê dikare rastiyan bibîne? Sînorê dîtîne heta ku derê diçe? Gelo kesekî ku ji nav karesatê ve behsa karesatê dike, dikare ji wî kesî baştir bibîne û bibêje yê ku ji derveyî karesatê ve li ser karesatê diaxive; yan bi temamî berevajî?

Cudatiyek heye di zimanê latînî de ku filozof George Agamben bi kar tîne û girîngiyeke wê ya mezin heye bo dabaşa me; cudatiya di navbera “testîs” û “superstes” de. Testîs ji kesekî re tê gotin ku bi xwe rasterast di nav meseleyê de nîn e, belkî kesê sêyem e di nav du bereyên din de; bînerek e û tiştêkî ji me re qiset dike ku di navbera du kes an jî du layenên din de qewimiye; rastiyeke rizgar dike ku rasterast têkildarî wî bi xwe nîn e, belkî şahidê haletekê ye ku kesekî dîtir tê de jiyaye û kar û kiryarên xelkê ne. Lê belê superstes, berevajî wê, şhadetê li ser tiştêkî dide ku bi

xwe tê de jiyaye, bi xwe bereyeke girîng a meseleyê ye; di nav rûdanê de bûye û têkiliyeke wî ya rasterast heye bi qewimîn û serhatiyan re. Cudatiya di navbera şahid û firîştaya Walter Benjamin de, ta endazeyekê wekî cudatiya di navbera testîs û superstesa George Agamben de ye. Firîştaya Walter Benjamin, ji derveyî mêjûyê ve wekî rizgarkerekê derdikeve; piştî daxistina dosyeyan wekî hêzeke bibîrhên kar dike û dîsa dosyayan vedike. Herçi şahid e, bi maneya superstes, dema ezmûneke li pêş xwe bang dike, jiyana xwe kat dike, ne wek ku li ser qewimînekê hukm bide. Ev cudatî, di cewher de wekî wê cudatiyê ye, ya di navbera şahidekî ku temamê heqîqetê dibîne û şahidekî din ku bi tenê nivê heqîqetê dibîne. Lê belê, kêşe ji wê hindê kûrtir e ku mirov serê pêşîn hest pê dike. Agamben, di kitêba xwe ya girîng de, “Çi Ji Auschwitzê Dimîne; Erşiv û Şahid”, guman li şiyana wan ên di nav rûdanê de dijîn dike ku ew jî nikarin heqîqetê bi temamî zêft bikin.⁽²⁾ Wate, ne tenê firîştaya Walter Benjamin “Angelos novus” e ku nikare “heqîqet” an jî “tarîtiyên di nav heqîqetê de” rizgar bike; her wiha, “superstes; şahidên di nav rûdanan de” ku di nav karesatê de jiyane, bi tenê beşeke ezmûnê dîtine ji nikarin. Ya ku di literatûra siyasî û felsefî ya hevçerx de kêşe saz kir, girifteke e ku wekî “girifta musulman” (Muselmann)⁽³⁾ dihate naskirin. Ev, cûremirov bûn ku di zindan û kodilgeyên (*kampên dîlan*) Naziyetê de, di ber mirinê de dijiyan û bi tenê dilopeke ruh di gewriya wan de mabû. Li bal Agamben, kêşeya “musulman”⁽⁴⁾ argumaneke girîng e ji bo pêwîstiya “etikeke nû.” Lêre, ez jî li ser heman rêkê diçim û dixwazim li ser estemî (*mumkunat*) û zehmetiya jidayikbûna şahid û egerên bûn û nebûna wî, di nav sistemeke dîktatoriyê de qise bikim û tevahiya teze di ruwangeyeke din re bixwînim. Min dîl lê ye bi vî rengî lêkdaneke dirêjtir li ser teza bîngehî ya filozof George Agamben bikim.

Di dema cihûqirana nazîyan de li ordûgehên Naziyetê, dabeşkirineke navekî hebû di nav zindaniyan de ku ev xaleke pir girîng e bo têgihiştina “etika şahidî.” Nivîs-

karê naskirî Jorge Semprun ku bi xwe mayewekê di wê zindanê de jiyaye û yek ji romanên herî ciwan ên der barê “ordûgeh”ên naziyan de bi navê “Çi Yekşemeke Ciwan e” nivîsiye, rewşa di nav ordûgehan de bi hûrgilî wesf dike. Di nav ordûgehan de dabeşkirineke hûr a li ser esasê çinan hebû. Ji bilî dabeşbûna asayî ya di navbera “zindani” û “pasewan”an (*zêrevan/nobedar*) de, dabeşkirineke kûr a navekî di nav zindaniyan de hebûye. Li serekê, zindaniyên aristokrat hebûne û ew komeke taybet ên nav zindanê bûne û rewşa wan gelek ji yên ditir baştir bûye; pirtir xwarin wergirtine, nêzikî pasewanan bûne û ji wan re sîxurî kirine û hindê caran bo wan di nav zindanê de xelk ji kuştine; cihê wan ê taybet hebûye; ji hemûyan girîngtir, ji bo xwepakkirin û şûştinê sabûn wergirtine ku xêra vê yekê di man û nexweşneketina wan de gelek mezin bûye. Berdewam di hewla wê hindê de bûn ku cihê xwe biparêzin û di tirsê wê hindê de ji bûn ku nêzikatiya xwe ya ligel Naziyan ji dest bidin û bikevin xwarê, nav çinên nizm. Çîneke ji wan nizmtir bi navê “Plebs” dihat naskirin; ew, mezintirîn grûba ordûgehê bûn û bi tenê nan û şorbe werdigirtin. Zindaniyên asayî bûn û têkiliya wan ligel naziyan pir lawaz bû. Lê belê di biniya wan de jî koma “Musulman”an bûye ku komeke jihevketî bûye. Endamên vê komê req û hişk dibin û bi tenê hestiyên wan dimînin. Ew ji bo manê şer nakin û bi tenê komeke hestiyên in û li benda mirinê ne. Bi gotina zindaniyên din, ew wek bireke ajalên bêruh bûn û wekî ku Semprun dibêje di rewşa “nîvmirî de ra-



westane”. Wan ne ji bo naziyan kar kiriye û ne jî ji bo manê hewlek daye. Komeke pasîf bûne ku berebere hişk bûne û ji bîrs û bêbizaviyê mirine. Tiştê herî mezin di meseleya musulmanan de, hewlnedana bo manê bûye; piraniya şahidên ku çîrokên ordûgehên naziyan neql kirine, bi şêwazeke xerab behsa musulmanan dikin, wek hêmaya mirin û teslimiyetê, wek mirovekî ku bûye nemirov û jiyan û mirovbûna xwe hîç neparastiye. Semprun bi xerabî behsa musulmanan nake, lê belê dibêje ku “modêla musulmanan, di asoya îdeolojiya xwe de wextekî kûr a nedilniyayiyê tîne... Ligel

wê, êdî nema xebat dike bo man û jiyanê û şîyan û taqeta ruhê bergîriyê pê re nîn e.”(5) Agamben, di ser rêya modêla “musulman” re, kêşeyeke kûr dixê nav meseleyên “şehadet”, “sînore şehadetê” û “rast û duristiya şahidî”yê. Bi ya Agamben, musulman, “formeke jiyanê, cihê lengereke exlaqê ye û ji wî cihî dest pê dike ku li wir keramet temam dibe.”(6) Li bal Agamben, musulman, modêleke modern a “jiyana rût”(7) e; jiyanek e ku rehendên xwe yên siyasî bi temamî vekirine û bûye qewareyeke

bêmaf û bêirade; ku bi ya Agamben, yek ji derkeftên (*netîce, encam*) serekî yên tevahiya prosesên modern e û yek ji mebestên esasî yên prosesê ye. Lê belê Agamben, vedigere ser nimûneya Promo Leviyê yek ji şahidên serekî yên ordûgehên naziyan û îdia dike ku hemû şahidîdanên li ser jiyanê nav ordûgehê, netewaw û nivîşkan in. Ji ber ku bi tenê yên ku di ordûgehê de mirine tevahiya karesatê tecrûbe kirine. Bi tenê ji bo musulmanan şahidî çêdibû, lê belê musulman mirin û mirina wan, gelek beriya mirina wan a biyolojîk, her di nav

jiyanê de dest pê kir. Ji wê jî girîngtir, musulman, bi raya şahidên dîtir ji mirovbûnê derketin û bûn nemirov. Bi raya Agamben, bi tenê ew kes dikare bibe şahid yê ku tewawê prosesê heta dawiyê ditibe, ezmûn û serhatî gihandibe dawiyê; ji ber ku cewherê wê serhatiyê ne di wê de ye, mirov bi tenê wesfê ordûgehan bide û dabaşa tiştên dîtî bike; lê bêtir ew e ku di wê xetê re derbas bibe ku mirov ji nemirovî û jiyanê, ji mirinê cuda dike.

Bi gotineke dîtir, rastî, bi xêra wan şahidên ku di nav karesatê de jiyanê jî bi dest me ve nahê. Wate, mesele her ew nîn e, wek Walter Benjamin dibêje, firîşteya mêmîjûyê bi xêra bayekî bexêr, ku bayê geşedan û peresendinê ye, nikare ji nav xwelî û xubar û dêrisên mêmîjûyê de heqîqetê derbîne, rizgar bike û biparêze; belkî ew e jî ku kesên nav karesatê di nav şert û mercên wisa de ne ku, delîveya dîtina temamê dîmenê jî bo çu kesî nebe. Heke mesele meseleya rizgarkirina bîreweriyê be, wekî li bal Walter Benjamin dibînin, an geriyanê li dû şhadeta tewaw be, wek li bal George Agamben, em hest pê dikin ku her du jî du rêkên girtî ne; di her duyan de bîner nikare hemû tiştan rizgar bike. Di vê teza biçûk de, min divê, ji bo lêkdana ezmûna me ya ligel dîktatoriyê, li rojhelat her wê tezê wergerim û di têgihiştina sebebên de ruwangeyeke kûrtir vekim; bi van bîr û boçûnan ku dîktatoriya rojhelatî sistemek e ku tê de jidayikbûna şahidî her di binî re zehmet e. Ji ber vê hindê, di mêmîjûya me de “şahidîdan” û “felsefeya şahidîyê” û maneya wê li rojhilatê, di nav tevahiya sistemê de winda ye. Heke kêşeya Agamben, nebûna şahidiya tewaw be li ser Auschwitzê, kêşeya me, jidayiknebûna şahidî ye wekî bînerê mêmîjûyî û nebûna şhadetê ye, wekî kêşeyeke hizrî û exlaqî. Şhadet li rojhelatê hebûbe jî, karê wê bi tenê mirovên mezin ên di nav mêmîjû û sistemê de bûye; lê belê, xubar û xweliya mêmîjûyê, an ku wê dêrisa ku firîşteya Walter Benjamin di ser re difiriya, hêşta jî qisekerê xwe peyda nekiriye.

Rojhelat herêmeke amade nîn e ku rabirdûya xwe dadgeh bike. Dadgehkirinên

mezin di mêmîjûya devera me de kêş in.

Dadgehkirina serokên rejîma Îraqa kevn a van heyamên dawî, take nimûneyek e. Li vir min navê li ser tebîetê şahidî yê di dadgehkirinan de qise bikim; bêtir min divê li ser ontolojiya şahidî wekî bûnewerekî girîft rawestim. Nebûna şahidî, di rastiye de nebûna hişyariya tewawî ye li ber rabirdûyê; nebûna hişyariyê li ber karesatan jî dihê maneya dubarebûna wan. Li vir, dubarebûna dîktatoriyê têkiliyeke xurt heye ligel nebûna şahidiya rasteqîne li ser dîktatoriyê. Şahid bi xwe qurbanî ye û hindek caran jî gunehbar e û çiroka xwe qiset dike; lê belê divê li rûyê nîrxê wucûdî ve, şahidî jî qurbanî û gunehbarî cuda bikin. Hikayeta qurbanî û tawankarî, her gav di cihetên teknîk û naverokî ve cihê gumanê ye. Du hikayet in bi du berên dij; her yek xizmetê li mentiqeke diyarkirî dike. Her du jî rûdanê ne bi awayekî terefgîr dibêjin. Çirokên wan pir in bi viyanên taybetî û daxwazên takekesî. Her gav du çirokên cuda ne, yan jî, destê kêş, li ser xaleke pir girîng jî hev cuda dibin û di hev nagihên. Şahid jî wisa derdikeve ku “çiroka rasteqîne” pê re ye. Wate, wekî bêlayanekî derdikeve ku ji heqîqetê pê ve çu tiştî nabêje; heta ku wek tawanbar an qurbanî şhadetê dide, di pişt vî wêneyî re kar dike ku bêlayan e û dixwaze rastiye bibêje. Lê belê, ev fermana exlaqî ya şahidî, wekî kesekî ku barê gotina rastiye li ser milan e, her gav dikeve ber gelek berbestan. Pêşiyê, şahid bi xwe cihê gumanê ye ji ber ku berdewam jî aliyekî ve wekî têkderê (*şewîner*) rastiye dihê binavkirin, her dem bereyek ji bereyan lê dixebite ku gumanê jî qiseyên wî bike. Lê belê ji bilî vê gumanê, şahid bi xwe jî wekî qisekerê derengwest derdikeve. Di hemû şahidîdanên de qonaxeke bédengî û dudiliyê heye. Kêş caran diqewime ku şahid di nav weswese û dudiliyeke kûr a “gotin” û “negotin”ê re derbas nebe. Mirov dikare navê vê babetê deyne “dudiliya wijdanî”; di vê babetê de şahid biryara qisekirinê dide lê belê şert nîn e ku biryara “gotina heqîqetê” jî dabe. Diyar e em nikarin şahid û dudiliyên wî têbigihên bêyî ku wê dinyayê têbigihên a ku şahid tê de dijî.



Axaftina şahidî bi tenê berhema dudiliya xwe nîn e, belkî berhema tirseke derekî ya mezin e jî. Şahidî bi tenê meseleya wijdanî nîn e, belkî meseleya peywendiya mirovî ye bi hemû cihana derveyî xwe re. Helwêst-wergirtineke kûr e di hemû jîngeha xwe ya siyasî û exlaqî de. Bi rêka gotin an jî negotina heqîqetê, mirov helwêstekê li ber temamê jiyane werdigire. Şahidî, di cewher de, guhestina mirov e ji rewşa bînerêkî pasîf û neçalak, ji bo rewşa bînerêkî aktîf; an jî rastir e em bibêjin, şahid kesek e ku biryar dide ku êdî bîner nebe, êdî kesek nebe li nav sînorên “dîtin”ê de bimîne û vediguhêze bo rewşa “qisekirin”ê; wate ji ‘bîner’ dibe yekî ku dîmenekî dixuliqîne. Êdî, bi vî awayî, ji rola temaşevanekî vedi-guheze bo rola kesekî ku baz dide ser şanoyê û dibe aktor. Wê bazdanê bi xwe, pêdivî bi zemînekî mêjûyî ya mezin heye ku li bal me li rojhelat nîn e.

Rojgara diktatoriyê serdemek e ku şahid tê de durist nabe; çinku şahid, di cewher de, her ew e ku mirov bikare ji bînerbûnê derkeve û bibe qiseker. Herçi diktatorî ye, berevajî wê, sistema guherîna mirovî ye ji qisekeriyê bo bîneriyê, ji şahidiyê bo kesekî

bê ziman. Şahid di serdema diktatoriyê de bi tenê dikare şahidiyê li ser kêşeyên ferdî bide, ew kêşeyên ku maneyeke wan a siyasî, civakî û mêjûyî nîn e, yan jî şehadetê li ser birayên xwe yên mirov bide. Bi gotineke din, di serdema diktatoriyê de, têkiliya di navbera şahid û heqîqetê de heta radeyeke berbiçav qut dibe; bi tenê şehadeta qurbanî li ser qurbanî dihê bihistin, ne ku şehadeta qurbanî li ser celadî. Bi vî awayî şehadet, ji maneya xwe ya girîng û binirx dibe. Şahid, di halekê wiha de, hind dibe beşeke sistemê ku êdî nêzikiyeke wisa nahêle di navbera xwe û rastiyê de. Gava bazdide ser şanoyê, ne ji bo wê hindê ye ku wan qiseyan bike ku berê di weswese û wijdan û dudiliya derûnî re derbas bûne, lê ji bo wê ye ku tiştinan bêje ku berê hatine nivîsandin, deqeke ku çi rasterast çi ne rasterast ji berê ve amadekirî ye. Li Îraqa Sedam Huseyîn û li dadgehên şoreşê, diyardeya herî serekî û berbiçav a wan dadgehan ew bû ku piraniya caran dadgehan pêdivî bi şahid nebû, bireke zor a dadgehên şoreşê, dadgehên bê şahid bûn. Ji ber ku, di bingehe de, şahidê herî mezin li ser mirovan sistem bi xwe bû. Di diktatoriyê

de mirov her tim an gunehbar e an jî sebebê gunehbariyê ye; wate, di nêrîna sîstemê de her yek ji me yan tawanbar bû û tawanek kiribû, yan jî, ihtimal û potansiyela tawanbariyê ligel hebû. Ya girîng ne ew bû şahidek li ser wê tawanê hebûya, lê ew bû ku desthelatîyê bikaribûya ew tawan li kûrî û pinhaniya me de aşkera bikira. Di sîstema Be'sî de, mezintirîn şahid li ser mirov, mirov bi xwe bû, tawan bi tenê hingî dihate selmandin ku mirovî bi xwe qebûl nedikir. Heke mirov bi xwe nebûba şahid li ser gunehê xwe, çu şahidekî dîtir nedikarî wî wek tawanbar biselimîne. Be's hêza xwe di wê de didît ku mirov bi xwe bike şahidê guneha xwe. Berawurdekî (*danberhev*) biçûk di navbera sîstemên Kafkayî û Be'sî de li ser guneh, vê rastiye derdixe ku sîstema Kafkayî heta radeyekê sîstemeke pir bi rehmtir e, lewre di wê de mirov dizane ku gunehbar e lê nizane bê guneha wî çî ye. Lê belê, hêj geriyana mirov li dû gunehê xwe û geştê bo pakbûnê kuta nebûne; tê heye ku mirov negihe encamê û cara dawîn jî qedera wî bi mirinê kuta bibe, wekî ku di romana Doz a Kafkayî de dibînin; digel vê yekê, hêj jî fezayek heye ku mirov ji bo pakbûnê tê de digere. Lê di sîstema Be's de mirov bi xwe gunehbar e û divê bi xwe jî wê gunehê biselimîne. Yanî divê ew bi xwe gunehê xwe peyda bike, li xwe bike û bi ser de jî, jê re bibe şahid û gelek caran sebeb nebû ku bi wî awayî hereket bike. Bêqîmetiya cihê şahidî di dîktatoriyê de ji wê hindê dihê ku sebebê bêgunehiyê di mirovî de pak dike; di dîktatoriyê de lêborîn heye, ne bêgunehî. Qebûl û pesendkirineke bi zorê heye, ne şehadet. Di desthelatîya Be'sî de, her mirov ji xwe berpîrs e ku kiryara tawanbarê nav xwe aşkera bike. Sebebê derhatina rewşên bi vî awayî ew e ku ji ruwangêya piraniya sîstemên totalîter ve, guneh tiştêkî navekî ye, kiryarek nîn e ku bihê dîtî, an jî şert nîn e bihê dîtî, şert nîn e kesek te di gava encamdana tawanekê de bibîne da ku bibî tawanbar; lê ya girîng ew e ku gunehêkî navekî di te de heye û bi çavê asayî nahê dîtî. Li vir, sîstemê bawerî bi çavê sade yê mirovan nîn e ku wê tawanê jê re derxe;

tenya çavê ku bawerî pê dike çavê xwe ye, çavê berpîrsên îşkenceyê û raportên wan in. Di sîstema Be's de, şahid, bi asanî ji hesab û muhaweleyan dihê derxistin, ji ber ku ne dikare bibe bîner û ne jî qiseker.

Piştî rûxîna rejîma Be's, gorankariyeke aşkera bi ser hev kêşeyan de dihê, mirov wek bînerêkî dihê ser şanoyê, lê wek bînerêkî rabirdûyê, wek bînerêkî ku hikayeta desthelateke mirî dibêje. Lê belê dîsa jî, îro, ji bo prosesa dadgehkirina rabirdûyê li Îraqê, kêmbûna şahidan yek ji kêşeyên herî girîng e. Wate, her çend mêjûya me ew jî sî û pênc salan pirtir e bi berdewamî tawan qeyd kiribin jî, beramber ew tawanên mezin ên ku em hest pê dikin, hejmara şahidên ku dikarin şehadetê li ser wê rabirdûyê bidin, kêmtir in ji wê hejmara ku mirov dipê. Di rastiye de mesele her ne ew e ku mirov nikare hestên qurbanîyan bijî, yanî, berevajî boçûna Agamben ku bi ya wî sînoreke gotinê heye û lewma bi tenê qurbanî bi xwe dikarin xwe îfade bikin. Ez wisa dibînim ku mesele ne tenê ew e ku em nikarin ligel hest û nestên qurbanîyan heta dawiyê biçin; lê mesele bêtir ew e ku em nikarin "ji celadî cuda bibin", nikarin "wî cihî berdin yê ku celadî bo me diyar kiriye", nikarin "xwe bi şeweyekî bibînin, cuda ji wî wênayî ku celadî durist kiriye." Kêşeya şehadetê ne tenê ew e ku şahidên rasteqîne hemû mirine, wek Agamben dibêje, an jî ku bayê guherîn û peresendinê firîşteya mêjûyê wisa firandiye ku êdî nema dikare hîç xwelî û xubara mêjûyê derbîne, lê mesele ew e ku qurbanî nikare veguheze bibe "şahid." Wate, em nikarin xwe ji şewaza nihêrîna celadî bo gunehê cuda bikin. Kêşeya me li rojhelat ne ew e ku em guh li axirîn qiseya qurbanîyên xwe nabin, lê bêtir ew e ku qurbanîyan bi giştî "hesta qurbanîbûna rasteqîne" winda kiriye. Binasên wê di hindek babetan de kom dibin.

Ya yekem ew e ku mêjûyeke dirêj a dîktatoriyet û cengî, têgeha guneh heta dereceyeke mezin berteng dike. Cûneke mirovan derdihên ku şiyana cudakirina "tawan"ê ji "netawan"ê li bal wan nîn e, bi taybet pênaseya tawanê di meydana siyasî

de bi awayekî wisa biçûk dibe ku çu maneyeke diyarkirî hilnagire. Li vir em digihine wê qenaetê ku di kultûra rojhelatî de, li bal qurbanan “şîûra qurbanî” durist nebûye. Têgeha guneh, di fikra rojavayî de cihekî girîng digire û delaletê wê ya medenî û mêjûyî heye; lê belê têgeha gunehê li bal me hê jî maneyeke dinî heye. Li rojhelat hê jî firîşteyên semawî tawan û netawanê ji hev cuda dikin, ne wek firîşteya mêjûyê ya Walter Benjamin. Şahid kesek e ku divê hesta exlaqî di nav de ji hesta siyasî bi hêztir be; ji bo ku bibe şahidê tawanê, ewil divê bizane tawan çi ye û çi diçe nav qalibê tawanê; şahid kesek e ku dikare şîûra xwe wekî qurbanîyekî kûr bike, ji ber ku şehadet bi “hişyariya qurbanîbûn”ê ve girêdayî ye. Lê belê noqbûn di kulturekê de ku di cewher de li ser xulkirin û şêlûkirina maneya tawanê kar dike, wisa dike ku şahid durist nebin. Şahid di cewher de bûnewerekî qanûnî ye, wate, li ser cudakirina “rewa” ji “nerewa”yê durist bûye. Lê ku em dişa berê xwe didine George Agamben, em têdigihên ku gava mirovek bi temamî hatibe bertengkirin bo “zindîtiyeke rût” û “xalî ji mafan”, êdî hesta cudakirina rewaya nerewayê dimire; bi gotineke din, mîna modêla “musulman”, ku li bal wê jiyan û mirin yek e, sereta ji kesekî ve geşe digire ku li bal wî rewaya tawan yek e. Her li ser esasê bîr û rayên Agamben em dikarin bêjin ku binasê veşartî yê derhatina modêla “musulman”, tesîra sistema dîktatoriyê ye; anku kesekî ku rewaya nerewa li bal wî yek bin, di dawiyê de digihê wê xala radikal ku êdî jiyan û mirin jê re wekî yek bin. Ev xalek e ku Agamben bi xwe jî bi hûrgilî kar li ser kiriye.



Ya duyem ew e ku hestkirina bi gunehbariyê bi şiklekî wisa di kûratiya mirovê rojhelatî de şîn bûye ku hemû amajekirinên bi guneh tirseke navekî ya mezin durist dikin. Bo nimûne, Be'sê, xelkê Îraqê bi temamî bi tawanên xwe lewitand; ew pîsbûna mirovî li rûyê psîkolojî û fîzîkî ve, ew beşdariya rasterast û nerasterast a mirovê Îraqê di tawanan de, hemû maye mîna şermeke bêhay û xefkirî. Ew hesta gunehbariya mirovî, yek ji wan sebebên e ku nahêlin mirov şahidiyê li ser wê sistêmê bide ku gunehên wê, gunehên wî bi xwe jî ne. Şerma mirovî ya ji gunehbariya xwe, wisa dike ku mirov nikare rola şahidî bibîne. Yek ji wan hokarên ku nahêle şahid derbihê ew e ku

qurbanî xwe wek tawanbar dibîne; wate, nemana sînori di navbera tawan û bêtawan de, ku min di xala yekem de behs lê kir, dibe binasê nemana sînori di navbera tawanbar û bêtawan de.

Ya sêyem ew e ku şahid kesek e ku rola karakterekî dibîne, çavdêrî dike, temaşe dike û dibîne. Lê belê, mirovê rojhelatî bi giştî û Îraqî bi taybetî, rola objeyekê wergirtiye ku çavdêrî lê dihê kirin, dihê temaşekirin û dîtîn. Guhertina wê ruwangeyê ji cihê kesê ku dihê dîtîn bo kesê ku dibîne, karekî aloz û dijwar e. Yanî, bi bawerîya me, ne karekî sanahî ye ku kesek bikaribe ji halê qurbanîbûnê rabe, bilind bibe, per û bask bigire û bibe “Angelos novus” a Walter Benjamin. Ji bo wê hindê ku ji yê dihê dîtîn bibe yê dibîne, ji yê “dihê çavdêrîkirin” bibe yekî ku “çavdêriyê dike”, guherîneke kûr a temamê sistema nêrîn û fikirînê pê divê. Li vir, bêtir berevajîbûneke ji paradîgmaya mêtîyê, derhatin û serhildana şahidekî ku bi rastî bînerê karesatan be, tiştêkî zehmet û nekiri ye.

Bi bawerîya min, şahid, ne tenê kesek e ku diçe dadgehê da heqîqetê bêje, lê kesek e ku di nav tevahiya sîstem û pêşveçûna rûdanan de dikare li cihekî raweste û di wê derê re bibîne. Şahidbûn amajeyê mezîn e bo jidayikbûna kesekî ku dikare baweriyê bi çavê xwe bîne û bikeve dû dengê nav xwe. Kesek ku dikare ji xwe fam bike û li ser qurbanîbûna xwe baş haydar û hişyar be.

Pazdeh sal piştî rizgarbûna ji Sedam Huseyîn, em li Kurdistanê sîber û pêjna wî mirovî nabînin ku ji bîneriyê derkeve û bibe qiseker, anku sîbera wê modêla peydanekirî ku bikare bazde ser şanoyê û ji qurbaniyê siyasî û neteweyî ve veguheze û xwe wekî qurbaniyekî însanî û yasayî nîşan bide. Mirovê me hêj jî kesek e ku nikare bibe şahid. Nikare bibe ew bînerê ku em ji hemû tiştên wî dîtî dilniya bin.

Di demokrasiyê de mirov ji yê dihê dîtîn dibe bîner. Di demokrasiyê de,

berevajî ya di dîktatoriyê de, şahidî roleke girîng heye. Demokrasi, lêgerînek e li dû bawerîya bi şiyana dîtîn û gotinê. Heta wê roja ku di mêtîyê me de dengê şahidê rasteqîne ne diyar û winda be, şahidek bikaribe li ser sîstem û gunehên wê qise bike, binasên dîktatoriyê mezin in.

Qeyrana şahid, yek ji qeyranên kûr ên mêtîyê me ye. Bêtir jidayikbûn û derhatina şahidî, mêtîyê di nav xwe de guherîneke kûr a exlaqî nabîne. Şahidiya rasteqîne, bi tenê gava têgihîştina azarên qurbanî nîn e, lê bêtir, gava xwecudakirina temamî ya ji celadî ye.

Çavkanî û perawêz

Gotara Walter Benjamin ku tê de behsa wê firîşteya “Angelos novus”ê dike, bi navê “Derbare têgeha mêtîyê de” ye û ev e: Benjamin, Walter, *Gesammelte Schriften*, Bd1, Hermann, Frankfurt/ M. 1972-19, S.697

Ev kitêba Agamben, beşeke berhemeke sê bergî ye bi navnîşana *Homosacer*. Referansa beşa sêyem: Agamben, Giorgio, *Was von Auschwitz bleibt. Das Archiv und der Zeuge (Homosacer III)*. Suhrkamp, Frankfurt/M.2003

Agamben di wê kitêba li jorê de, beşeke taybet bo “musulman” terxan kiriye. rp. 36-75.

Peyva “musulman”, her ji musulmana me dihê; mebest ji musulman, ew zîndaniyên di nav ordûgeh û zindan û kodilgeyên nazîyan de ye ku bi awayekî hişk dibûn û xwe ranedigirtin; çawa musulman di gava îbadetkirinê de dilerize û beşê serve dihejîne, beşê serî yê bedena wan bi berde-wamî dilivîya; an jî, gava di sekeratê de bûn, musulman di sûcdêyê de çawa rûnîn ew jî bi wî awayî rûdiniştin û bi ser xwe de dibabûn. Êdî bi wî awayî navek hatiye nav lîteratûra hevçerx.

Ji bo zanyariyên zêdetir li ser Jorge Semprun û rewşa ordûgehên nazîyan, binêre weşana beşa felsefeyê ya zanîngeha Heinrich Heine li Dusseldorf, deftera 4, sala 2006, gotarek bi vî navnîşanê: Ursula Hennigfeld. *Wovon man nicht sprechen kann : Sprache der Macht und Macht der Sprache*. Jorge Sempruns Buchenwald-Tetralogie.

Agamben, Giorgio, *Was von Auschwitz bleibt*. rp.60

Bo zanyariyên zêdetir li ser têgeha Agamben “jiyana rût”, hûn dikarin li nivîsareke min a pêştir binêrin. Li wê derê, ev têgeh bêtir hatiye ronkirin: Serdemî Rexte, hejmar 3. Gotara bi ser-enavê “Gûtari manewe”, rp. 104-112.

Kurmanciya wê: Ergîn OPENGÎN

Dosye: Arjen Arî



Amadekar: Elîxan LORAN

► Ji devê Arjen Arî jînenîgariya wî
Arjen ARÎ

► “Min xwest ez her tim bi ‘bîr’ bim, bi bîr bînim, xîtabî ‘bîrê’ bikim”

Hevpeyvîn bi Arjen Arî re

Elîxan LORAN

► Derwêşê tekiyeya helbestê Arjen Arî

Berken BEREH

► Wan rojan, risteyên me

Kawa NEMIR

► Ji bo poetikaya Arjen Arî çil deqdeqûşk

Lal LALEŞ

► Di ‘arî’ya peyvê de ‘arjen’êke h-ar

Omer DILSOZ

► Di helbestê de simbêlên Arjen

Ferzan ŞÊR

► Arjenîka

Mihemed RONAHÎ

Kovara Wyê ji nav kesên sax herî dawî gorbihûşt Mehmet Uzun kiribû mijara dosyeyê û piştî wê ji ber hin nîqaş û bertekan mecbûr mabû ku kesên sax neke mijara dosyeyê. Bêyî ku em vê meseleya sax û miriyan dirêj bikin, em didin xuyanî ku ji îro pê ve em ê gelek kesên ku pelê wî/wê hê bi dara heyatê ye, bikin mijara dosyeyê.

Dema me biryara dosyeya kesên sax in da, me bi hev re yekser navê Arjen Arî hilda. Ji ber ku em giş dizanin Arjen Arî ji sala 1976’an vir ve bi kurdî dinivîse, ji ya xwe daneke-tîye xwarê, ji ber kesî danexwariye û her çav qîq kiriye peyvê!

Geya di bin tehtan de namîne” yekemîn dîwana Arjen Arî “Ramûsan min veşartin li geli-yekî” ya ku *ramûsançîn* û *ramûsanjenbûna* wê nasraw e bi vê gotina ku kî dizane ji ber kîjan sotinê pêk hatiye, dest pê dike. Di dolaba huner û gotinê de tevî û kêlên tesadufî tune ye, divê tune be û ligel vê yekê helbestkar gotinê ji tiliya xwe bêhn nake, li rex van gotinan em helbesta Arjen li kîjan hesabî bixînin ji dê ev derkeve holê; Arjenê *ramûsan-jen* dehk û doza dîroka wesle wesle ligel *zarokên talib* bi gotinên “*Herakol im ez, ez hera-kol im / li jor im, / eniya xwe rak! hê jî li jor im / li ser axekê -ku îro bindest- / ji doh de kefte left / îro pîkol im!*” berceste û *serdeste* dike, kincên talankeran diavêje çemê bi şîp, geh bi peyva xwe ya tîr li ber dagirkeran pehn dibe, geh ji bo biserxwevehatina qewmê Arî vedigere serê meseleya Kawayê Hesinkar, bi Destana Kawa şîqameke birûskî dadiweşîne ser rûyê dîroka ku li me ho venade, geh ji bi Eroûtikayê me bi nêr û mêtîya me dihesîne, bi Çil Çarîne gotinên pêşîyan diguvêşe, bi Şêrgeleyê ji me re tenê qala *daran* dike ku em kurd bi saya serê van darçandan li ser lîngan in...

me hewl da ku gelek aliyên Arjen Arî di vê dosyayê de destnîşan bikin. Em hêvîdar in ku vê dosyaya me afirîneriya Arjen Arî nimandiye û kevîrek be jî li qûça Arjen Arî zêde kiriye.

Ji devê Arjen Arî jînenîgariya wî

Zaroktiya min zaroktiyeke tiştîşî ye. Jixwe di çirokan de jî min ev tiştîşîbûn û zîwarîbûn vegotîye. Ez 4 an 5 salî bûm, me ji gund bar kir, em hatin navçeyê (*Nisêbinê*). Bavê min bi kuştina leşkerekî dihat tawanbarkirin. 3 salan di hepsa Mêrdînê de ma. Ez bi saya wê hepsê hînî cixareyê jî bûm. Wê gavê axayekî Hevêrkiyan di hepsê de bû, Beşîrê Serhên. Cixare û çeqmaqê muxtaran didan min û min li hepsiyan digeland. Ez wê demê piçekî bozîk bûm. Hetanî 1969'an jî bozîk bûm, bû 1970'ê, ez hatim Mêrdînê û ez guherîm. Piştî çend heyvan diya min got "Wî lawo te porê xwe boyax kiriye." Min got; "Yadê weleh min tiştêk di porê xwe de nedaye."

Dibistana seretayî min li Nisêbinê xwend. A navendî li Mêrdînê li *Vakıflar Yurdu*. Min lise jî li Nisêbinê xwend. Beriya ku ez liseyê biqedînim bi salekê, min dest bi helbestê kir. Sala xweamadekirina zanîngehê bû, lê helbest li serê min bû bela. Helbestên min bi şeweya klasîk bûn. Min dixwest biçim Ewropayê di sala 1969, 1970, 1971'ê di wan deman de. Ez û Şerefhan Cizîrî. Min digot ez ê herim Swêdê û bibim şair. Dûre min dît ku li Swêdê kesên din û dinokê bi helbestê tîd tedawîkirin. Min got "Wey, nexwe ez jî din im."

Edebiyat, ne benê herî zexm ê di jiyanê de ez pê digirim e. Ji bo min edebiyat wek xwesêwixandinekê ye. Min ji xwe re nekirîye kar. Rojekê Firat Cewerî ji min re got "Arjen tu wekî helbestkarekî li xwe nanihêre." Min got "Tu caran bi wî çavî min li xwe nenihêriye." Dema ku ez dinivîsim ez şair im, jê pê ve ez mirovekî beredayî me.

Xwezî min karibûya dîsîplîna nivîsandinê bi dest bixista. Beriya 12'ê Îlonê jî min re gotin, "Em dixwazin tu di warê siyasî de bi profesyonelî bixebitî." Min pêşniyara wan bi bişîrîn guhdarî kir û min got "Hûn hatine ba mirovekî şaş... Hûn bi min ewle bûne, lê ez mirovekî bêedeb im." Dûre dîtin ku ez jî wan re nabim.

Di Enstîtuyê de beşa Edebiyatê min bi zanîn hîlbijart. Ji ber haltenikiyê ez salê nêzî 50 rojî diçûm mektebê, jê pê ve ez dişulim. Bi zextên apê xwe, min beşa Matematîkê hîlbijartibû, paşê di rê de min kir

Türkçe. Lê min dixwest ez beşa Rojnamegeriyê bixwînim. Li Enqereyê min serî jî lê da, lê min bala xwe dayê ku ne karê min e. Ji ber ku mesrefên wê hebûn. Di 1974'an de ez çûm Stenbolê, *Kızıltoprak Eğitim Enstitüsü*, lê niha nizamim ez ji bo çî çûbûm, nayê bira min.

Kurdan gotîye "Ji lêhatinê jî jêhatinê." Ji min re li hevdu nehat. Hê ez 11 salî bûm bavê min çû rehetê.

Taybetiya her nivîskarî cuda ye. Dema ku ez aciz dibim ez nikarim binivîsim. Hinek mirov li kaosê digerin, dikarin di hundirê gerînekan de hin tiştan biafirînin. Ez ne wisa me. Divê pariyekî aram bim, pêlên min pariyekî rawestin. Di heyata xwe de ne ku serxweş nebûme, lê kirine nekirine -*jî bo xatirê Mehmed Uzun bi xwe jî*- min helbest nexwendine li sifreyê araqê. Min nexwestîye helbest bibe mezeya araqê. Û tiştêkî seyr e, piştî vexwarinê jî min tu carî nenivîsandiye, nayê bira min.

Beriya ku ez mamostetiyê biqedînim bi du mehan, li Nisêbinê Mahmûd Nedîm Ozalhas hebû, ez çûm serdana wî. Li ser maseyê got "Ma tu bi min re naxebitî". Min jî got "Belê... Çima nexebitim." Apê min got "Ka mamostetiya xwe biqedîne." Min got "Belaya xwe jê veke." Wek teknîsyenê avahiyên di *Sû İşleri* de min dest bi kar kir. Beriya dibistanê jî min ew kar dikir. Piştî çend heyvan, li lîseyê Nisêbinê mamosteyê edebiyatê tune bû, bi emrê qeymaqam min li lîseyê dersên edebiyatê dan. Min bala xwe dayê ku xwendevan beredayî ne.

Min di sala 1980'î de beriya 12'ê Îlonê jî wan re helbestên Cegerxwîn xwendin. Dema ku 5, 10 deqîqeyan dereng dimam, di nav wan de xwendevanên halxweş hebûn, bi teqsiyên xwe dihatin dû min. Ew xwezî di qirika wan de ma. Di wan salan de êrişek pêk hat, bekçiyek hat kuştin, polîsek birîndar bû û ez jî hatim girtin. 27 rojan li tûgaya Mêrdînê mam. Piştî 12'ê Îlonê meseleya mamostetiyê qediya. Piştî 12'ê Îlonê jî ez hatim girtin. 53 rojan ez mam. Du kes hatin cihê kar û ez birim. Min ew girtin, wekî helbest nivîsiye bi navê "Çiroka 13 şev û 13 rojan." Di Nû-

demê de weşiya. Min nizanibû ku ez mirovekî ev çend zexm û xwedî xwe û hedan im. Piştî ku min ew qasî lêxistin xwar, min di dilê xwe de got “Madem tu ev qasî dikarî li ber xwe bidî, çima te tiştên mezintir nekirin?” Di 13 rojan de malik li min xera kirin. Wan ez biribûm cihekî taybet, cihekî kuştinê. Febrîqeya pembo hebû. Bêxwe-diye te digot qey ji bo îşkencekirinê çêkîrine. Min *filistin askısı* li wir dît. Ev qas sal jî bihorîne rehtbûna çengê min hê ji wê demê ve ne. Nêzî 6, 7 heyvan jî min nika-ribû pêl lingê xwe yê çepê bikim. Ji ber ku dema îşkence kirin, ne jop bû, bi destbivî-rekî li binê piyên min didan. Tesîr li hestî jî kiribû. Piştî wê lêdanê min nema tu lêdan xwar. Kaxizek bi min dan îmzekirin, xwedêgiravî îşkenceya ku li min hatiye kirin, ne wan kiriye.

Girê Mîran, Nisêbîn, Mêrdîn, Diyarbekir. Niha jî dema ku dengê têlsizê tê min, a belediyeyê jî be, bê hemdê xwe serê min dizivire. Dema serê sibehan jî Tûgaya Mêrdînê berê me didan îşkencexaneyê, ez li dawîya hemûyan bûm. Çavên me girtî bûn. Wek peza kulek a li dawîya kerî. Min bi çakêtê yekî digirt û li pey dixirikim. Piştî çend rojan em anîn Diyarbekirê. Ji ber ku lingê min kulek bû, marş bi min nedan gotin.

Di roja 53'yan de em derxistin mehke-meyê. Tenê pîrsek ji min pîrsîn. Wexta ku pîrsî, min lingê xwe şanî da. Camêr nekir dudu, got temam û derkeve derve, rûnê.

Min xwestiye bibim şair. Lê ez tu carî wekî şairekî nehatime girtin. Vê dewletê xwestiye tiştên nebûyî têxe stûyê min. Çend caran ez hatibim girtin, ez ji ber doza PKKê hatime girtin.

Di 1992'yan de emrê kuştina min dan. Ez jê filitîm. Lê yê ku îtîraf kiriye wa ye di hepsê de ye. Yê ku bera min jî dan -*vê paşiyê min zanî*- her du jî hatin kuştin.

Dûre ez hatim Diyarbekirê. Sondek min hebû, min gotibû ez ê ji vî welatî neçim. Tu yê bibêji qey çend hezar donim erdê min hebû û destên min jê nedibû (*dî-kene...*) Wê demê xaniyekî min li Mêrsînê jî hebû, lê ez neçûm.

Gelek caran min xwest ez herim çiyê. Min dixwest ez herim, rasterast jiyana wan mirovan bi çavê serê xwe bibînim, bi wan re bijîm. Nebû qismet.

Jiyan kêlikek e, tiştê ku îro bê kirin

min xwestiye ez îro bikim. Ji bo min sibê tune!

25 sal û 6 mehan ez xebitîm. Risteke Namik Kemal a bi navê “*Hurriyet Kasidesi*” heye. Digot “*İzzet û ikbal ile ayrıldık hukümetten.*” Ew jî muxalîf bû, lê li *Babî Alî* di-xebitî. Dîtibû ku memurtî û mûxalîfî tiştêkî ji hevdu re nabêjin. Min jî bala xwe dayê ku ez û dewletê jî em li hev nakin. Erebe ya min hebû, şofêrê min hebû, miasê min baş bû... Lê me li hev nedikir.

Ez zû zû natirsim, lê rojekê ez tirsî-yam, bi erebeyêke spî hetanî Riya *Ovabagê* ya diçe aliyê Metînan nêzîka 30 km. wan dan dû min. Min jî şofêr re got “Tu çi dikî bike divê tu nese kinî.” Ez ji xwe re fikirîm, tu bixwazî bibî şair divê tu parî-yekî serbixwe bî û malnişîn bûm.

Ji min re tê gotin “Tu dikarî roleke me-zintir bilîzî.” Bi Xwedê kêfa min ji mezina-hiyê re nayê. Gorî min mezinahî ne ew e ku tu li ser kursiyekê, li jor bî; li gorî min mezinahî ew e ku tu di dilê xwe de nefsbî-çûk bî û kirinên te mezin bin. Kurd sibê tiştêkî mezin bidin min jî ez ê bibêjim “Heyran, li min biborin, bi kêrî min nayê.”

Hê di salên 1970'yî de ez bi xwe hesi-yam ku tiştêk di min de heye ji bo nivîsan-dînê. Nivîskarî dana Xwedê ye. Bavê Nazê jî wisa dibêje. Xwedê Teala gelek caran nade mirov; carekê dide û êdî dimîne tu wêya çawa bi kar tinî.

Hin xewnên min jî hene. Min dixwest di navbera nivîskarên derve û yên welêt de pêwendiyên zexm hebin. Nivîskariya kurdî sînoran birûxîne, sînoran bibezîne. Ne ku min hewl neda, min li Ewrûpayê jî hewl da û min li Başûr jî. Ji sala 2003'yan vir ve tîkiliyên min bi Komeleya Nivîskarên Du-hokê re hene.

Min digot, divê ev edebiyat ji navendekê belav bibe, navend jî wekî Bakur min pêş-niyar kir. Romana Bakur li Başûr, çîroka li Başûr divê li Bakur çap bibe.

Di heyata xwe de ez bi tiştêkî din jî kêfxweş im, ez ji yek wan kesan im ku min avakirina Komeleya Nivîskarên Kurd pêş-niyar kir û ez jî bûm damezirînerê wê. Ez ne serokê wê bim jî ne xem e, jixwe tu carî min serokî nexwestiye.

Vê dawiyê, di projeya “Wêje Dîroka Xwe Dinivîse” mebesta me ne ew e ku em dilê tirkên, dilê wan ê bezgirtî bi wêjeya kurdî feth bikin, em ê xwe li ser wan ferz bikin.

efendino!

rahîjin teşkên xwe
rahîjin kincên xwe, postelên xwe û vîfgeyên xwe
gîyê we hebe ti ser wê axê

û we gî anî be bi xwêre:

feng, top, tîvaz, teyare...

û we gî awa kiribe: dibistan, gergol, dadgeh
û hepsên bêdeggeh, wîdan û awaggehên tîrgun.
û jinên xwe jî esrah! efendino, zarîyên xwe
hebin; piq û bîjîyên jî xwe jî
û kuşikên xwe jî pişk û qivîkên xwe jî
û ala xwe jî jîbir makin, ala xwe jî
tîştêkî, tîştêkî nehêlin jî kerema xwe!

hûn ê biqîn!

hûn ê piştê şûyê xwe bixurînin û biqîn

hûn ê binîşnîqîn û hûn ê biqîn

biqîn, berî ku kuş û levin di me war bin!

biqîn, berî ku dayikên kîtanî

tû bikin ser gawên me!

û hêj ku agir wêneketiye jî agir:

hîma nîha, wê kûllê, jî vir

rahîjin teşkên xwe û bigeritin, efendino!

A. An

"Min xwest ez her tim bi 'bîr' bim, bi bîr bînim, xîtabî 'bîrê' bikim"

Arjen Arî yê ku ev sî salên qut û gilover in nobedariya alaya kurdî dike, me bi "bîrên" me yên ku qedera me di wan de bedimîne werdike. Me jî pîrsên li ser jiyan, helbest, jibîrkirin, şêwaza nêzikbûna li peyvê, kakilê vegotinê, mayîna li welatekê, muzîka peyvê ji Arjen Arî kirin. Nahtoriya sî salan di herpeyvînekê de hilnayên. Ji bo ku em karibin nahtoriya Arjen Arî di çend rûpelan de bi cih bikin, me pîrsên sereke dan ber xwe ji ber wê jî em dibêjin, ya me "bibîrxistinek" e ...



✓ **Dema mirov li helbesta Arjen Arî binihêre, mirov dibîne ku du stûnên bingehîn li dar in. Yek dil û ya din jî neteweperwerî ye. Îcar di neteweperweriyê de jî hêmana te ya sereke çiya ye. Pêşyan gotine "Çiya di bin tehdan de namîne", gelo em dikarin bibêjin ku Arjen Arî bi helbesta xwe gotiye "Çiya di bin zextan de namînin?"**

Welatê kurdan digel ku bi deşt e û berî ye; kohistanek e, welatê çiyar e. Kurdan bi xwe jî ji beyaran hez nekirine. Ji serê çiyayan hez kirine. Bi bîr û baweriya min ev hezkirin dibe ku ji Zerdeştîyan jî baweriya Ahûra Mazdayî tê. Ji ber ku Xweda her li ezmanan bû û wan jî dixwest xwe nêzî wî bikin. Bawer dikim ev baweriya Zerdeştîyê veguherî xweparastinê. Ji bo ku kurd bikaribin tovê xwe li ser vê axê biçînin, şîn bikin; çiya hilbijartin. Îro jî ji bo wê hindê jiyan çiyayî, hêvî çiya ye.

✓ **Mirov di helbesta te de rastî jibîrnekirinan tê ku ev jibîrnekirin xwe bi pêşîra xwendevanan ve jî dizeliqîne. Wekî nimûne "Bosna-licê, şîrnex-somalî, Oxir kaymaz, Hrant Dînk, 4 hezar gund, şerê Çeneqeleyê, 3 milyon penaber." Piştî ku bi çekan êrîşî te kirin, ev 18 sal in tu jî ne nîvpenaberek î gelo? Di nezera Arjen Arî de jibîrkirin an jî jibîrnekirin çi ye?**

Jibîrkirin dîrketina kes û civakê ya ji xwe ye. Jibîrnekirin jî pevgirêdana rabîrdû û dahatûyê ye. Ji ber hindê, bi helbestekê be jî min xwestiye/dixwazim 'bîrê' hilgirim siberojê, da bibe destikê vekirina qapaxa bîra li ber xitimandinê. Yên berî min 'peywireke' wisa dane helbestê yan na? Çiqas bi ser ketime ew jî ji xwendevanan re dimîne. Lê min xwest ez her tim bi 'bîr' bim, bi bîr bînim, xîtabî 'bîrê' bikim. Lê ev ne tembî ne û ne jî pend in. Bi serboriyên bûyî û qewimî, min xwestiye bi hizr û dilîniya kes bilîzim û wî vegeirînim ser 'bîra' wî.

✓ **Ev bibîrxistin piçekî jî ji helbestê naxwe? Helbest jî di bin bandora bîrê de namîne? Tu vêya çawa çareser dikî?**

Na, naxwe; lê zêde dike. Di navbera duh, îro û sibê de qasidek e helbest. Û helbest jî her tiştî dixwe û vedixwe. Li vir, dikarim navekî li helbesta xwe bikim: Bêndera bîrê! Berî me jî qewimîn qewimîn e, ev ne qetiyayî ne ji qewimînên îro. Bûyerên 'bîrî' bi destê min tên peywirdarkirin, bivê nevê ji xwe re li rêçekê digere, li rêçeke helbestî û xwehelbestkirinê. Ji bo min tu xeter nîn in lê yên ku li dû min tên ku têkevin wê xetereyê, dê di 'bîrê' de bimînin.

✓ **Ji ber ku wek xetereyekê dixuyê**

Bivê nevê xetereyek e. Gelek helbestkaran helbest, jî hin tiştan re kirine gorî. Do jî bûye, îro jî dibe. Ne xetere, em bibêjin 'gorîkirin!' Bi gorîkirina helbestê! Xwesteka xwerizgarkirina jî şert û mercên îroyîn... Dîtina zextên li ser, ser û dilê li civakê.... Dawiya dawîn helbestkar jî kitek jî vê civakê ye û ji hilkutandina dilê wê ye. Mumkin e ku pir aciz be. Ev acizî jî dibe tengijîn û wî - li ser navê helbestê- biao bi ser kirina hin tiştên şaş de...

✓ **Di diwanên te yên ku çiya di rola xort û xamayên nûxwîrî de ne -Ramûsan min veşartin li geliyekî, Ev çiya rûspî ne û Şêrgele- diwan bi taybetî bi gotinên pêşyan dest pê dîkin, "geya di bin tehtan de namîne, zêr zane zor zane devê tivinga dev bi mohr zane, ê ku neçe şer şer e." Berî ku diwan dest pê bike, berî ku em zanibin ka em ê çi bixwînin, tu dixwazî me bi pêşhelbestan bihesînî gelo?**

Kek Berken Bereh jî ev tişt destnîşan kiribû. Lê ne şaş bim wî gotibû "Xwezî ev tişt nekiribûya." Ev bi zanîn hatiye kirin. Bi her sê gotinên pêşyan min xwestiye ez deriyekî ji xwendevanan re vekim û bibêjim "Tu yê li vana rast bêtî." Lê ya din jî tematîkiya wan e.

Xwendevanek - ji mafê wî ye- dikare bibêje "Çi tîkiliya gotinên pêşyan û helbestê bi hev re hene." Bi Xwedê ev tîkili min pêk anî, îcar min baş kir, min xerab kir ez nizanîm.

✓ **Bi giştî di helbestên te de dîsa mirov pêrgî du tiştan dibe. Yek jê xwarin - helbestên bi navê "Name" û "Her êvar" jixwe li ser xwarinê ava bûne- û ya din jî dubarekirinên peyvan wekî "lod lod" "sor sor" "kit kit". Gelo mirov dikare bibêje ku di helbesta te de xwarin cureyekî bextewariyê ye -dibe ku bextewariyeke demdemî be jî- û dubarekirina peyvan jî cureyekî dilê xwe li peyvê rihetkirin e? Wek qîrandina peyvekê be?**

Belê.. Kirpandin û zexmkirina peyvan e. Bi gotina te, dilê xwe lê rihetkirin e! Meseleya xwarinê jî, di vî emrî de dema bêhna nanê tenûrê tê min, dilê min dibije hevrişkê. Ew tehmên min ên zaroktiyê ne. Û ew tehm ji bîr bûn. Wekî gelek tehmên din ên jiyanê... Ji ber hindê di helbesteke xwe de min ji dildara xwe re gotiye "Yarê kerem bike ser sifreya Arjen Arî" Ew qelisêlk, nivîşk, dew û nanê sêlê... Ev jî tê li 'bîrê' dîlkûme, yan na?

✓ **Bi taybetî di helbestên bi navê "Mihemedo, Heyrano û Şêrgele" de bi qewlê te, tu bala me dibî ser "Kulîl-kên bihara derengmayî". Tu di hevpeyvînên xwe de dibêji "Min qet bîr nedibîr ku ez ê rojekê bibim helbestvan."**

Dîsa jî dibêjim! Barekî giran e helbestkarî!

✓ **Belê tu bûyî helbestvan, Mihemedo û Heyrano bûn stran ketin ser zar û zimanan. Ligel van tiştan derdê te û ev Şêrgele, Şêrgule û Şêrguleyan çi ye?**

Kek Elîxan, bi Xwedê tiştên ku min gotine êşkere ne, ne nixumandî ne. Lê tu dixwazî bi destê xwe helbestê şilf û tazî bikim, binkiras jî jê bikim! Niha hemû Şêrgele, hemû Mihemedo kesên

ku ev 30 sal e di nava şerê rizgariyê de ne. Navê wan dikare Mihemedo be, dikare bibe Şêrgele, dikare Xorto be. Wekî mînak heta ku min peyva "Xorto" di helbesta bi navê "Xorto" de bi cih nekir, helbest neqediya. Di kêlika nivîsandina wê helbestê de hat bîra min serencema Xorto ya ku digel hevalên xwe, piştî şerekî giran birîndar filitiye û çend rojan bi qûnkişkê û bi zikpişkê xwe rizgar kiriye, navê xwe dixê bîra min. Soxî; di ris-teyê de bi bicihkirina navê "Xorto" re helbestê got, ez qediyam! Gelek caran ne tu, helbest xwe diqedîne. Ne ji bo wesif-dayînekê, ji destê gerîlayan, ji destê hurnermendên hêja stran, helbest, çîrokên li ser têkoşîna gelê kurd a azadiyê hatine gotin. Lê niha li vir ez neçar dimînim ku bibêjim, bi helbestê min xwestiye ez 'berdevkiya' sî salên şer bikim. Min xwestiye ez berdevkiyeke bi 'rêkûpêk' bikim. Wekî mînak, dema ku min "Destana Kawa" qedand, nivîskarên li Diyarbekirê yê wê Îhsan Biçîci, Hicrî Îzgoren, Ahmet Kaymak amade bûn, gotin; "Arjen Arî te ev destan kiriye qurbana beşa dawîn." Wekî meseleya Ehmed Huseynî û helbesta wî ya dawîn. Min jî got li "Qisûrê nenihêrin sed destan bi qurbana van navan bin." Çimkî ev nav tunebûna, wê ev destan jî tune bûya. Edebiyat tenê ji min, bi min pêk nayê! Ji xwendinê min, ji jiyînê min, ji serpêhatiyên min, ji qewimên der û dora min, ji yê berî min û ji yê siberojê pêk tê. Îcar tiştek heye, di vê dinyaya pir mezin de tu ji xwe re hêleke ku tu yê xwe tê de 'xwedî' bikî, hildibijêrî. Ji wir tu dibî "Dinyayî"! Tu ne ji wir bî tu yê nikaribî bibî "Dinyayî" jî. Ez wekî mirov pêşiyê kurd im, paşê mirov im; Bi nasnameya xwe, bi zimanê xwe, bi çanda xwe, bi hizrên xwe. Ku em dagerin ser pirsê... Her kesê/a sax an gorbihuşt, her kesê/a ku tevî vê



riya bi êş û azar bûbe, Şêrgeleyek e, Mihemedo ye.

✓ **Lê piştî ku te "Mihemedo û Xorto" nivîsî jî dilê te rihet nebû û te "Destana Kawa" nivîsî. Çîroka Destana Kawa kêm zêde dihat zanîn lê te li gorî weznekê ji nû ve nivîsand. Çima te xwest tiştekî wisa ji nû ve bini-vîsî?**

Mirov dikare bibêje ku ji nû ve ye. Ve-jandin, her vejandin nûbûnekê bi xwe re tîne. Dema ku min dît helbestkarên beriya min, bûyera Newrozê wekî temayekê vala hiştine, bawer bike min dua ji wan re kir û min di ber xwe de got, 'Xweda ji we razî be, sedî sed we dizanibû ku ne- viyek ji van neviyan, wê bi dû we ve bê û wê vê binivîse. Destan, mirov dikare bibêje ku ne- wala kelepura neteweyî ne. Ji ber ku xîtabî hest û di- lînan dikin, kesek nikare ji ber van hest û dilînan bifilite. Ji ber hindê jî, di teşegirtina ruhê miro- van de, bi taybetî di yê zarokan de cihê destan- nan pir girîng e. Destanên kurdî hebûn, lê hatine jibîrkirin û yê ku hatine berhevkirin jî xera bûne. Dîsa jî kurdan li wan guh dêrane, bi wan lehengan serbilind bûne, li xwe ewle bûne. Min xwest Newrozê jî wê peyva wê ya gotegotî, yan jî ji binê siya wê ya dîrokî derxînim û çêjeke edebî bi- dimê.

Niha gelek caran tê gotin ku nivîskar an helbestkar dema tiştekî dinivîse azad e. Ez bi xwe hem azad im, hem jî girê- dayî! Girêdana min berpirsiyariya li pêş- berî civakê ye. Dema min ev destan nivîsî min xwest ez xwe bigihînim wî/wê kurda ku vê metnê him ew bixwîne û him jî ji zarokên xwe re jî karibe bix- wîne. Wekî şêwe min nikaribû bi şêweyê "Mihemedo" binivîsiya. Ne ku min xwe neceriband. Lê min paşê bala xwe dayê ku ez nikarim. Mirovê ku li ser riya ede-



biyatê bi salan rêwîtiyê bike mîna korê ku riya camiyê nas bike ye. Mesnewî hat bîra min, lê min got di qirnê 21'ê de tu rabî mesnewîyan binivîsî wê kes nexwîne. Talî, wekî teşe min mesnewî hilbijart, lê min dengbêjiya kurdî û çîrokvebêjiya kurdî lê bar kir. Bi vê ya jî, min karibû metnê sivik bikim, rihetir, herikbartir bikim.

✓ **Di “Eroûtîka”yê de êdî tu dadigerî ser evîna jin û mêran. Ez pirseke kurt bikim, di “Eroûtîka”yê de te xwest em çi bibînin û esas bertek û reaksiyonên çawa çêbûn?**

Min dixwest tenekeyan jî bi dû min ve bikin piştî vê berhemê! Yari li hêlekê, ji ber ku min ji hezê hez dikir min “Eroûtîka” nivîsand. Lê ne ji risteyên Ehmedê Xanî bûna welehîn min “Eroûtîka” nedivîsî. Risteyên wekî “*Aşiq û bilhewes cuda ne / hîn faydexwaz, hîn feda ne*” û dîsa gotiye ku “*Eşqa ku nebitin tu xayet, nabitin aşiqan nîhayet*”. Yanî eşkek divê mebesteke wê hebe. Ehmedê Xanî mumkin e ku li gorî tesewifa xwe şîrove kiriye lê ez jî li gorî tesewifa xwe şîrove dikim. Ji bo min divê ne ji bo berjewendiyekê tu hez bikî. Dawiya dawîn li gorî felsefeya min, mirova ku ez jê hez dikim, ez dikarim nekevim nav cihên wê. Hezkirin tiştêkî wisa ye ji bo min. Ez dikarim bihingivimê. Hingaftin tiştêkî pir pîrozwer e. Hingaftin rasterast destpêka wekh-

eviya du laşan e, du ruhan e.

Di van sî salan de me gelek hezên xwe ji bîr kirin. Heza dayikê, heza xwişkê, heza bira, heza jinê, heza yarê. Ez ji welatê xwe hez dikim. Gelek caran min gotiye ji welatêkî hezkirin ji her tiştên wî hezkirin e. Lê gava ku hez ji ber berjewendî yan jî ji ber mebestekê be, wê gavê her tişt hildiweşe, her tişt dirûxe. Heza biratiyê cuda ye, heza mêrantiyê cuda ye, heza lawtiyê cuda ye lê ev hez hemû hevdu xwedî dikin. Ji ber vê hindê ez vê dibêjim, mirovê ku ji Kurdistanê hez bike

divê ji hemû Kurdistanîyan hez bike. Wexta ku dibêjim hemû kurdistanî, bawer bike ez mirovên kirêt jî dixim navê. Ne ku ez tenê paqijan hilbijêrim.

✓ **Reaksiyonên çawa çêbûn?**

Çend caran ji min re hat gotin “Ma-moste, piştî 50 salî û Eroûtîka?” Bi taybetî jin bûn - (*dikene*). Min ev li wan vegerand “ez nikarim yeko yeko bersivê bidim we. Konferansekê li dar bixin û ez ê bêm biaxivim”. Lê pêşniyazek ji dûr, ji Entalyayê ji hêla jineke kurd ve hat kirin. Hestên xwe anî zimên û got divê wergere zimanên din jî, da çi jin çi mîr ji heza di Eroûtîkayê de bê par nemînin. Min destûr da. Lê ya ku ez ê ji bîr nekim, li Stenbolê hat serê min. Keçeke zor ciwan ji min re beşin ji Eroûtîkayê xwend. Hebekî sewsî, bi kêfxweşî min guh da newaya dengê wê.

✓ **Yanî hez ne şerm e?**

Na, hez ne şerm e. Şerm ew e ku meriv ji hezê hez neke, hezê tehm neke!

✓ **Di “Çil Çarîn”ê de tê dîtin ku çarîn li ser gotineke pêşîyan dest pê dike û dûre helbest xwe ji gotina pêşîyan rizgar dike. Ev; fikira T.S.Eliot ya ku dibêje “Di helbestê de divê katalîzorango tiştên ku reaksiyona helbestê bi leztir dikin û piştî helbestê naguherin hebe” Lê ji aliyekî din ve jî vê dî-**

wana te gotina Cemal Sureyya tîne bîra me “Folklor li dijî helbestê ye.” Vê dîwana te bixweber dikeve navbera Xelîl û Celîl. Li ser van tiştan dixwazî çî bibêjî?

Rojekê Rênas Jiyan ji min re çî got tu dizanî? Got “Mamoste mîna ku tu li mijarê difikirî û helbestên xwe dinivîsî” Min got Rênas “Tu rast dibêjî.” Di van sî salên bihurî de, ji hêla tematîkê ve, ji hêla çêjê ve sê dîwanên ji hev cuda... Ev pariyeke lêgerîn e. Meseleya “Çil Çarîn”ê jî wisa bû, min digot ez ê nêzî 1000 çarînî binivîsim. Lê her ku min nivîsand min bala xwe dayê ku çiqas zor e. Wek ku te jî got Cemal Sureyya dibêje “Folklor li dijî helbestê ye” û Eliot jî dibêje “Divê tiştêk hebe helbestê veguherîne û bileztir bike.” Min xwest ji dijminahî û lidijîbûnê bêtir wê katalîzorê têxim nav. Wekî ku tu jî bi ser ve bûyî, mebesta min ji wê mehkemekirina çanda bav û kalan a ku ji me re hiştine ye. Min xwestiye rasterast, li tevî xwe ez bi xwe re wan çarînan, wan biwêjan pir bikim. Û pê re li ber çavan raxim; ka em çiqas bi wan ve, bi wê çanda ku ji me re hiştine, ya ku em dibêjin dewlemend e, ya ku zexm e; em çendî, çawa, çiqas û li ku dera wê ne. Beriya min hinekan ev şêwe di edebiyata kurdî de pêk anîbûna, min nedikir. Ji ber ku ez wek nivîskarekî, wek helbestkarekî dixwazim tiştên nû biceribînim û dixwazim bidim ser riyên xwenûjenkirinê. Jixwe min di pêşgotinê de jî gotiye, çarînen kurdî û yên erebî ne wekî hev in. Mumkin e ne îro, lê siberojê hin kes wan çarînan bi destan binivîsin û li odeyekê, di kevalekê de daleqînin bi dîwar ve.

Wekî gotina dawîn; hûn bala xwe bidîne hûn ê bibînin ku gotina pêşyan an jî biwêj di nava ristên çarînê de wenda dibin, teşeyekî din digirin.

✓ **Gelo berê berê çarîn di hişê te de zelal dibûn an jî gotinên pêşyan?**

Gotinên pêşyan. Min gotin hildibijartî û wisa dinivîsî.

✓ **Te “Bakurê helbestê/Antolojiya**

helbesta bakur” amade kir. Wek amadekarê vê antolojiyê, li ser helbesta bakur bi kurtî tu dikarî çî bibêjî?

Bi qasî ku ji me re hatiye gotin û me xwendîye, bûyerên civakî, rûdan û qewimîn dikarin bibin/dibin sedema geşbûna helbestê û pê re jî tevgereke wêjeyî. Ev xweserî mixabin li ba kurdan berevajî ye. Tevgereke civakî, berxwedaneke nedîtî, bêhempa heye, lê li aliyên din sûretê hunerî, ne sûreteke zexm, ne sûreteke rengîn e. Di sî salên bi şer re bihurî, ma ne diviyabû bi sedan dîwanên helbestan hebûna?

Lê, ya li ber dest, wekî vê biwêjê ye: Navî giran e, mezeli wêran e! Dema em li ‘mezeli wêran’ dinihêrin, em sê kêlan dibînin. Kêla yekemîn a salên 70’yî ye. Ku bi helbestên Cegerxwîn û Mele Îmadedîn ên nenivîskî, yên ku di teyban de dihatin qeydkirin û li qadan belav dibûn. Ez li vê yekê rast hatim, wê serdemê çend kesên din hebûn bi helbestê re hemhal. Yek ji wan Dilbîrîn e, ku ew jî bê dîwan e, helbestên wî ji devan belav dibin. Erê helbesteke lawaz e, lê mirov dikare wekî nimûneyên helbestê binirxîne.

Kêla duyem Tîrêj e. Bi Tîrêjê re êdî em li tijkên helbesta kurdî rast tên. Lê wekî ji we ve jî eyan e, Tîrêjê nikaribû bibe rojê pir *Tîrêj* û biçirûse. Dîsa jî; Tîrêjê çend helbestkarên zexm ên wekî Rojen Barnas, Berken Bereh, Mem Ronga li şûn xwe hiştin ku dikarin bibin spartek û pala helbestkarên li pey xwe. Li van navan em navê Sabah Kara zêde bikin jî; derbeya leşkerî bû sedema dengvebirina helbestan û pê re jî bédengiya gelemperî.

Ev bédengî tê, tê di 1992’yan de xwe li kêla Rewşenê digire û dibe dengvedanek. Êdî îro ev dengvedan ku bi helbestkarên vî nivîsî re bû olanek, olaneke ku ji rûpelên dîwanan hildiperike beyara hestan, çiyayên dilînan.

✓ **Mirov dikare bibêje ku nîfşê Rewşenê piçekî şûm e jî!**

Şûm û hew?! Carinan ji kek Berken

Bereh re dibêjim, em in ên “Li şûna pezên pir man du kavirên kur.” Nîfşê Rewşenê nîfşekî bi gir e. Lê mixabin ji wî nîfşî yên li ber dest niha pênc, şeş kes in. Kawa Nemir, Rênas Jiyan, Lal Laleş, Îrfan Amîda, Osman Mehmed e. Em Şexmûs Sefer ji ji bîr nekin. Lê Şexmûs ji wekî bi çavê helbestkariyê li xwe naey-şîne. Û Osman, yek ji wan kesan bû ku min gelek hêvî ji wî dikirin. Tehmeke din, çêjêke din hilgirtiye helbestê, lê pariyekî afirînerêkî tiral e. Lê gava ku em bên ser sûretê helbestê, îro ji dibêjim li bakur helbest bi erka xwe re nebûye. Nekaribûye xwe ragihîne civakê. Sedema wê ya bingehîn çi ye? Li ser vê rewşê divê helbestkar bihizirin. Ne tenê kêm-xwendiniya kurdan sedemek e; berhemên heyî divê bêne raçavkirin.

✓ **Gelek helbestên te bûne stran û ligel ku helbestên te xwendina wan bi xwe jî zehmet in. Divê mirov bi alfebeya Arjen Arî zanibe. Ji ber ku zimanekî te yê arizî heye. Tu dibêji “Mi’jte” heke tu bibêji “Min ji te” fonetîka helbestê xera dibe. Dema ku tu helbestên xwe dinivîsî tu qet lê difikirî ku hinek kes wê wan bikin stran?**

Min qet hewl nedaye ku helbesteke min bibe stran. Mîmkun e ku di hundirê min de wekî dilîneke veşartî be ev xwestek. Li gorî min rîstesazî û bendsaziya di helbestê de rasterast notakirina peyvên a li ser kaxizê ye, jixwe. Ez wisa lê dinihêrim û dibêjim her helbestkar newaya xwe ya helbestî peyda dike. Heke helbestkar newaya helbesta xwe nikaribe pêk bîne, wê gavê girêdana helbestkar û helbestê girêdaneke xav e. Li Silêmaniyê ji min re gotin “Tu helbesta xwe dikuji bi vê şêwexwendinê.” Min got, “Ji dêvila kesekî din bikuje, ez ê bi destê xwe bikujim.” Wekî li jorê ji min lêvand; her peyv li ser kaxiz dariştina notayê ye di nava rist û bendan de. Li vir tu nikarî wek helbestkar dengêkî din bidî helbesta xwe. Miqamê hemû helbestên helbestkarekî/ê yek in, bi miqamekî tê xwendin. Dema ku ez helbesta xwe dixwînim, heke venegerim kêlika ni-

vîsandinê, mixabin nikarim helbesta xwe bi rêk û pêk bixwînim. Û dibêjim, ‘Ne ji mafê helbestkar e, ku newayê, têxe pêşiya bi per û baskirina gotinê.

✓ **Heta niha me tu ji helbestên te nas dikirî. Lê te pirtûkeke çîrokan jî diyarî pirtûkxaneyê kurdî kir. Piştî şeş diwanan çîrok tiştêkî çawa ye?**

Piştî çîrokê “Xame Sihurî Kaxiz Şiyar Ma” tê. Ma tenê nîfşê Rewşenê bi gir e? Ez jî bi gir im û hebekî jî muzir im ji! Ew berhem bendera nivîsê hevcê in. Ku em bên ser pîrsa we, bi taybetî di edebiyata kurdî de her kesî xwestiye bi helbestê dest bi edebiyatê bike. Tu bala



xwe didiyê an helbestên wan qels in an jî piştî helbestên qels derbasî şeweyeke din, şaxekî din ê edebî bûne. Kek Mehmed Uzun û Firat Cewerî du mînak in. Lê piştî demekê niherîne ku ne karê wan e. Dageriyane ser pexşanê. Di 1996 an 1997'an de bû nîqaşek hebû, digotin "Helbesta kurdî li pêşberî pexşana kurdî asteng e." Min got "Hûn neheqiyê li helbesta kurdî jî dikin û li pexşana kurdî jî dikin" pexşan pexşan e, helbest helbest e. Wê demê jî ji min xwestin ez pexşanê binivîsim lê min got "Ez bi gotina we pexşanê nanivîsim" Tiştêkî xerîb e, nivîskar û rewşenbîrên kurd çawa dikarin bihizirin ku helbestkarekî kurd nikare çîrokê yan jî pexşanê binivîse. Ev hizir bi xwe hizreke xwebiçûkdîtîne ye. Dema ku min çîrok nivîsandin, ne ji bo ku ez vê psîkolojiyê ji ser xwe biavêjim min nivîsî. Çîrokên min hebûn ku min ê rojekê ew binivîsandina. Lê ez li hêviya westê bûm, ku ne ez li deriyê çîrokê; çîrok li deriyê min bide.

Çîroka ku min nivîsandiye ne çîroka ku heta niha hatiye nivîsandin e. Ez ê pariyekî quretiyê bikim, ev şeweyîrok mimkun e ku di edebiyata dinyayê de jî tune be! Di ya kurdî de hey tune! Heke hebûya min nedinivîsand.

Çi bi çîrokê, çi bi helbestê tu nûtiyekê neynî, wê demê nivîs dê beyhûde be. Lêgerîna min a li xweseriya teşeyî û nave-rokî misoger e. Ev taybetmendiyê min e. Ev ji bo quncika min a rojnameya Azadiya Welat jî wisa ye. Arjen Arî dema ku nivîsand divê gotineke wî, şeweyekî wî hebe. Çîrokên min hebûn. Û min nedikarî wan çîrokan bikim helbest. Taliyê jî ji evrazên helbestê dageriyam beyarê çîrokê. Min di pêşgotinê de jî diyar kiriye, du kes in ku min spasdariya wan kiriye, yek jê pîra min Finca Xelîl e û yê din jî Helîm Yûsiv e. Bê henek dema ku min Helîm Yûsiv xwend, ez, wekî ku dibêjin zikopişt bûm, kêfa min hat. Çima? Ji ber ku ez rastî çîroknûsekî zexm dihatim. Helîm kir ku ez li çîroka xwe bivarqilim. Lê tiştêk heye, çîroka ku min nivîsiye, ne ya pîrika min e û ne jî

ya Helîm Yûsiv e. Çîroka Arjen Arî ye

✓ **Ev serê sê yan çar salan e bi awayekî periyodîk tu di rojnameya Azadiya Welat de jî dinivîsî. Dema mirov li şeweya te dinihêre, mirov dibîne ku tu pêşyan -gotinên pêşyan- didî pêşiyê. Tu di nivîsên xwe de gotinên pêşyan zêde bi kar tînî, bêtî ku ew serî ji te bistînin û wan bi rê ve dibî.**

Em ê vegerin ser Cemal Sureyya. Folklor ne dijminê tiştêkî ye, dewlemenderê wê ye. Maks Jacob analîstekî frenewî ye dibêje "Heke tu bixwazî bibî helbestkarekî zexm, divê haya te ji ferhenga wî zimanî hebe. Hemû peyv, qalib û gotinên wî zimanî divê tu zanibî." Niha ez nivîsa xwe bispêrim peyvên pêşyan, ez nivîsa xwe dikujim. Lê gava ku ez nivîsa xwe bi peyvên pêşyan bi çêjtir û bi tehmîr bikim ku nivîsa min êdî tehmeke din bide gotinên pêşyan, wê gavê tu dewlemendiyê ku her kes para xwe jê werbigire derdixî holê.

Ji hêla din ve, xetere ye, ku tu gotinên pêşyan di nivîsên xwe de nikaribî bi cih bikî. Wê gavê bi wê nivîsa rijî, tu yê xwe bikujî! Lê dema ku tu karibî gotinên pêşyan di nivîsa xwe de binixumînî, wê çaxê, bi qewlê bavê Lal Laleş Cemal Sureyya ji xwe re diçîne şorbeyê!

✓ **Xebatên te yên nû hene?**

Nivîs rêwîtiyêke dûdirêj e û qonax bi qonax e. Li hin cihan tu radiwestî, tu bêhna xwe vedidî. Ew bêhnvedan dikare bibe sedema te ya dixewreçûyîne jî. Lê rêwîtiya nivîskar a li ser riya nivîsê naqede, heta mirinê ye. Peyveke kurdan heye "Heta mirinê çav li kirinê." Ev ji bo nivîsandinê jî wisa ye. Quncika min a Azadiya Welat wê bidome. Min soz daye, soza helbestkaran jî, wekî mehra filehan e! Niha bi du tiştan mijûl dibim, yek jê ew e a ku min nav lê kiriye "Xame Si-hurî Kaxiz Şiyar Ma" ji nav 2000 rûpel gotarên xwe dixwazim bi qasî 500-600 rûpelan jê amade bikim. Bi taybetî ez ê yên di çêja hêçandinê de ne, hîlbijêrim.

Li hêla din, Bakurê Helbestê ji bo



çapa wê ya li Bakur min amade kir, 58 helbestkar in. 2 jê klasîk in, heke ez xwe bigihînim helbestên wan ez dixwazim wan têxim pêşiya nîfşê Tirêjê, Rojen Barnas û Berken Bereh û yên din.

Ji bilî van mijûliyan, du xebat li ber destên min hene. Xwedê emir bide û firseta min hebe, xebata xwe ya li ser helbesta Cegerxwîn dixwazim biqedînim. Ev xebat ne xebateke akademîk e; ji hev vejartina taybetiyên helbesta Cegerxwîn e. Wekî minak; Hetanî ku min negot Cegerxwîn navê xwe ji Ehmedê Xanî wergirtiye, bawer dikim tu kesî nizanibû. Bi wê nivîsê, di helbestê de min serencema bikaranîna maxlasan (Şêxmûs, Hesarî, Mûsayê Hesarî, Cegerxwîn, Seyda û Seydayê Cegerxwîn) destnîşan kir. Bi nivîseke din min destnîşan kir ku Cegerxwîn helbest bi soranî nivîsandiye, Cegerxwîn helbestname nivîsandiye yan jî nameyên helbestî... Û yekem car min got, Cegerxwîn xwe şagirtêkî ji dibistana Ehmedê Xanî dibîne, ku gotiye: *Ne rêberê me ne, ne Mezdek û Manî/ Yek rêberê me heye Ehmedê Xanî.*

Li hêla din, min jê re gotiye “Homeros

Evda! min jê re gotiye “Seydayê evîn û birînê” Disa yekem car em di helbestên Cegerxwîn de rastî fablan tîn. Yekem car Cegerxwîn helbest nivîsandine mîna guftiyê. Ez bawer dikim ji ber acizîya dilê xwe deng daye wan. Şivan “Kî me ez” xwendîye lê “Kî me ez” ne miqamê Şivan e. “Kî me ez” miqamê Cegerxwîn e. Lîrîzm û notayên di nav helbestê de wê newayê didin destên te. Dema ku tu ji Cegerxwîn guhdarî dikî, tu dibêjî tamam, miqam miqamê Cegerxwîn e.

Ku em bîn û dagerin ser pîrsa we; berhe-meke din heye bi navê

“Rojnûska Serhildana Şêx” Ev kronolojiya serhildana Şêx Seîd e, bi devê Şêx em dibin şahidê serhildanê. Ev ne helbest e, ne çîrok e, ne jî roman e. Ev jî xebateke min a xweser e. Ji bo ku wê biqedînim divê ez biçim gundê wî û herêma wî. Ez nikarim Pîranê wekî gundekî Omerîyan bişayesînim. Û nikarim şêxekî wekî mirovekî ji rêzê biaxivînim.

Divê bixwînim û hebekî bigirim... û heke mabin, li serborînan guh bidêrim.

✓ **Gotineke te ya dawîn hebe...**

Gotina min a dawîn ez spasdarê we me. Ehmedê Xanî çendî gotibe “*Hebûya me jî xwedanek*” xwedanên ku Ehmedê Xanî destê xwe ber bi wan ve dike, mîrêkên kurdan bûn, begên kurdan bûn, desthilat bû. Lê îro roj ‘xwedan’ gel û xelk e! Yanî nivîskar ne bi xwedî ye; xwedî hê nû bi ‘xwedîtiya’ xwe dihesê.

Bi hêvî me, hezarên ku dikevin bin darbesta nivîskaran, bi hezaran berhemên wan jî dê bireqîfnin refikên pirtûkxaneyên xwe yên di malan de.



Derwêşê tekiyeya helbestê Arjen Arî

Berken BEREH

*ji tama maçan e, her rist
bi şehwet, bi coş der bûye
ji zozan û terazinên vî gelî
û xweşreqase di govenda şoreşê de
di helbesta arjen arî
ji rengê tîrêjê ye
deng vedide li geliyên bindestiyê.*

*ez wê dibînim
li lûtkeya her çiyayî*

Tîrêja ku xwedî temenekî pir kurt e -çar hejmar- jî di kovargerî û wêjeya kurdî de xwedî nav û dengê bilind û pîroz e. Lew, Tîrêjê û nivîskarên wê piştî bi dehan salan ku dagirkeran bi programên bişavtin û her cure çekên xwe kurd û wêjeya kurdî xisti-bûn bin nîrekî zor dijwar, serî hildan û xwestin vê çarşeva reş biçîrînin û keleha zilmê bi hêza peyvê birûxinin. Helbest di Tîrêjê de xwedî cihekî resen bû û heta îro jî helbestvanên wê, di qada helbesta kurdî de xwedî nirx û rûmeteke giranbuha ne. Yek ji van helbestvanan Arjen Arî ye ku di “tekiyeya helbestê” de wek derwêşekî tevdi-gere û dixwaze deng û rengê wê ragihîne her kurdî/ê.

Arjen Arî berdevkê serhildêr, evîndar, neçar, xizan û bê kes û kûsan e. Ew, di rojên ku xortên kurdan alaya rizgariyê dimilmilandin de bi petva xwe li rex wan bû. Dema di zindanê de, li êşkencexaneyan li ber xwe didan, dema gundên me dihatin şewitandin, civak mecbûrî penaberiyê diki-rin, xort û keç û kalên me li kolanên xerî-biyê hêvî û daxwazên xwe binax dikirin jî li cem wan bû. Ji ber hindê bi rihetî ez dika-rim bibêjim ku ew, helbestvanê berxwe-dan, xweragirî û mêrxasiyê ye.

Arjen Arî yê di dawîya salên 1970'yî de dest bi helbestê kirî, jî ber sedemên diyar encax 1999'an de helbestên wî bi navê

“Ramûsan min veşartin li geliyekî” bûn pir-tûk. Qedera helbestên wî û ya neteweya wî yek e. Lew, hevîrê wê, civaka wî ye. Ew bi wan re diqehire, bi wan re diêşe û li ber xwe dide. Di “Jînenîgarî”ya xwe de ku weke helbestê hatiye nivîsandin vê dilsoziya xwe aşkere dike, “Ne pênc carên binçavkirinê/ ne jî di sikaka wî bajari de/ birîndariya mi-rinê bû/ sedema ku vî welatî bihêlim/ û biçim.”

Helbesta Arjen Arî, salname û dîroka ci-vaka kurd e. Ewî bi rêya helbestê serpêha-tiya gelê kurd a sih û pênc salan bi awayekî helbestî daraştîye ser kaxez. Jixwe navê pirtûkên wî sembol û rûpelên vê sal-nameyê ne. “Ev çiya rûspî ne”, “Destana Kawa”, “Şêrgele” û hwd.

Arjen Arî di helbestên xwe de zimanekî navneteweyî bi kar aniye. Temayên wî berxwedan, hêvî, bawerî, evîn, car caran jî rengên dilmayîn û xeydokî jî tîn dîtin, ku ev tev sembola mirovbûyînê û encama heyam û qonaxên serûbinbûyîna nirx û hêjayiyên kevnetoriya gel in. Ew, her qewi-mîn û bûyerê bi şert û mercên pêkhatina wan û bandora wan a li ser civakê bi rêba-zeke dîrokî û bi hêmayine helbestî raberî me dike. Hawar û hêviya neteweyekê, bi vegotineke helbestyane û bi tîriya hestên însanî radigihîne cîhanê.

Wek ku min li jorê jî destnîşan kir “Ra-mûsan min veşartin li geliyekî” berhema yekemîn a helbestvan e. Ev berhem bi der-ketina xwe re wek mizgîniyekê hat pêşwa-zîkirin li derdorên helbestvan û helbesthezên kurd. Arjen Arî di vê berhemê de vegotineke bi rêk û pêk û kartêker bi kar aniye. Hema bibêje di hemû helbestan de rewş û şert û mercên dijwar ku gelê me dijiya wek kamêravanekî, kamêraya xwe li ser rûyê welêt digêrinê û tiştê dîtî, bihîstî, jiyayî nivîsiye. Di vê nivîsê de ew lehengê

sereke ye, lêdan xwariye, hatiye zindan-
kirin, penaber bûye, gundê wî hatiye şe-
witandin hwd. Vê cure vegotinê û
zimanê wî yê ji kaniya gel herikî, xwînsî-
rînî û dilsoziya wî temam kiriye û kiriye
ku her kesê/a bixwîne bibêje ku ew
kesê/a nivîsiye ez bi xwe me. Her wiha
bi vê lixwewarqilînê, wek kesê di çîro-
keke gelêrî de ku tê gotin ku dema
“Dadger, daxwaznameya parêzer jê re
nivîsî dixwîne, gilîker bi qîr û hawar di-
girî û dibêje ev giş hatine serê min
nexwe.” Xwe û birîna xwe dinase. Hingê
mecbûr e ku ji bo dermankirin û çare-
serkirina pirsgrêkê li ber xwe bide û bi-
keve nav hewldanê.

Berhema wî bi helbesta “Herekol”
dest pê dike. Herekol navê çiyayekî ye li
Kurdistanê. “Min, serî netewand li hem-
ber rîman tu carî” ji devê wê tê gotin ku
ev hêma di hundirê xwe de wateyeke pir
kûr dihewîne. Li bejn û bala kurdan tê
û wan û berxwedêriya wan û hesreta
wan a ji bo azadiyê dinimîne. Jixwe di
“Çarîn”ekê de “bê Xwedê dibim, bê ax û
al na!” dibêje.

Em baş dizanin ku her berhem di
hundirê xwe de jîyan, kevnetorî, hel-
west, bertekî û pîroziyên civaka xwe ne
rasterast be jî bi sembolan bi cih dike.
Berhemên Arjen Arî mişt bi van rîtûelan
dagirti ne. Ew, ji şivanekî bigire, kur,
keç heta cerdevan û her cure teyr û te-
bayê ji xwe re dike malzeme û bi wan re
welatekî û birîna wê ya xedar û diltezin
radixe ber çavan;

*“şivanekî biramîne;
pezê xwe nikaribe berde geliyan
navê berxa xwe nikaribe deyne “şen-
gilo”
ne ji tîrsa teba, ne ji xofa guriyên çiyê”*

Helbet ev zîlm û zora wek çarşeveke
reş ketî ser rûyê vî welatî dê her tiştî bi
destê xwe bilewitîne, birûxîne û tarûmar
bike;

*ving û vala ye niha
Cibiltinê, Xirbê Hinarê, Serê Kaniyê...
Cinata te, Miho!
Silêman, Çala te!*

*de... li xwe xe Sadûn
li ku ma axatiya te?*

Belê; sewal, dar û her cure mêweyan
jî para xwe ji talankeriyê standiye;
*ar girtiye qurm
û li dorê dileyize
çi kiribû
çi bû gunehê dara berû?*

Erê dijminahî bêminetî ye, çi ji destê
kê bê. Lê ya ku dilê wî dişewitîne;
*hooo biraaa!
vê xwîne qene
tu nerijîne, heyra!*

Arjen Arî, bangî “Kirîvê Kêvo”dike û
dixwaze “Kêvo” wî bibexşîne ku di fer-
mana wan de qewmê wî jî neheqî kiriye;
*ne deynek me li hev bû
ne xwînek, ne sersînorek...
kirîvê min di qeflê de çû!
lê mazereta xwe jî pê ve dike;
bide xatirê xizaniyê
kirîvo, em nezan bûn!*

Û piştî vê panoramaya diltezin û reş-
tarî, wek agirê şivanî ya li lûtkeya çiyayî
diçirûse, hêvî û berxwedêriyê;
*bi ya helbestê min kir
û min guh da bilûra şivên
hij min aland li desmalek bi vên
û ramûsan min rakirin geliyekî...*

Bi wî dengê xwe yî gur radigihîne me.
“Ramûsan min veşartin li geliyekî” bi
dirûv û teşeya xwe minakeke nû û mo-
dern û lûtkeya çîrokhelbestê ye.

“Ev çiya rûspî ne” duyemîn berhema
helbestvan e. Hê di rûpela ewil de goti-
neke pêşiyên “zêr zane, zor zane, devê
tîfinga bi mohr zane” hatiye bicihkirin.
Ev helwesta Arjen Arî dike ku berî
xwendinê em di der heqê berhemê de
bibin xwedî hin hizr û ramanan. Bi ya
min wiha nekira wê çetir bibûya. Lew,
sînordanîna li hember ramyarî û hizirki-
rina xwendevan dike ku berhem bi ça-
vekî negatîf bê pêşwazî kirin. Helbet,
helbestvan ji terciha xwe haydar e. Hê di

helbesta ewil û ya pey wê re em rastî bilin-
dragirtina hestên berxwedêrî û daxwaza tê-
koşînê tîn. Bi her rûpelê sedemên vê
daxwaziyê yek bi yek raberî me dike;
“Çûkên şer” di esmanê welêt de fortan da-
vêjin, “Mûsayê wî” hatiye kuştin, “Xwîna
me di mazatê de ye”, “Çiyayên wî nestêle
ne”, “Nêrgiz stûxwar”, “Beybûn peritî”,
“Dar bi gazind” in ji dorparêzan, nûçeyên
şer agahdariyên yekemîn in di hemû nav-
gînên ragihandinê de, “Di şer de bûm doh
jî loma / îro şer e, sibê şer e.”

Bi qulipandina rûpelan ev rastî hino
hino digihê lûtkeyê û bi helbesta “Ev çiya
rûspî ne”;

“loma, bi Sîpan in stranên me / ka bis-
trê, heyran!” û wek her helbestvanê
mêrxasî, berxwedêrî û xweragiriye
sedemên bîr û baweriyê rêz
dike; “Di qada şer de piştta me
negihîşt erdê” û şahidên wî
çiyayên welatê wî; Cûdiyê
Miradan, Gabar, Agirî,
Sîpan, Şîmal, Bêxêr... ku
tu carî lome nekiriye ji
wan û bûne nav ji zarokên
vî welatî re, çi keç çi kur.
Ji van têbiniyan dixuyê ku
ev berhem berdwamiya
“Ramûsan min veşartin li
geliyekî” ye.

Arjen Arî û helbesta wî, wek
ava ji baniyên bilind herikî û gi-
hîştîye robarê xwe bi coş û peroş
diherike û ev dengê gur û aza ji nas-
nameya xwe ya takekesî (ez) rizgar dibe û
kirasê “em”ê li xwe dike. Her wiha rikn û
stûnên helbesta xwe ya dastanî bi vê ber-
hemê datîne û bilind dike. Kes û komên di
berhemê de bi goşt û laş in û hest û bestên
wan dike ku bêhtir bawerî û dilsoziya me
bi berhemê were. Leheng û karakterên wê
ji sembolên pîroz û efsûnî dûr in. Kesên ji
rêzê ne, wek min, te, wî; car caran diten-
gije, hêrs dibe, xemgîn dibe;

berê min ketiye xozatê;

“egîd im
nihîte
û hijde salî”

her êvar;

“birçiyê te me ez birçiyê te
qesta goştê te dikim her êvar”

gazin;

te ez şandim şer û te negot min
şerê ku tu diçiyê çavan jî dixwe!

çarîn î xewn;

xwîn rawest, dem verşiya
şûr şikest mertal tewiya
ji qada şer şerbaz reviya;
xewnek me bû, rizgarî!

û carna wek ewareyekî tevdigere;

“min daye du her dû lingên xwe”

Û dilê m’ tu derwêşek î
dilê kê seh dikî?
qesîda te betal e!



Her wiha di vê berhemê
de em rastî erotîzmeke
sergirtî û şermokî tîn ku
me hînî “Eroûtika”ya dê
wek yekem berhema
erotîk li Bakur şîn bibe,
dike.

Disa wek berhema
yekemîn, di vir de jî tra-
jediya gel û komên ji ber
cudahiya baweriyên xwe
yên olî dibin armanca pest
û pêkutîyan, ji xwe re dike
mijar û vê êşê par ve dike.

Helbesta Arjen Arî, ji “Ramûsan
min veşartin li geliyekî” heta “Şêrgele” her
bi heman şewaz û vegotinê bala mirov diki-
şîne. Ev vegotin wek ferhenga wî bi teql, çi-
yayî û nêr û berxwedêr e. Trajediya bi
sedan salan a li vê xakê hatiye jiyîn, wek
tevnkarekî bi sebr û hostatî vedibêje û digi-
hîne îro. Helbestên wî, wek manifestoya
pêşmergeyekî ku dikare li her derê olan
bide û bête jiberkirin, xwe berdide nav dil û
hinavan. Vêya jî wek ahenga dengê qoça şal
û şapikê bi hêminî û bi harmoniyê pêk tîne.
Gelek caran em, wî li lûtkeyên Cûdî, li kê-
leka pezkûvî û karxezalên singsor, carinan
jî li nav xirûcira Ofisa Amedê wek derwêşê
kurmancî, banga lixwemikurhatinê û mizgî-

niya dahatûyeke gewre belav dike, direşîne.

dem spî, aso spî, ba guzan
ev gelî Geliyê Zilan
di çend kêjan werbûm û rabûm
tev de tev de 29 bûm
navekî min bû şikestin, navê din bû serhil-
dan!

Li vir pirsgrîkê bidestxistina serdestiya
dil e. Ji ber vê hindê carinan kewara hiş û
mêjî bi helbestên Cegerxwîn dadigire û bi
vê re jî di zeviya peyrevên xwe de, dest bi
çandina tovê helbesta xwe dike. Bi demê re
helbestine ku wek oratoryoyê bên gotin zeft
dike,

ewr spî ezman spî erd spî
ba şûm, bahoze dîn-dînoke
çar rê kor in, çar dor sik î spî
û çar hêl çarmedor, heta noqê d' berfê
de!

Wexta em bûn serdestê dil hingê em di-
karin zemanî, cihûwarî, hemû kêlikên ji-
yanê zeft bikin. Lewre em dijîn da ku
bersivinan bibînin ji bo armanc û heyîna
xwe ya li vê dinyayê. Yan na tu carî em ê
nikaribin ji "welatê nefiyê" vegezin "serba-
jarê serbajaran". Ji ber vê ye ku di hel-
besta Arjen Arî de
hawara kurmanciyê
dibiriqe, trajediya kur-
dan a sedsalan olan
dide. Helbestên wî di-
şibin reperepa lingên
leşkerên ordiyekê.
Dema tê xwendin dî-
menên ordiyekê di-
meşe tê nîgarkirin.

di binê aşûteke
xezeb-spî de man
an çûn li ber pêlên
aveke tezî?

xwezî ez miribûma,
û hew bû!

newal bê guh
diman... û şer bû!
çiya bê ser diman...
û şer bû!

şev serjê bû bi ser
rojê de... û şer bû!
şer bû...
şer bû...

şer bû...

mirinê serê xwe çimand li ber mirina
wan

şergele hebûn: şêr î şervan
û xewna wan xewna her kesî!

Ew dengê bi efsûn ê helbestê wek sûla-
vekê bi xumexum diherike. Ew ked û xe-
bata şev û rojan aşkere dixuyê di wan de,
bêhn û rengê îroj tê de diçirûse. Sebr û
mecala tîrêja spêdeyê ku lûtkeyên Here-
kolê dialêsin dixuyê. Xwe bi ayetên E. Xanî
ku ruknê neteweperiya kurdî ye têr dike,
tasek ji helbesta M. Cizîrî ya di tehma
"îşq"ê de ye vedixwe û şûr û mertalê Feqiyê
Teyran û demançeya kurmancî ya Cigerx-
wîn davê ser milê xwe û serî hildide li hem-
ber şaristaniya qaşo hemdem.

şa'ir im; qereçiyê pesnê çavên te
li dabaşa nevê te hevdengê Evdal
şûm im hebekî, hînekî zirz
min ji Xanî bipirs, min ji Hejar
min ji Mela, min ji Hêmin, min ji Dildar
sirûd Ey Reqîb im, pênuş ey reqîb!

Bi her ristê hûn bi xwe ewle û bi bawer
dibin. Wek çinarekê xwe
digihînin rehên xwe yên
hezarsalî. Êdî navê hemû
demsalan bihar û hemû
qonaxên dîrokê serhildêrî,
berxwedêrî ne. Êdî heyam
heyama jixwebawerkirinê,
heyama têkoşeriyê ye.

wê vebe rengo rengo
li dû taveke xwêjinkî,
keskesor
sihareke rûbihar e hê-
viya min
tîrêj-bişirîn rojeke gulî-
sor
ha hilat ha hiltê

A. Arî dildarekî jidil ê
kulilkan e, ew kulilkan
her çiqas gelek caran wek
metaforekê di helbesta
xwe de bi cih bike jî, em
aşkere dibînin ku raste-



rast bi bêhn, bi bejnûbal û bi rengên wan hatine vegotin. Wek; xec, lîloz, binefş... sor, qurmiz...

*ez ê li çiyayekî bikim navê yekê
tu navê qîzekê bigore, bike Beybûn
pel pel hebûn, sor sor serxwebûn
kulîlkan çil kezî bi ser kê de birîn?*

Di helbesta wî de em rastî hawareke sotiner tîn. Ev qêrîn û hawar ne biyan e, lê ne ya axeke bi sînore. Gelek caran şaxên wê ji vî erdnîgariyê digihên ta ber erşa xwedê. Car zêmar, car têkoşer, car mersiyyeyeke ku xweşik, spehî û narîn e. Her peyv wek ritm û awaza dilê wî diherike li newal, gelî û germiyanan. Zû konê xwe vedidin û tîn jiberkirin. Nêw di tehma sirûdandê ye. Bi van taybetiyên xwe, em dikarin bibêjin “Şêrgele” hawar û ûmîd û nasnameya vî xakê ye:

*kê bibêjim, kê ji bîr bikim:
her nav çiyayekî asê
her nav dastaneke dêrîn
her nav dîrokeke wextbir...
min navek li kurê xwe kir:
Rîzo
Kalo
Berzencî...
min navek li kurê xwe kir:
Qadî
Simko
Barzanî...
min navek li kurê xwe kir:
Mazlum
Gabar
Munzir...
min navek li kurê xwe kir:
yek mir, sedî tol hilanî!*

Eroûtîka

Arjen Arî piştî wan diwanên xwe di poetîkaya xwe de guhertineke berbiçav kir. Em bi Eroûtîkayê pê dihesin ku di vî erdnîgariyê de ji bilî êşên civakî û netewî wek takekes ruh, giyan û kesayetiya me jî hatiye pûçkirin. Arjen Arî di vî qonaxê de dide dû van razên me yê nepen û xeternak. Di helbesta kurdî de li ser mijarên ruh, giyan, îşq û pîrsgirêkên hundirîn ê ta-

kekesî helbest hatine lêkirin, lê Arjen Arî bi awayekî cuda daye dû van mijaran. Helbet eşq, ji bo gelek helbestvanên kurd bûye mijara vegotinê, lê ferqeke cuda heye di navbera wî û wan de. Baba Tahir, Melayê Cizîrî ta bigihîje helbestvanên îro, bêhtir eşqeke îlahî û vegotina wêya hunerane tê xuyakirin. Lê Eroûtîka bi her hêla xwe ve dûrî van cureafîrandinan e. Ew, rasterast eşqeke beşerî û azverû û xwestekên beşerî ji xwe re kiriye armanc. Em di helbesta klasîk de rastî van nimûneyan tîn, lê heger em bidin ber hev em dê bibînin ku cudahiyan wan bêhtir in. Şêxê Sen'an a Feqiyê Teyran û Ahmedê Nalbent xwestine eşqê bi awayekî din vebêjin. Lê Şêxê Sen'an di bingeha xwe de li ser eşqa îlahî bejn davêje û bilind dibe. Ahmedê Nalbent jî ji erotîkayê derbasî pornoyê dibe. Vêca Arjen Arî terazûyeke qahîm e di navbera her du vegotin û lêkirinan de.

Arjen Arî di destpêka diwana xwe de vî cudahiye bi me dide zanîn û xwe davêje tor û bextê Melayê Cizîrî û eşqê -bi çî awayî dibe bila bibe- hildikêşe textê qesra pîroziyê;

*qulzema dil îşq' e Mela
çî Xwedayî, çî beşerî
sohtî be b'arê seqerî
her evîn ala ye Mela
dil li me bela ye Mela*

Bi vî destpêkê û îcazeyê dest bi dastan-çîroka xwe ya erotîkî dike. Ewîl xwe û arezûyên xwe yî beşerî bi rêz dike. Lê ev xisletên rêzkirî ji yê evîndarekî wêdetir yê cinsî û zayendî ne. Gelek caran ji sînoren erotîkayê derbasî pornoyê dibin.

*tişteke dilînên min neşê bikewîne
ne maç, ne mistîn, ne hez...
wek gurekî dade keriyê pez
çavên min li te û xelaskirinê!*

Û piştî xislet û çelengiya yara xwe vedibêje. Yara wî ya “bejn kin, çavreş, ling biçûk, lêvên erxewanî, gerdên emberî, tehlên girover... û hwd.

Dastan-çîroka Arjen Arî û yara wî di be-

rêvarekê Ameda ya rengîn de û li taxa Ofîsê dest pê dike. Wexta ew rastî wê tê, bi dîtinekê hiş û sewda ji serê wî diçe û jixweber dide dû û xwe dispêre awirên kes û kûs û ta heyberên (bê ruh) ku giş awirên wan li ser wê ne. Lew bi meşa xwe ya tenik tenikî, bayekî mê dihêle li dû xwe û pîremêrek;

“Xweziya min bi mêraniya berê” dibêje bi keser. Xwe vedibêje; pordirêji ku parsek, pakêtfiroş, boyaxçi... giş binemalên wê wî nas dîkin. Çîrok ta dawîya pirtûkê bi wêne û panaromayên hevşabûnê li pey hev rêz dike. Wek ku em li filmekî temaşe dîkin, wisa bi meraq û heyecanekê çîrok didome. Gelek caran rûyê mirov soromoro dibe û mirov wek ku hinek kesên din jî li cem mirov in, li derdora xwe dinihêre û pêla şermê tê rûyê mirov dialêse. Gelek caran pêla mêranî û arezûyê jî di demarên mirov de radibe pêdarê. Ango pirtûk mişt bi hez û dilînên hevşabûnê dagirtî ye. Di helbesta xwe de helbestvan carinan xwe dispêre ayet û vegotinên pîroz;

*“ji milkên xwe yê ku zarokan tînin
zeviyên we yî beyar in,
we çawa bivê, tov welê bireşînin!”*

Û agirê xwe yê hevşabûnê bi van ristan vedimirîne;

*ne, tu ê bê;
ku min car nekir ser carê!*

*“û ez ketim ser
heta ku rojê şev hilanî!”*

Arjen evîniyê jî kirasê wê yê razber û dûrî rastiya civakê jê dike; wê wek heybereke jîndar daxilî heyatê dike. Bi vê helwesta xwe, hemû helbestvanên beriya xwe dide aliyekî. Ew vê dinyayê û rastiya wê û însên û pêdivî û xwestekên wî yên herî rewa şanî me dide. Arjen Arî, bi vê berhema xwe deriyê quncikê vala yê erotîkiya helbesta kurdî bi hêminî vedike û banga nasîn û dagirtina vî quncikî dike.

“Çil Çarîn” berhema dawîn a helbestvên e û jî zêdetirî çil çarînan pêk hatiye. Arjen Arî, di vê berhema xwe de form/şêwaza klasîk a çarînê ku wek wî jî, di pêşeka xwe

de vegotiye, bi awa û naverokeke din nûjen dike. Ango “ji cawê heyî fesilandineke nû, dirûnkariyeke nû ye.” Em dikarin vê berheme wek berhemeke şîret û pendan jî bi nav bikin. Di avakirina van çarînan de Arjen Arî, car caran gotinên pêşyan jî xwe re kiriye palpişt, caran jî ji bo bîr, raman, hîzr û hestan kiriye jêderk. Hêjayî gotinê ye ku berhema serhevdeya çand, kultur û karaktera kurdan e. Ev berhema dikare bibe pirtûkeke fêrkirina çanda kurdî li dibistan û akademiyên kurdan jî bo xwendevan-qu-tabîyan. Çend mînak;

*ku bikeve kêr pir dibin(1)
tu mekeve mêr pir dibin
kûçik li kelaş pir dibin;
pariyek ne pahra te bê?*

*goştê berazî heram e
heramxur û secd û qam e?
fitû derê j’serê xame
rovî berî devê d’revê!(2)*

*qençkiro bi xwe kiro(3)
xerabkiro bi kê kiro
yê xeraker dibe tiro
avakar be, ku jî te bê!*

Arjen Arî, di helbesta kurdî de bêguman stûneke qahîm û epîgrafeke çeleng e. Ew, wek erdnîgariya xwe bi ber û rikeber û nêr e. Ew, li tu kirasan nayê; xweser û resen e. Tu çi bikî jî nikarî wî, li cihekî bi cih bikî û konê wî deynî. Ew, wek çiyayên welatê xwe her, ber bi esmên ve hildikişe û wek çem û robarên wê di keft û leftê de ye. Ji ber hindê hespê helbesta wî her li tixûbên xeternak bi çargavî dibeze. Em, di helbesta wî de tehm û çêja zimanê kurdî û hêzdarîya wê dibînin li hember zemanî û aşê dagirkeran. Ger hûn bixwazin serborîya vê xakê û helbesta wê ya bi nîrx û rûmet binasin, fermo, ser sifra Arjen Arî!

*Jêderk; Ramûsan min veşartin li geliyekî
Ev çiya rûspî ne
Destana Kawa
Şêrgele
Eroûtika
Çil çarîn*

Wan rojan, risteyên me

Bo Arjen Arî


Kokela'î zemanê çiyê bû kilama niştimanê,
tîp û lekên tozê di zinar û latan wer dibûn
di oxirê de. Em têgihiştin; piştta me dabûn
dîwarê nepakiyê. Ray bi tayê ketibû.

Me yê bi derengî daweşanda dara bûnewerê.
Li binê her şaxekê, bezayekî cegerbixwîn.

Ew roj tûre bûn li ber aramiya gerdûnê.
Îro sed û yek milên xwe yên azadiyê hene van risteyan.

Kawa NEMIR

9 Kewçêr 2007 – Feriköy / Stenbol



*Ji bo poetîkaya Arjen Arî çil deqdeqûşk **

Lal LALEŞ

1- Ji bo peyvên dirinde di dilê me û qeneata me de verastiya heqîqetê peyde bikin peyva esasî bi peywirên xwe yên nû kirasekî helbestê li xwe dike.

4- Ji berî mîlade ve bi destê Kawa digire û qonax bi qonax ber bi roja me ve dimeşe. Di dilê xwe de xwîner vê pirsê dîkin. Di vê rêwîtiya azadî û serxwebûnê de rêhevalên Arjen Arî û Kawayê Hesinkar kî ne?

7- Du stûnên helbesta Arî hene; yek çiya ye ya duyemîn jî dîrok e. Eger tu çiya ji bin peyvên helbesta Arî bikişî, wê dîrok bi ser serê me de xera bibe.

11- Qutabiyê zimanê xwe ye li mekteba şûaran.

14- Hosteyên telkariyê yên Mêrdînî û Arjen Arî dizê qulekê ne, yek dilê peyvê dineqîşîne, yê din peyva dîl diqelişîne, şûşeya dîl dişikêne. Di encamê de sûretek û hêmayek tacîdar dibin.

19- Dara, li Darayê keyskar e li hêmayê.

27- Helbesta wî dernakeve çiya, bi hemdê xwe bi çiya ve hildikişe. Sondxwarî ye bo danekeve beriyê.

W 74

31- Zimanê Arî di navbera helbest û helwestê de hatiye rakişandin. Li ser tîlên dengê wî teyrikên Feqî dilûsin.

32- Çefiya çarçik e Arî. Kurd ji çiçikên wî şîrê şêran vedixwin.

33- Zimanê wî yê ku xwe ji xwe diwelidîne, avzêra avzêma helbesta wî ye.

38- Dema teyr ji berateyan kêr nedibûn, te ramûsan li kîjan geliyê veşartin?

39- Kulîlkên çilkezî bi ser kê de birîn?

*belkî ne bi ser mirovan ve,
belkî bi ser niqutên razber û şênber de,*

belkî bi ser bayê kur ve bi şî-qeşîqa tavê re,

belkî jî bi ser selîxwera yarê ve birîn.

40- Li vî gelî xwîna kê bû hibra fermanan?

Xwîna teyrikên edaletê
Xwîna zarokên keviravêj
Xwîna dayikên aştiyê...

**Ji xebateke Lal Laleş a bi navê
"Deqdeqûşkên Sorgevez"*

Di 'arî'ya peyvê de 'arjen'eke h-ar

Omer DILSOZ

arjen arî, yek ji wan şairan e ku bi kurdî li ser coxîna peyvê; peyvê bi peyvê şeh dike. di vê serdema ku 'helbest' di coxîna sms û kulîfeka msnê de bûye dixelê ber simên hesp û mehînen kihêlan, arjen arî, wek siwarekî ku peyvê ji peyvê vedi-jene, kurdî bi kurdî dikêle û bi peyva xwe nîşanî me dide ku 'helbest' dayika hemû gotinan, her û her serokaniya hemû hest û bîr û boçûnan e...

ez bawer dikim, di vê dosyayê de jixwe hevalbendên me dê bi berfirehî li ser hemû aliyên helbest û helbestvaniya arjen arî, têra xwe ronahiyê bidin pêş, ji ber hindê, ez ê çu nirxandinên 'zanistî û zanayî' nekim, berevajiyê vê, ya min, min got bila gotineke min ji li ser vê sifreyê hebe; nexwe, ez baş dizanim ku ez çu bibêjim, ez ê nikaribim behsa kûrahî û meziniya peyva kekê arjen bikim...

arjen arî, di avjeniya peyvê de ew çend şareza û jêhatî ye, çu carê du caran di xetekê re naçe û dikare bi peyvê tofana wateyan rake û ji peyvekê hêmayên kûr ên peyvan vejene.

arjen arî, di hûnandin û lêkanîna hest û bestên xwe de, ji toza peyva kurdî ya resen neqş bi neqş hêmayan vedihûne û tîne di tevna modernîteyê de dirêse û bi vê jî, helbesta kurdî di vê toz û dûxana serdemê de zil û zelal li ser piyan digire.

ji ber hindê jî, di helbest û helbestvaniya arjen arî de, mirov dibîne ku her diwan û helbesta nû, li gorî vê ruhiyeta dema tê de û ronahiya bo ber bi asoyên pêş de, di heman kevanê de wekî peykerê baş hatiye nikirandin, li ber çavan diçûrise û bi bêhn û tîna xwe digihîje reha dilê mirovî.

arjen, hay ji pêşiyên xwe; ji kelepora ehmedê xanî û nexasim cegerxwîn, li ser rîya wan, lê ne di 'xeta wan de' bi peyayî û pê-

xasî peyva kurdî ji qalikên wê veçirandiye û bi peyvên zelal, xwîneke nû darijandiye demar û reha wê peyvê.

ji ber hindê, mirov dişê bibêje ku arjen arî, ne tenê helbestvanî kiriye, di heman demê de bi peyva xwe endezyariya hest û ruhê zimanekî birîndar ji kiriye û ew aniye di helbestên xwe de ji nû ve 'xwedanrûmet' kiriye.

çawa mirov bi helbestên di diwana eroûtîka de di wesleyên bedenên ruhê kur-mancî de sermest dibe û di jêrhişên pişt, bi qewlê dengbêjan 'çit û perdeyan de' li

sing û ber û bedenên kurmanciya şehwetê ji nû ve nas dike, di heman demê de, bi şêrgele, dol bi dol, newal bi newal li geli-yên asê yên dîrokê digere û xweşmêrî û kurdperweriyê ji nû ve di hemû wesleyên bedena xwe de seh dike û pê dilerize...

bo wê jî, kekê arjen, ne tenê mirov li bayê tehsî rewan ê peyvê siwar dike, her wisa, mirov bi peyvê dilerizîne jî... arjen arî, navê dilerzika helbesta

kurmancî yê nûjen e.

ez bi du munasebetan bi kekê arjen re tevlî du bernamayan bûm; lê, yek ji wan ji ber ku -mixabin- tu kes nehatibû, (rewşa kurdî ya bakur malûm e) hate betalkirin, a dîtir jî, gava ez, li kêla wî û kekê berken bereh bûm, min ev hizir dikir ku ez ê rojekê van hestên xwe binivîsim û bibêjim: qenc bû, min ew lehengên peyva kurmancî dîtî ku di serdemeke hemû çirayên kurdî hatine tefandin de, wan bêtî ku xwe bispêrin sînorên derewîn ên diasporayê li ser axa xwe, her rîka xwe bi kurmancî girêdan û bo me ev mîrasa bêhempa hiştin.

***Li ser daxwaza nivîskar me tîpên hûrdek nekirin tîpên girdek. Kovara W**



Di helbestê de simbêlên Arjen

Ferzan ŞÊR

“Û Arjen, wek simbêlê xwe badide hestan, hinekî serserî, têra xwe mêr (egîd), hebekî romantîk” f.ş.

Simbêl li derinên din çawa ne nizanim lê li Kurdistanê her kes dizane ku nîşaneyê mêranyê ye. Lewre yê ku hê av di gunikan de nagere zarok serê pûrtên xwe yên zêrîn didin ber giyotinên jilêtan, da ku şivên baxçe bibin darên qewî. Bi siya simbêlê ku hîna wek xêzkirina binê hevokeke girîng e, çeng û ling bi awayekî dibe per û baskên jêhatibûnê. Bi vê destpêkê re, divê hin hêmayên ku em ê di gelek xalên vê nivîsê de bi kar binin bîn ravekirin.

Mêranî; em ê bibêjin bi bawerî û wêrekî pêşengiya civakê ye.

Simbêl; cil û bergên wê bîr û dozê ye. Alegoriya wê mêranyê ye. Lewre ger mirov bingeha “simbêl” hinekî bikole digihê nêrîtiya wî. Bi taybetî di helbestên Arjen Arî de ger mijar gastîn û mêranî be, bi vê hêla xwe ya nêrîtiyê dertê holê. Lê ger mijar evîn, hezkirin, bêrîkirin, veqetîn, dê û bav be ji nişkan ve dibe mê û dilên me mizdide.

Wî ne tenê di helbest û rêzikan de, di heman demê de bi aktivîstiya xwe jî li pêşberî me ye. Di qadan de çalakvanek e, di dikan de axaftvanek. Di eslê xwe de divê nivîskar ne tenê di hundirê menzela xwe de hunerên xwe pêk bînin, divê carê di kolanan de bibin mirovên jî rêzê, tevli refan bibin. Carê jî divê dest biavêjin têkoşîna şênber. Ji sedema vê erka wî ye, dewleta tirk ew wek xetere ye pergalê dîtiye -wek hemû hevalên wî yên wê demê- û ew bi zindanî kiriye. Çawa li Atinayê desthilatên faşîst ên cûntaya yewnan li mabeda Zeûs kitêba Yannîs Rîtsos bi sedema sosyalîstbûnê şewitandin; desthilatên faşîst ên îlonê jî wiha zend



û bendên helbestên Arjen girêdan, ew di taldegehên xwe de veşartin.

Wan têr nekir guleyên nemerd birin ser laşê wî. Ya ku Arjen bi mertalan pêçaye ne tenê hebûna wî ye, ew bi xwe jî ji hebûna xwe wêdetir e. Di filimê *V for Vendetta* de aforizmayek heye, dibêje “*Di bin vê rûpûşkê de ramanek heye. Û hûn zanin ku gule di ramanê re naçe.*” Û Arjen ramanek e.

Bi kelpîçên klasîk, avakirina helbestên nûjen

Di gelek sohbet û nivîsên edebî de em leqayî hin gotinan tên ku şêwaza klasîk miriye. Ez bi xwe jî tevli vê nêrînê dibim. Di navbera bizavên wêjeyî, civakî, politîk hwd. Di navbera hemû bizavan de pirên qewî hene. Li gorî diyalektîkê hinek ji wan dimirin, ji tovên wan yên nû dibişkivin. Lê di mirin û çêbûnên bizavên nû de hin keliyên hemdem hene. Em ê ji van deman re bibêjin demên “navbeynkar” Hinek kes jî morên xwe li her du deman jî dixin.

Endam û pêşengên van deman jî qasid û mamosteyên pêşerojê ne. Ger em vê yekê bişîbinin avahiyên berê avahiyên kevn ên kelpîç hebûn. Niha jî hene. Lê wek mala dapîra min hinek xanî, cil û bergên betonî li xwe dikin, lê hundirê wan dîsa herî (kelpîç) ye. Xaniyê ku zaroktiya min lê bihurî ji wiha bû. Ji der ve wek beton dixuya, lê hundirê wî bi kelpîçên qalind hatibû lêkirin. Helbestên Arjen Arî jî bi vî awayî ne. Bi kelpîçan hatine ristîn, lê bi mîmarî û lêkirina xwe kelehên kevirîn dihesidînin. Peyvên klasîk, bi lêkirineke hosteyî pêşkeşî me dike û çêjeke bê hempa bi me dide tehmîkirin.

Di vê “navbeynkariyê” de roleke wî ya dinê jî berdewamkirina şagirtiya -*wî bi xwe bi nav kiriye*- dibistana Cegerxwîn e. Ew di dibistana Cegerxwîn de mezin bûye. Û divê wê alayê bide destên nîfşê ku li pey wî, wî dişopîne. Wî bi xwe di çend nivîsên xwe de xweş nîşan kiriye. Û nîfşê nû ku li pey wî dimeşe bi dilê wî ye jî.

Helbestvanê çiyayî

Di hejmara 44’emîn a kovara *Sanat Ve Hayatê* de nivîseke bi sernivîseke wiha

derçû; *Di rêzikên helbestê de hêmayê çiyê**. Nivîskar xwestibû di helbestên tirkî de li hêmayên çiyê bigere. Mînakên xweş hebûn, ji Ahmet Arîf heta Adnan Yücel, Yunus Emre hemû rêzikên ku di nav de “çiya” derbas dibin hatibûn analîzkirin. Wan rêzikan neynik da rûyê min. Got, “Kuro hay ji çiyayên xwe hebe.” Lewre çiya hêmayeke bi qewet e, xurt e. Di helbestên kurmancî de yê ku çiya jî xwe re kiriye mertal, ango ji hêla din ve *tual* Arjen Arî ye. Ez wiha bawer im, di jêrhişê her nivîskarî de hêmayeke “xwe” heye. Ahmet Tellî di gelek helbestên xwe de behsa mirina çûkan dike, Ahmed Arîf û Enqere bûne yek. Arjen Arî jî yek ji nûnerê çiyayên xwe ye. Ew û çiya yek in. Lewma ku di her helbesta xwe de bi çiyayên xwe dipesine. Feqiyê Teyranê kurdan hebe, yên çiyê jî teqez Arjen Arî ye. Binihêrin, çawa mêraniyê, miradkarî û bext bi çiyayan û wan jî bi axê ve girêdide;

“Di qada şer de piştê me negihîşt erdê.
Te şahid bivê, va Herekol.

Miradkar, bi bext û ol

Va Cûdî

Û va ye ev ax!”¹

Di helbestên wî de tu carî mirov pêrgî perçebûnan nayê. Di helbestên wî de welatekî çarparçe nîn e. Hewlêr e, Mehabad û Diyarbekir e, Ser û Binê Xetê ye. Ya girîngtir ew wekî her helbestvanî/ê bê welat e. Derwêş e, Qabbanî ew e.

“Çend kirasên şînê li bejna Mehabadê kirin!

rondikên çavên xwîné têrî çend çeman kirin.

porê weriyayî qefl qefl, keziyên dahatûyê li Çarçira di stûyê kê de bi kemend kirin!”²

Û Eroûtîka, lûtkeya helbestên Arî

Piştî romana Mîrnameyê gelek rexneyên dijwar li ser erotîkî û pornografiyê weşiyên. Em bi bîr bixin ku di romanê de dîmeneke “pornografîk!” hebû; zilamek bi destdirêjiyeke cînsî re rû bi rû dima. Rexneyeke Y. Eroglu wê pêlê ji bo çirokeke Rojîn Xewn di kovara Çîrûskê de weşiya.



Demeke kin gelek guftûgoyên vê mijarê hatin kirin. Lê bi liberçavgirtina wan rexneyan re ez dikarin bibêjim ku lûtkeya helbestên Arjen gihîştîyê Eroûtika ye. Ji ber ku wî ya girîng pêk aniye û di xêza zirav a di navbera porno û erotîzmê de li ser estetikê maye. Mijara sereke ya vê nakokiyê jî estetik û “zoom” e. Ger mirov behsa delaliya tazîtiyê bike estetik e, lê ger mirov “zoom” bike, ji nêz ve behsa her tiştî bêtî veşartin, ango şifrekirinê bike, dibe pornografi. Ya rastîn xêzkirina xaleke wiha jî, bikaranîna hêmayeke bi vî rengî jî gelekî zehmet e. Tiştê ku min di xwendina Eroûtikayê de dît jî estetikbûn bû. Di wê siratê de Arjen xweş meşiyaye, neketiye kendalê pornografiyê. Yên ku di dilê me de veşartî ne, deşîfre kirine. Lê ne bi wêneyên ku hundirê mirov nîşan dide, bi hosteyiyeke ku tenê yê dilên me li ber çavan raxistiye.

Girîngtirîn xala ku di Eroûtika de heye zimanê wê yê helû ye. Pîrî caran nîqaşa ka “huner ji bo hunerê” ye an “huner ji bo xelkê ye” tê kirin. Felsefe ji bo vê yekê serê xwe diêşîne. Mijareke felsefî ye. Ji Eroûtika pê ve helbestên din ji bo hunerê, ya rastîn bi rastiyên xwe yê hunerîn, li gor qalib û tevnên hunerî hatine hûnandin. Lê Eroûtikayê hinekî din xwe di nav gel de bicih kiriye. Pistepistên nav nivînan tî gûhên mirov, mirov dikare li dereke ku qet hêvî nake pêrgî wan peyvan bibe. Lîrîzmeke wiha ku li derdorên civatê tê efsanekirin di hundirîne.

Arjen Arî bi xwe devoka Mêrdînê bi

kar tîne. Lewma pîrî caran em dibînin ku ji sînoren rastnivîsê (*ne rastnivîs em bibêjin “zimanê akademîk”*) derbas bûye. Lê di helbestê de ya girîng deng e û ev yek li gorî beşên din ên wêjeyê destûrê dide helbestê ku li gor xwe serbest bilîze. Helbestên Arjen Arî hinekî li gor vê yekê tevdigerin. Ji bo wî jî ya girîng deng e, melodî ye, yê din dikarin bîst piştguhkirin.

Tiştêkî din a ku li ser vê mijarê û “Çil Çarîn”ê ye, ew jî xwepêşvexistina Arjen Arî ye. Gelek nivîskar hene ku tenê di rabirdûya xwe de mane. Li ser mîratên “pêşveçûnên” xwe yê berê ne. Helbet mejiyekî ciwan û yê “pîr” ne yek in. Ji hêla birêvebirina fîzyolojîk ve jî ne yek in. Her ku diçe tîgihîştina tiştinan diwartir dibe. Û nexweşîna jibîrkirinê kûrtir dibe. Di vê atmosferê de A. Arî bi “Eroûtika” û “Çil Çarîn”ên xwe ciwaniya xwe dikirpîne.

Têbiniyeke Şexsî

Di vê nivîsê de wek endamekî nû yê wêjeya kurdî, li ber çavên min îmajê Arjen Arî çî ye vebêjim. Kovara borî bi derengî ket destê min, lewre bi derengî hay ji dosyeya Arjen Arî çêbûm. Lewra nivîs hinekî bi lez hat ristîn, hêvîdar im wê xwendevanên Kovara Wyê li min biborin.

Têbînî;

1-Ev Çiya Rûspî Ne , Avesta

2-Biçe Ey Pêşewa! www.diyarname.com,

Enqere, 22. 04. 2010

Arjenîka

Mihemed RONAÎ

Wêje hunera bikaranîna peyvên e. Di nava beşên wêjeyê de peyv, herî xweşik û estetik di helbestê de tên bilêvkirin. Lê helbest jî kiras bi kiras in. Ji helbestan hinek tu bandorê li ser mirovan nakin, ji wan hinek bi guhê xwendekêr xweş tên, hinek bandorê li ser mêjiyê xwendekêr dikin û hinek jî bandorê li ser dil û giyanê xwendekêr dikin. Di xwendina helbestê de, peyv wek avê ji dilê helbestvên dinizile û xwe bera dilê xwendekêr dide. Ji bo helbestvanekî ev rewş asta herî mezin e, di nivîsê de. Bi rastî di helbesta kurdî de ji bo vê astê em dikarin bes çend helbestvanan bijimêrin. Ji nav van helbestvanan yek jî hosteyê hêja Arjen Arî ye.

Em dikarin ji bo bijartîbûna helbesta Arjen Arî çend sedeman bijimêrin niha. Bi ya min sedema mezinbûna helbesta Arjen Arî ya herî pêşîn kurdewariya wê ye. Min jî kurdewarîbûnê mebest, ne bes hestên wî yên kurdewar in. Digel kurdewarîbûna hestên wî di heman demê de avakirina peyv û hevokên jî wisa kurdewar e. Dema hûn Arjen dixwînin hûn dibêin qey bes li bajarekî kurd mezin bûye û tu caran ji wî bajarî derneketiye û bi tu zimanê din nehesiyaye. Wisa zelal, wisa li cî ne peyvên wî. Di zimanê wî de werger tune ye. Kurd wek neteweyekê bindest e. Ev bindestî ji azadiyê bigirin heta çandê û heta zimên li ser ruhê kurdan xwedîbandor e. Ji ber vê yekê kurd sed mixabin ku bi gelemperî bi hiş û hişmendiya desthilatdarên xwe difikirin û bi zimanê wan diaxivin. Kurdên ku bi zimanên desthilatdarên xwe naaxivin û wek wan nafikirin, ên ku bi kurdiyeke herikbar û zelal diaxivin jî heta derekê dikarin zimanê xwe bi kar binin. Lewre her çiqas peyvên wan kurdî bin jî hevokên xwe bi gelemperî bi hevoksaziya desthilatdarên xwe ava dikin. Kêm nivîskarên kurd li derveyî vê rewşê ne. Ji van kurdên ku ji derveyî vê rewşê ne yê herî

sereke yek jî Arjen e.

Em dikarin li ser helbesta Arjen gelek tiştan bêjin û mijarên dûr û dirêj vekin. Lewre bi rastî jî Mamoste Arjen ev dewlemendî daye me ku em ji gelek aliyan ve wî bigirin dest û li ser biaxivin. Lê ez dixwazim bi taybetî li ser mijarekê rawestim: Di helbesta Arjen Arî de erotîzm. Dema hûn berê xwe didin helbesta Arjen Arî du hêma pêşwaziya we dikin di avhewayaya hestên wî de. Şer û evîn. Ne bes Arjen Arî hema hema hemû helbestvanên kurd helbestên xwe li ser van her du têgehên ava dikin. Lê di helbesta Arjen Arî de ev her du têgeh bi awayekî anormal hatine bikaranîn. Wek mînak dema ez helbestên Arjen Arî yên li ser şer û bindestiyê dixwinim, wêneyê Arjen tê pêş çavê min ku diranên xwe dane ser hev û bi rik û nefreteke mezin diranên xwe diqijîne.

Erotîzm jî mêj ve him di wêjeya kurdan a devkî de him jî di wêjeya nivîskî de bi cih e. Hûn li edebiyata kurdî ya klasîk jî binihêrin hûn ê bibînin ku erotîzm jî berê de ji aliyê wêjekarên kurd ve hatiye bikaranîn. Wek mînak Ehmedê Xanî di Mem û Zîna xwe de bi taybetî di dema zewaca Sitê û Tajdîn de vê erotîzmê wisa tîne zimên:

*wî dest dirêj kir lê bi helalî
avêt gerdana saf û delalî*

*jî wê peyala mit û şekerbar
wî firek meya pak û saf vexwar*

*wî mestî dema ji meyê têr bû
bi ser sinbil û gulan de gêr bû*

*geh nêrgiz û lale geh jî sorgul
rihan û binefş û geh jî sinbil*

*ew bi ser hev de hemî dibestin
hin maç dikirin hin jî digestin*

*wan radimusan sîng û ber û dev
ji evîna dil dor medidan hev*

*elmas û gewher enî û diran
hatin guhertin bi lal û mircan*

*derya evînê wisa pêl vedan
wan dev di dev de dest li ser sîngan*

*herdu serxweşê mey û şerab in
bêhiş diketin nikarîn rabin*

*hem nedikarîn runin li erdê
di berê hev de diçune secdê*

*dema ku dîsa ji secdê rabûn
her du gelekî bi hevdû şabûn*

*ji lêvên hevdu şekir revandin
ji ruyên hevdu sorgul civandin*

Ne tenê di Şêxê Xanî de di heman demê de Melayê me yê Cizîrî jî dîsa di helbesta xwe de cî dide hêmayên bi vî rengî lê Mela ev erotîzm bes bi qam û bejnê, bi lêv û dêman îfade kiriye. Dîsa Feqiyê teyrar her wisa. Ji bilî van her sê helbestvanan jî, helbestkarên kurd li ser erotîzmê hevok ava kirine. Le Arjen Arî bi berhema xwe ya bi navê Eroûtîkayê di asta herî jorîn de ye di vî warî de. Mirov dema Eroûtîkayê dixwîne, mirov pêrgî evîneke har tê, meriv pêrgî daxwaz û arezûyeke bêsînor tê. A rastî jî Arjen Arî di Eroûtîkayê de bi hez û şhweteke nas dilê xwe bi wêrekî, bi xwendekêr re parve dike. Ji gotina “hez û şhweteke nas” mebesta min ew e ku hezkirin û pevşabûna wî jî kurdewar e. Lewre erotîzma Eroûtîkayê naşibe erotîzma tu helbestvanekî biyanî.

Ez dikarim bêjim di civaka kurd de, di warê erotîzmê de yê ku wek Arjen Arî wêrek tevgeriyaye bes Şakiroyê dengbêj e û bi rastî jî têgihaştina Şakir û Arjen a erotîzmê jî dişibe hev.

Arjen Arî bi Eroûtîkayê

perspektîfek nû li helbesta kurdî vekir. Bi wî dilê xwe yê dîn sînore hez û daxwaziya kurdewar nîşanî xwendakarê xwe da.

Bi qasî ku ez Seydayê Arjen nas dikim Eroûtîkaya wî neynika dilê wî yê har e. Di Eroûtîkayê de çi nivîsî be ew bixwe ye Arjen. Tiştêk jî ber xwe nenivîsiye, hestên xwe nizilandiye ser kaxiz bes. Digel ku emrê xwe bi ser pêncî yî xistiye, wî porê xwe yê dirêj bi kelecana xortekî lîseyî şeh dike her sibeh û hê jî ew ciwanê diz ê dilê keçikeke nisêbînî ye ew.

